

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

# bîrnebûn

hejmar 70 | 2018



- Pîrozbahîya bîstsalîya Bîrnebûnê
- Bi Smaylê Şêxbizeynî re hevpeyvînek li ser Şêxbizeynên Haymaneyê
- ◆ Li Almanyayê perwerdeya zimanê dayikê û rewşa dersên kurdî
- Bermekiyên kurd di kûraniya dîrokê da -4-
- Romaneke polêsî, Şopa Xeterê
- Sîyarên deşta Anatoliyê - Heci Buxurcî, Gopo, Os, Omer û yê din ...

# bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 70 | 2018

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

## Koma hevkarên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Xızan Şılan, Memê Mala Hine, Nuh Ateş,  
Seyfi Doğan, Mem Xelikan, Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelil),  
Mustefa Reşid, Rohat Alakom, Adem Özgür, Mehtap  
İdeli, Ecevit Yıldırım, Hesen Huseyin Deniz, Mistoyê  
Heco, Hizir Akbîna, Derweş Bicên, Şefik Pêşeng, İhsan  
Türkmen

## Adress

Navnişana li Swêdê

Box: 8121,

SE 163 08 Spånga/Sverige

## E-post

info@apetryck.se

## Internet:

www.birnebun.eu

## Belavkirin / Distribution:

Ewropa: Muzaffer Özgür

Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanyayê

Tfn: 0049-172 298 24 51

## Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

## Biha/Pris:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 5 TL

## Abone ji bo du salan

Swêd: 400 SEK • Almanyayê 50 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

## Numra kontoya li Swêdê:

(Birnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê

APEC, "Birnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Bask: Apec-Tryck AB



Ji şahîya pîrozbahîya bîstsalîya Birnebûnê

*Wênayên bergê:* Komek jin û zarokên Şexbizeynî,  
ji arşîva Smaylê Şexbizeynî.

Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re tîk, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

# Naverok

Ji birnebûnê <i>Alî Çiftçî</i> .....	4
Pîrozbahîya bîstaliya Bîrnebûnê, <i>Alî Çiftçî</i> .....	6
Şênahîya bîstaliya Bîrnebûnê 7.10. 2017an li Stockholm, <i>Nuh Ateş</i> .....	12
Bîstaliya Bîrnebûnê pîroz be, <i>Îhsan Espar</i> .....	14
Peyamên pîrozbahîya ji bo bîstaliya Bîrnebûnê .....	15
Hevdîtinek derengmayî, <i>Mehtab Îdelî</i> .....	16
Platforma Kurdên Anatoliya Navîn-E panêlek pêkanî, <i>Serdar Botan</i> .....	18
Nasandina kitêba Sîyarên deşta Anatoliyê, <i>Derwêş Bîcen</i> .....	19
Kongreya duyemîn a PKAN-E yê .....	20
Jîyana Dîno bû filmê dokûmenter, <i>Ecevit Yildirim</i> .....	18
Bi Smaylê Şêxbizeynî re hevpeyvînek li ser Şêxbizeynên Haymaneyê, <i>Mem Xelîkan</i> .....	22
Li Almaniyayê perwerdeya zimanê dayikê û rewşa dersên Kurdî, <i>Şefîk Pêşeng</i> .....	29
Mağî Qomonîsto, <i>Ecevit Yildirim</i> .....	33
Mînbûsa bavê min û şevêk li ser rêya Hesarê, <i>Adem Özgür</i> .....	38
Gera Miço a danekî, <i>Nuh Ateş</i> .....	41
Referandûm, <i>Seyfî Doğan</i> .....	50
Bîrnebûn, <i>Seyfî Doğan</i> .....	51
Rev, <i>Seyfî Doğan</i> .....	52
Kîlamên me, <i>Mem Xelîkan</i> .....	53
Pêkenok, <i>Hizir Akbîna</i> .....	56
Kalê min Cafarê Hine, <i>Memê Mala Hine</i> .....	57
Bêdengî, <i>Xîzan Şîlan</i> .....	62
Bîwêjên ji kurmanciya Anatolyayê, <i>Mistoyê Heco</i> .....	63
Bermekiyên kurd di kûraniya dirokê da -4-, <i>Dr. Sozdar Midî (E. Xelîl)</i> .....	75
Cînavka vegerok: XWE, <i>Hesen Huseyîn Denîz</i> .....	78
Romanekê polêsî, Şopa Xeterê, <i>Robat Alakom</i> .....	80
Sîyarên deşta Anatoliyê - Hecî Buxurcî, Gopo, Os, Omer û yê din, <i>Ihsan Türkmen</i> .....	85
Yekbûn, <i>Mem Xelîkan</i> .....	86

# Ji bîrnebûnê

Ji ber ev pêşdeçûyînên li Başûrê welêt di destpêka payîza pêşîn a 2017an de em gelek omîdwar bûbûn. Lê di eynî wextê de metirsîyek jî hebû ku Rojava û kurd li wir di navbera listikên hêzên Rusya û DYA de ne.

Pîştî referanduma li Başûr ku bi rêjeya ji sedî 92an zêdetir hat erêkirin, dijmînên kurdan, welatên dagirker û bi taybetî jî Tirkîyê, bi serokatiya Recep Tayip Erdogan ji encama referandumê pir tirsîyan. Wek ku har bibin, ji deriyê welatekî xwe havêtin deriyê welatekî din daku ev destkeftin û pêşketina gelê kurd têk bibin. Bi hezar dek û dolaban êrîş birin ser erdê kurdan. Ev êrîşên hovane hem li bakur, hem jî li başûr û rojava pêk anîn.

Sala 2014an bi alîkariya Tirkîyê çeteyên DAÎŞê li Rojava avêten ser bajarê Kobanê. Bi êrîşên hovane ev bajar hat xirab kirin û kurd li ser erdê xwe derbeder bûn. Bi berxwedaneka kahramanî keçên kurdan di şerê li dijî vê wehşeta bêhempa li dunyayê navûdeng dan!

16 payîza navîn a sala 2017an hêzên Iraqê û Heşda Şeibî bi alîkariya Îran û Tirkîyê êrîşê Kerkûkê kirin. Deverên ku ji 2013an ve ketibûn bin destê kurdan, mixabin bêyî berxwedan ketin bin kontrola Iraq û Heşda Şeibî. Heşda

Şeibîya ku rêxistineka wek DAÎŞê ye û rasterast girêdayî Îranê ye!...

Aniha jî Efrîna rengîn bûye hedefa bombebaranên Tirkîyê. Tirkîye ji sê alîyan ve ev zêdeyê heftêkî ye herêma Efrînê hem ji hewa û hem jî li ser erdê êrîş dike. Di vê serma zivistanê de xelkê me dîsan li ser axa xwe derbeder bûye!...

Efrîn herêmeke bi nîşteçihên xwe yê ji sedî sed kurd û kurdperwer ciyekî herî aram bû heta niha. Herwiha ji aliyê zengîniya rêçberî, çandîni û bi darên xwe yê zeytûnan jî herêmeke dewlemend e.

Xelkê Efrînê jî dê her wekî ye Kobanê, li dij van êrîşên dewleta tirk li ber xwe bide, dê nehêle dewleta tirk li Efrînê bi ser keve. Herçiqas şerekî bê pîvan be jî dê kurd dîsan kahremaniya xwe ji dunyayê re bidin xuyakirin. Ji bo vê divê li her derê kurd li dijî vê êrîşa dewleta tirk dengê xwe bilind bikin û piştevaniya xuşk û birayên xwe yê Efrînê bikin.

Mixabin, herçiqas raya giştî ya dunyayê piştî şerê kurdan li dijî DAÎŞê li tevayîya welatên Ewropayê bo kurdan pozîtîf be jî, welatên wek DYA, YE û Rusya li hember van êrîşên dewleta tirk jî ber berjewendiyên xwe bêdeng man!



Herêma Efrînê

Ev wêne ji pukmedia.comê hatiye wergirtin.

Gotina ku dibêje: *“Ji bilî çiyay tu dostên kurdan tunene.”* dîsan aktualîze bû. Erê, ev gotin dibe ku ji aliyê hinêk “dostên” kurdan ve bo kurdan hatibe gotin, lê dîsan jî divê xelkê me omêda xwe bi gotinan neşikînin. Ji ber ku ew destkevtiyên ji destpêka 1990î, 2003an û 2014an ne hindik bûn! Lê siyaseta hêzên me yê sereke baş nikarîbûn analîz bikin û bi kar bînin!

Bûyerên vê dawiyê jî pir rind da xuyakirin ku ji ber tunebûna *yekîtîyeka netewî* di navbera hêzên siyasî de, nebûna *stratejîyeka netewî* ya partiyên kurdan, rê li ber êrîşên dijminên kurdan vedike.

Em careka din bûn şahîdê vê rastiya me ya kambax ku bi sedan salan e, xelkê me yê mazlûm jê xilas nebûye!...

Dawiya sala 2017an û destpêka 2018an bo me kurdan bi xem bû! Lê hêviyên me jî hîn xurtir dibin. Ev dijminatîya cîranên me dê me nêzîkî hev bike û di dilê her kurdekî de hestên niştimanperwerî xurtir bike. Kurd dê bi serkevin!

Di vê hejmarê de li ser pîrozkirina bîstsalîya kovarê, peyamên pîrozbahiyê, hekat, kurteçîrok, helbest, kilam, pêkenok, serpêhatî, bîranîn, hevpeyvîn, dîrok, gramera kurmancî, perwerdeya zimanê dayikê û rewşa dersên kurdî li Almaniyayê nivîsên lêkolînî yê hêja û balkêş hene.

Bi hêviya serkeftina xelkê me, li Bakur, li Başûr, li Rojhilat û Rojava em sala 2018an li we pîroz dikin.

**Ali Çiftçi**

# Pîrozbahîya bîstsalîya Bîrnebûnê

Ali Çiftçî



Rêvîtiya ber bi geştîya Finlandayê...



Li Stockholmê bi bejdarîya koma hevkarên kovarê, nivîskar, xwendevan, dost û hezkiriyên kovarê di 7ê payîza navîna 2017an de, li restauranga Parabolênê bi şahîyekê hat pîroz kirin.

Rojek berî şahîyê ji koma hevkarên kovarê, Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê, Komela Ziman li Almanyayê endam û piştgirên kovarê bejdarî civîna li geştîyê bûn.



Pêşkeşkirina xebatên bîst salên kovarê ku ji aliyê Muzaffer ve hatibû amade kirin wek wênevîzyon hat nişandan.

Ji Swêdê; Seyfi Doğan, Hamid Atmaca, Ali Ciftci, Peppiina Ciftci, Mecit Cifci, Fadime Cifci, Ali Coşar, Harun Çoşar û Hesênê Metê, ji Almanyayê; Muzaffer Özgür, Kadriye Özgür, Dr. Fikret Yıldız, Sennur Yıldız, Nurten Kaya, Mehmet Kaya, Zinê Berbu Kaya, Vahit Duran, Suna Duran, İhsan Türkmen, Selma Oğuz-Türkmen, Hiva Dila Türkmen, Nuh Ateş, Serpil Ateş, Ayşegül Kısabacak, Hasan Kısabacak û Mustafa Mix, ji Norvecê; Huseyin Kişniş, ji Îsviçrê; Mehtab Îdelî, Vehbî Özden, Yusuf Polat, Hatice Polat, ji Danimarqê jî Osman Çiftçi, Emîne Çiftçi rojek berê şahîya bîstsalîya kovarê, ji bo civîna salane, li geştiya ku dice Finlandayê de gerekê li ser behrê hat kirin. Wek koma malbatekê bi hev



Seyfi Doğan, civînê îdare dike.

re sohbet hatin kirin û herwiha civîna salane jî pekhat.

Ji bo civîna salane, di geştiya *Birka Cruises* de, salona bi navê *Stockholm* ku bi wêneyên ji Stockholmê ve xemilandî, hatibû veqetandin. Civîn jî aliyê Seyfi Doğan ve hat meşandin. Di civînê de hem li ser rewşa kurdên Anatoliyê û bi



Ji temaşekirina xebatên kovarê yê bîst salan.



Îhsan Espar



Newzad Hîrorî



Rohat Alakom



Mumtaz Aydin



Keya Îzol



Yusuf Özden



Mahmud Lewendî



Karwan Saîd

taybetî jî li derveyî welêt rewza ziman û entegrebûnê hat deng kirin. Bejdarên civînê li ser weşana kovarê deng kirin.

Şeva pîrozbahîya bîstalsîya Bîrnebûnê bi pêşkeşkirina Muzaffer Özgür ve destpêkir.

Li ser navê koma hevkarên Bîrnebûnê birêz Nuh Ateş xêrhatina mêvana

kir û gotara pîrozbahîya bo bîstalsîya kovarê pêşkeş kir. Piştê jî kovara *Vatê* Îhsan Espar, ji *Kitêpxaneyê kurdî* Newzad Hîrorî, ji *Federasyona Komelên Kurd li Swêdê* Keya Îzol, Ji *PKAN-E* yê Yusuf Özden, ji *PAKê* Mumtaz Aydin, li sernavê *KNKê* Karwan Saîd û ji nivîskarên mêvan Rohat Alakom, Mahmud







Dr Serdar Budak



Sidar Yigit

Lewendî û Hesenê Metê peyamên xwe yên pîrozbahîyê dan.

Şahî bi xwarin, vexwarin, govend û muzika kurdî berdewam kir. Bi bejdarêya Dr. Serdar Budak, ji serhedê bi deng û awaza Ercan Aras, Mehmed Kaya, û Sidar Yigit şevka bi kêf û ken, bi mêvanên ku hatibûn re, heta derengîya şevê govend hat kişandin, wek malbatî.

Wêneyên vê nivîsê yên pîrozbahîyê ji aliyê **Hacî Kardoxî** ve hatine girtin.



Mehmed Kaya



Ji pîrozbahîyê hinek dîmen





**Ercan Aras** di sala 1974 an de li gundê Gelî, Qereyaziyê hate dinê.

Zaroktiya wî di nava kilam û çanda kurdî ya dengbêjiyê de derbas bû. Dema ku diçû çiyayê ber tarişên xwe, dengê xwe hildida û kilam digotin. Tenêbûn û zehmetiyên çiyê, bi alîkariya kilaman hêsan dibûn. Kilaman dilovanîyeke mezin dikire dilê wî û êvar bi serda danî.

Bi rastî gelek zarokên kurdan bi vî awayî hîmê kilaman dibin. Kilaman ji xwe re dikin heval û li çol û beyana sebra xwe pê tînin. Ji ber wî jî, dema meriv diçe çolên Kurdistanê, ji her newalekî, ji her zozanekî dengê kilamên zarokan tîn. Dengên wan yên qulingî çiya dixemilînin.

Pey hatina Swêd Ercan di zanîngeha Uppsala de zimanzanistî, siyasetzanistî û rojnamevanî xwendiyê. Lê ewî wek tradîsiyoneke di malbatê de, dev ji kilam û çanda kurdî bernedaye. Herwaha ewî di vî warî de lêkolîn kirîye û

gelek kilamên kurdi beref kiriye. Di he-man deman de ewî bi gelek dengbêjan re têkilî danîye û li ser jîyana wan û kilamên wan agahdarî beref kirîye.

Li gor Ercan, kilam û dengbêjiya kurdî bingeha çand û kultura kurdî ye. Ji bo ku meriv bikaribe diyalê çandê de berhemên baş û orijînal derxe holê, hayedarbûna kilama kurdî mecbûrî ye. Yekî ku haya wî ji kilama kurdî nebe, wek nimûne, nikare romaneke kurdî ya baş derxe holê, yan jî lîstikeke tîyatroyê ya orjînal çê bike. Ji ber wî jî, kilama kurdî gere baştir were nasandin û bi awayekî hur were lêkolandin.

Li gor Ercan, di standartkirina kurdîya nivîskî de jî, gere kurdîya di kilaman de rola xwe bileyîze. Ji ber ku kurdîyeke gelek hêsan û edebî di kilamê de heye ku hin jî bi awayekî baş li ser nehatîye sekinandin.

Wek nimune ji bo wê kurdîya xweş, çend rêzge ji kilameke dengbêj Reso:

*Dilber;*

*Çavê te reş in, reşbela ne,*

*Kilê sibhanê di binê koftiyê de bûn derman e,*

*Gelek camêran ji bo wan çavan jinê xwe berdane,*

*Dilo yeman yar yar...*

*Dilber,*

*Te çav reşê, birî girê,*

*Te sing sipîyê wek belekiyên berfê*

*li etega çiyayê Qongirê,*

*Bira meriv kuştîyê mêran be, girtîyê hebsan be,*

*lê nekeve tora(defika) te te gawirê,*

*Dilo yeman yar yar...*

# Şênahîya Bîstsalîya Bîrnebûnê

7.10. 2017an li Stockholm/Swêd



Mêvanên ezîz, dost û hevkarên bîrnebûnê, hun gişt bi xêr û li ser seran hatin şênahîya bîstsalîya Bîrnebûnê.

Em bi hatina we şa dibin, mala we ava be!

Bi minesebeta bîstsalîya Bîrnebûnê dixwazim kurt çend gotinan li ser armancên Bîrnebûnê û xebatê wê bibêjim. Aşkere ye, Bîrnebûn kovareke kulturî, hunerî û lêkolînî ye.

Armanc û karên Bîrnebûnê yên bingehî meriv dikane li ser sê xalan kom bike:

## Yek

- Hayadarkirina KAN derheqa nasnameya wan a kulturî, dîrokî, civakî û cihûwarî da.

Çima hayadarkirineke weha?

Ji ber ku ev hayadarkirina rê li ber xwenasîn û danasînê vedike!

## Dudu

- Berehevkirin û wêşandina zargotina KAN, wekî kilam, çêrok, yarenî, listk, gotinên mezinan û yd.

Çima?

Ji ber ku eserên zargotinê parek ji sermîyana me ya kulturî ye û ji ber vê jî layiqî parastinê ne.

## Sisê

- Teşwîqkirin û pêşvabirina xwandin û nivîsandina kurdî/kurmancî di nav kurdên Anatolîyê da.

Cihê gotinê ye, pir kesan ji kurdên Anatolîya Navîn cara pêşî di saye Bîrnebûnê da xwandin û nivîsandina kurdî êvisîn/hînbûn. Heta niha 220 kesan bi kurdî di kovarê da nivîsiye. Pir kesan jî bi wêne, nivîsên hunerî û edebî û bi lêkolînên curbecur rûpelên Bîrnebûnê dêwlemend kirin.

Bîrnebûn di destpêkê da kurdi û tirkî duzimanî bû lê pirtir bi tirkî bû. Paşê, pêda pêda kurdî derkete pêş û ji hejmara 67an wir da, li gor biryara hevkarên kovarê, gişt bi kurdî ye.

Bîst salan hevkarên Bîrnebûnê kar û xebata xwe kêm û zêde li gor van armancan bi fedekarîyeke ji dil meşandin. Ji nuha şûnda jî ew ê xebata xwe li gor van armancan bimeşînin.

Di xebata Bîrnebûnê da par û keda

bi sedan kesî heye; hevkar nivîskar, abonevan û bexşîxwaz...! Ji gîştikan ra dibên: Berxudar bin!

Îro ne tenê bi bîstsalîya Bîrnebûnê, em bi encama referenduma li Başûrê Kurdistanê û çêkirina Federasyona Rojavaye Kurdistanê jî şa dibin.

Referandum bo her miletekî mafekî rewa û yasayî ye. Referenduma bo serxwebûna Kurdistanê Başûrê gaveke dirokî ye. Pîrsa serxwebûnê li wir bi rêjeyê têr bilind, ji sedî %92 ya helbijeran hat erêkirin.

Bi serkevîna referandumê pêvajoya serbixweyîyê gihêste qonaxa nû.

Bi xêr û pîroz be!

Ji bîr mekin, di vê qonaxa nû da derfê û metirsî di zik hev da ne.

Em bi bêdengî û bêhurmetîya hin alîyan di derbarê bîryara mîlete kurd da



Nuh Ateş, Bilal Görgü û Seyfî Dogan

xemgîn dibin. Dorpêç, gef û fetwayên neyaran red û lenet dikin!

20 salîya Bîrnebûnê pîroz be!

Bi omdîya ku em, vê evarê, demeke xwaş bi hev ra derbas bikin!

Spas!



Huseyin Kışniş, Ali Coşar, Hesenê Metê, Nuh Ateş û Bilal Görgü

## BÎSTSALÎYA BÎRNEBÛNÊ PÎROZ BE!

Gelê mêvanên hêja,

Gelê xwendekar û hezkirîyên Bîrnebûnê,

Kovara Bîrnebûnê û kovara Vateyî bîst salê berê, bê ku haya wan ji hevûdu hebe di heman salê de dest bi weşanên xwe kirin. Kovara Vateyî weşanê xwe bi xwerû kurdîya kirmancî (zazakî), kovara Bîrnebûnê jî di destpêkê de, bi kurdîya kurmancî û tirkî, lê nuha bi tenê kurdîya kurmancî bi hev re rêwîtîyê eke dûr û dirêj kir. Kovara Vateyî bi munasebeta bîst salîya xwe musabeqeyeke helbest û hîkayeyan amade kir. Gelek kes bi helbest û hîkayeyên xwe beşdarê musabeqeyê bûn. Encamê musabeqeyê li Dîyarbekirê, di 9ê nîsana 2017an de, bi merasîmek hat eşkerekirin û xelatên xelatgiran hatin dayîn.

Îro jî em bi kêfxweşîyê mezîna bîstsalîya kovara Bîrnebûnê bi vê şahîya han pîroz dikin. Bîrnebûnê şahîyê weha, heta hîn jî mezintir heq kirîye. Ji ber ku ev kovar bi gelek awayan ve di nav weşanên kurdî de xwedîyê cihêkî taybetî ye.

Ji sebabên gelek dîyar ku em hemû pê dizanin, weşanên kurdî di jîyana xwe ya weşanî de rastî gelek zehmetîyan tên. Gelek caran kesên îdealîstên ku xwe didin ber van karan heta cihêk li hember

zor, zehmetî û gelek caran zilmê li ber xwe didin lê dûre mecbur dimînin ku rawestin. Lê îdealîstên ku bi karê Bîrnebûnê rabûna bi sebir û bi qerardarî weşana kovarê heta îro domandine. Bêguman gelek sebebên vê temendirêjîya Bîrnebûnê hene, çend ji wan ev in: Armancên kovarê yê weşanî vekirî û zelal in, warê kar û xebata kovarê sînorkirî û spesîfîk e, fokus timûtim li ser kurdên Anadolîya Navîn e, kadroyên kovarê xwedîyê fikrên sîyasî yê cihê bin jî kovarê çî car rûpelê xwe ji polemîkên sîyasî re venekirîye û harmonîyêke baş yê kar di nav nivîskar û xebatkarên wê de hene.

Îro bi kulîyata xwe ya 5550 rûpelî kovara Bîrnebûnê ji bo kurdîya kurdên Anadolîya Navîn xezîneyek e. Bîrnebûn bi materyalên xwe yê otantîk di derbarê edet, tore, edebîyata devkî, cografya, demografî û dîroka kurdên Anadolîya Navîn de çavkanîyêke bêemsal e.

Kovara Bîrnebûnê, ji nûha ve di dîroka weşanên kurdî de xwedîyê cihêkî gelek bi qedr û qîymet e û çî caran xebata hevalên Bîrnebûnê nayê jibîrvekirin.

Ez hêvî dikim kovara Bîrnebûnê her û her bijî!

**Îhsan Espar**

Serredaktorê Kovara Vateyî

# Peyamên pîrozbahîya ji bo bîstsalîya Bîrnebûnê

## HEVALÊN HÊJA MÊVANÊN DELAL

Pîrozkirina we ya bîstsalîya Bîrnebûnê, ji dil û can de pîroz dikim, ji we re serketinê dixwazim. Bi weşandina Bîrnebûnê we, der rê ya pişavtina li ser KAN girt. Hûn her hebin. Ji serî de redaksiyona Bîrnebûnê, nivîskar, kedkar, xwendevan û piştevanên Bîrnebûnê we, ji KAN re berhemek mezin, berhemek dîrokî afirand. Mala we ava, rêya we jihev be.

Li rojê veng girîng de ez ne li cem we me. Lê dilê min bi we re ye. We carek din pîroz dikim. Şeva we xwaş, dîlana we bi çoş be.

Bi baran silav û rêz.

### Mem Xelîkan

Hevalên delal, hevalên kedkarên Bîrnebûnê, cara yekemîn ji we hemûyan re spasîyeka mezin!

Bi weşandina Bîrnebûnê û 20 salan berdewamîya wê, we bi vî karî, li dunê hebûna kurdên Anatoliya Navîn (KAN) bi herkesî nimand. Bi vê xebatê ve çand û hunera KANê hat naskirin, li ser dîrokê lêkolîn çêbun...

Bi dilgermîyê ez we hemûyan pîroz dikim. Hêvî dikim li pêşerojê Bîrnebûn, bi kar û xebatê xwe rîya me ya ronahîkirinê berdevam bike. Silav û rêz!

### Levent Kanat,

20 salîya Bîrnebûnê pîroz be! Serkeftine ji birêvebire kovara Bîrnebûnê re daxwaz dikim! Temenê kovara Bîrnebûnê dirêj be! Bijî şahîya kovara Bîrnebûnê!

### Yusuf Kaynak

Bi navê FKKSê em bi germî bîstsalîya kovara Bîrnebûnê pîroz dikin û berdewamîya kar û xebata hêvî dikin.

Bîrnebûn di nav van bîst salan de berhemên gelek girîng û binirx yên kurdên Anatolîyê gihand ji bo xwendevanên xwe.

Em dubare ked û xebata we pîroz dikin. Di gel silavên germ!

**Keya Izol**, serokê FKKSê

Ez 20 salîya Bîrnebûnê ji dil û can pîroz dikim û jê ra temenkî dirêj dixwazim. Mixabin haya min ji vê pîrozbahîyê tunebû.

Min gelkî dixwest beşdarî vê şahîya 20 salîya Bîrnebûnê bibim. Lê mixabin haya min jî jê çê nebû.

Di van 20 salên borî da Bîrnebûnê ji tarîxa kurdên Enebolîya Navîn, kultur û zimanê wan ra û her wisa ji tarîxa kurdan ya dîasporayê ra jî xizmeteke bêhempa kiriye.

Ez hemû nivîskar, kedakar û emekdarên Bîrnebûnê bi dil û can pîroz dikim û ji wan ra serketinê dixwazim.

### Zinarê Xamo

Hogirên hêja!

Ez bi dil û can 20 salîya kovara Bîrnebûnê pîroz dikim. Kovara Bîrnebûn di pîrsa bi pêş ve birina çanda kurdî de xwedîya kedeke hêja ye. Kurdên Anatolîya navîn ne tenê 'bîr nebûn', lê di bizava gelê kurde azadîxwez de roleke girîng listin û hê jî dilîzin. Di nav dost û hevalên min de çendek kurdên Anatolîya Navîn jî hene û ew gişk bi dilsozî û mêranîya xwe cihê dibin.

### Tosinê Reşid

# HEVDÎTINEKE DERENGMAÿÎ\*

Mehtab Îdelî

**W**eke perperîkeke ber bi serdemeke bê perav ve difire, bi kelecana û tirsna. Tabloyeke kipkesk a wekî hemû rengên payîzê ji nava ewran ji firçeya wênexêzekî navdar hatiye avêtin. Bi sedan giravên hûr û girs ên wekî hatine nexşandin. Pişt re kolanên nava wî bajarê kevin ên wekî çivanokeke têr veşare xuya dike, yê li hemberî hemû xerabkariya mirovan li ber xwe dide. Ji xewneke carinan bê şev, carinan jî bê roj. Di guverteya keştiya Vikingê ya bi jendin li nav deryaya Baltîk a şîpşîn rê ve diçû, bi govendeke li ber dengê stranên bi kurdî hişyar bûm. Li ber hewayeke wekî qeşayê sar, ev sira ku wekî di zaroktiya min de nava min disincirand çi bû? Ya min dibir wan deran çi bû? Di odeya keştiya wekî dergûşê dihejiya de, min bi serxweşiya vê li xwe kir sibeh.

Sibehê gava hişyar bûm û ber bi hêwana xwarinê ve çûm, êdî ez bibûm yeke din. Gava xwestin min jî –tevî ku qet nas nedikirin- tev li civîna xwe ya paş xwarinê bikin, heyraniya min zêdetir bû. Di civînê de ez li kêleka Nuh Ateş ê her dem min dixwest wî bibînim, rûdiniştim. Ez bi Elî Çiftçî, Seyfî Dogan, Dr. Mikailî, Vahîd Dûran, Muzaffer Özgür û kesên din

ên hêja û kedkar ên tevî hemû zor û zehmetiyên bîst salan rojname anîne heta vê derê re, di heman salonê de bûm. Min bi kelecana li axavtina guhdarî dikir. Di rastiye de min jî dixwest êdî ez tev li wan bibim. Gava navber dan Vahîd Dûran ber bi min ve hat û got: „Tu çî xebatê dikî, rabe, vebêje“. Gava min got; „Ez nikarim, ezê şerm bikim“, Alî Çiftçî yê qet deng nedikir vê carê got, „Tu dikarî bikî“. Seyfî Dogan, Dr. Mikailî û yên din... Tevî van axavtinên wêrekîyê (cesaretê) didin, di navbera duyem a civînê de, min xwe di nava plansaziya reva di deriyê paşiyê re dît. Min di dilê xwe de digot; „Saet bû duwazdeh, civîn qediya“. Gava wiha bi dornehatina min ez dilşa dibûm, bi carekê re Dr. Mikailî got, „Ez mereq dikim bê ev heval ji bo çî hatiye“, êdî têgihîştim ku cihê minî revê nemabû. Gava Nuh Ateş bi henekî got, „Ji bo berjewendîya xwe“, min êdî wêr da xwe û rabûm ser xwe. Bi dengê ne amade yê ji kelecaniyê diricife, min jî bi henekan dest bi axavtinê kir. Heta zimanê min geriya min xwest bêjim, bê çî dikim û ji bo çî li wir im. Di rastiye de, piştî salan tiştê kiribû ku ez bi pey Bîrnebûnê bikevim, a em jî teşwîkî kirina tiştine

\*H.H. Deniz, ev nivîsa ji tirkî wergerandiye kurdî.





wiha dîkir, berê me didayê, çavkaniya rê nîşanî me dida, ew a ne tenê ji bo Kurdên Anatolya Navîn, ji bo hemû Kurdan çavkaniyeke mezin bû. Lêkolînerekî vê havînê çûm hevdîtina wî, gava di nava çavkaniyan de ji me re Bîrnebûn salix da, ez pir pê serbilind bûm. Bê guman min dixwest ez van hestan hîn çêtir vebêjim.

Roja din, em ji keştiyê daketin û ber bi cihê pîrozbahîya bîst saliya Bîrnebûnê ve ketin ser rê. Rêwingtî hinekî dirêj lê bi coş bû. Wê rojê trênen Stockholmê te digot qey tenê ji bo me diçin û tên. Me tevan xwe amade kir û em ber bi salonê ve meşîyan. Pîrozbahî bi axavtinên çend nivîskar û lêkolînêran ên di derbarê Bîrnebûnê de dest pê kir. Vê carê jî ez gihiştim dilşadiya hevnasîn û guhdarîkirina lêkolînêr, nivîskar û helbestvanên hêja. Pîrozbahî bi şahiyeke pir xweş a

bi govendgirtina çend ciwanên yad bi dawî bû. Pişt re li salona hotelê em li hev rûniştin. Sihbetên xweş, henekên xweşik... êdî dema xatirxwestinê hatibû.

Gava ez bi berbangê re ketim ser rêya balefirgehê, min dixwest ji bo her kesî car din hestên bi coş ên min dibihîst vebêjim. Ji bo ku li min ewle bûn, ji bo ku min gihandin ferqiya ez tişteki qenc dikim, ji qasî ji min re gotin wê bibin destekdarê min, vê perperîkê êdî bi awayekî cuda dest bi firînê kir. Û pir spasîyên xwe li we dike.

Min ji we, ji her kesê li wir pir hez kir. „Baş bû ez hatim, lê çima ewqasî dereng mam“; Ez, wan dostên ev peyv bi min da gotin, ji dil hembêz dikim.

Tiştê piştî salan kiribû ku ez bi pey Bîrnebûnê bikevim, ji xwe ev bû û êdî min ev tişt dîtibû...

Xeber:

## Platforma Kurdên Anatolîya Navîn-E panêlek pêkanî

*Serdar Botan*



Di roja 15ê cotmeha 2017an de Platforma Kurdên Anatolîya Navîn-Ewropa li bajarê Grevenbroich a Almanyayê panêlek pêkanî. Panêl bi rêvabirina hevseroka PKAN-E Dr. Melîha Delen û A. Fuat Gürsel va pêk hat. Di panêlê de ji welat, ji partîya HDPê parlamenterê bajarê Seertê Prof. Dr. Kadrî Yildirim, ji kovara Bîrnebûnê Dr. Mikailî û nivîskar Sedat Ulugan wek gotarvan beşdar bûn.

Di beşa yekemîn de gotarvana li ser dîrok û koçberîya Kurdên Anatolîyê gotarên xwe pêşkeş kirin. Ji nav beşdarvana jî birêz Riza Baran ditînen xwe anîn ziman. Di beşa duyemîn de jî pirsên beşdarvana hatin bersivandin.

Li dawîyê berpîrsên civînê xwarin û vexwarina hatî pêşkeşî beşdarvan kirin. Heta dawîyê sohbetê berdavam kir. Nêzikî sed kes beşdarî panêlê bûn. Beşdarvan bi kef û kelecaneke belavbûn.

# Nasandina kitêba **Siyarên Dešta Anatoliyê**

Derwêş Bîcen

Li paytexta Danemarkê, Københavnê pirtûka Muzaffer Özgür a bi navê *Siyarên Dešta Anatoliyê* bi alikariya rewşenbîr Ali Çiftçi hate naskirin.

Di civîna naskirinê de kurdên Anatoliya Navîn bi dilgermî teve vê civinê bûn.

Muzaffer Özgür di axaftina xwe da got; *ew pirtûka xevna dilê min*



*bû û bala xwe kişand ser zimanê kurdî ....Edebîyata kurdî mîna avê zela, şîrîn e. Çiqas vexî wîkas kefx-weş û zana dibî.*

Rewşenbîr û weşanger Ali Çiftçi jî bahsa karê Muzaffer ê kovara Bîrnebûnê kir. Di dawîyê de herdu mêvanên civinê bal kişandin ser perwerdeya zimanê dayîkê û çanda kurdên Anatoliyê.

Bi înzakirina pirtûkê û koma stranên kurdî blirvan Şex Ehmad Fahri Dağ û Serdar Gezen ve bi ççekê dawî bû.



# Kongreya duyemîn a PKAN-E yê di 4ê payîza paşîn 2017an de li Stockholmê pêk hat

Kongre bi beşdariya delegeyên ji welatên Ewropayê, destpêkir. Piştî rêzgir-tina ji bo bîranîna şehîdên Kurdistanê, dîwana kongreyê hate hilibijartin.

Hevserokê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) Rebwar Reşîd serkeftin ji kongreyê re xwest û li ser girîngiya rêxistinbûna kurdên li Anatoliya Navîn deng kir.

Bi dû re Ali Ciftci ji kovara Bîrnebûnê peyama xwe wiha bi dawî anî: ... *Ev karên ku hûn li derveyê welêt ji bo parastina ziman û nasnameya kurdî, pê radibin, karên pir muhîm in. Bi zimanê xwe rabûn û rûniştin û xwe îfade kirin ê roleka xwe ya mezin hebe. Bi taybetî jî li derveyê welêt zarokên me ji du alîyan ve rûbibûyê asimilasyonê ne. Yek bi rêya televîzyon û medyeya sosyal, ên bi zimanê tirkî, ye ku bandoreka pir mezin li ser insanên me dike.*

*Ya diduya jî li xerîbîyê ji dîrketina nasnameya kurdî ye ku têkçûn û he-landina civakî ye. Ji bo vê jî lazim e, em wek dê û bav, kesên rewşenbîr, si-yasetmedar, komele û rêxistinên civakî, ev derfetên ku îro li welatên Ewropayê hene ji bo pêşxistin û parastina ziman û nasnameya xwe baş bikarbînin. Rêxistin ji bo vê yekê pêwîst in û roleka wan a girîng heye.*

Piştî hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk a Kurdîstaniyên li Ewro-payê (KCDK-E) Fatoş Goksungur dengkir. Goksungur axaftina xwe bi zimanê tirkî kir û got; ... *kurdên ji Ana-toliya Navîn jî divê xwe li her welatî bi rêxistin bikin û bi awayekî çalاک ciyê xwe di nava têkoşîna dijî dewleta tirk de bigirên.*

Raporên kar û malî bi kurdî û tirkî hatin xwendin, rexne û pêşniyar hatin kirin.

Di kongreyê de piştê gotûbêjên li ser destûrê hinek guhertin hatin kirin. Ji ber destûra PKAN-E yê bi zimanê tirkî hatibû nivîsîn û dengkirin li ser desturê bi zimanê tirkî berdewam kir. Biryar hate dayin ku navê rêxistinê PKAN be û li welatên Ewropayê, bajarên ku kurdên Anatoliya Navîn lê dijîn, meclîs bèn avakirin.

Biryar hat girtin ku hevserok û nûnerên meclîsan bibin delegeyên xwezayî yên kongreya Ewropayê.

Ji bo rêveberiya platformê 12 endamên nû ji Elmanya, Awûstûrya, Swîsre, Hollanda, Swêd û Norwêcê hatin hilibijartin. Ji Elmanayê Meliha Dogan û ji Swêdê jî Kadîr Çelîk ji bo hevserokatiya PKANê hatin hilibijartin.

*Red.*

# Jiyana Dîno bû filmê dokûmenter

Ecevit Yildirim

Rejîsor Keremo (Kerem Tekoğlu) jîyana karîkaturist Asaf Koçak yê ku di Otela Madimaka Sêvasê de, di sala 1993an de hat kuştin, bi filmekî dokûmenter yê bi navê „*Dîno*“ diyarî temaşevanan kir.

Rejîsor Keremo ji bo naveroka film ji hevalên Asaf Koçak ên ji qetlîamê xelas bûne, ji malbata wî û ji endamê redaksiyona Bîrnebûnê Wahîd Duran sîd wer girtiye. Dokûmenter li Yêrkoy, Qirşer, Enqere, Stenbol, Didim û Almanayê hatiye kişandin.

Weke tê zanîn Asaf Koçak, di sala 1958an li Yêrkoyê tê dinê. Ew ji malbateke kurdên Qirşerê ji eşîra Şêxbîlan bû. Kurîkbûna wî li Yêrkoyê derbas dibe. Ji dema kurîkbûna xwe ve li hember neheqiyê her tim xwedî helwest û çalak bû. Xortekî şer bû. Ji ber wê jî dîya wî navê *Dîno* lê dike.



Kerem Tekoğlu, nasên Asaf Koçak û xanga wî



Asaf Koçak

Asaf Koçak Karîkaturîya xwe dema perwerdeya xwe ya li Stenbolê pêş ve dibe. Naveroka karîkaturên xwe bi rexneya li ser erka sîstema li Tirkîyê, îstîsmara dîn di nav sîyasetê de, bikaranîna jinê ji hêla sîstema deshilatdariya mêr wek objeyeke cinsî ve û bi neheqî û zilma li ser gelê kurd ve dadigirt.

Asaf Koçak ne tenê bi fikrên xwe, her wiha bi cil û berg, bi şewqa xwe ya fotir û bi por- ruyên xwe yê belavela kesekî ji derveyê rêzê bû.

# Bi Smaylê Şêxbizeynî re hevpeyvînek li ser Şêxbizeynên Haymaneyê

Mem Xelîkan

Smaylê Şêxbizeynî, ji bajarokê Haymanê ku girêdayî Ankarayê ye. Li sala 1969a li gundê Gozgozê (Sindiran – Yenice) ji dayîk bûye. Zaroktiya xwe li gund derbaskiriye. Li Ankarayê, li zanîngaha *Siyasal Bilgiler Fakültesi* (mülkiye), xwendîye û beşa siyaset û ekonomi (aborî) xilas kiriye. Di xortanîya xwe de, di nav rêz û rêxistinên Kurdan de (partî û komel) cih girtiye. Smayl, ji avakar û rêveberên (Sekreter) KOMKURD-ANê ye. Niha ji li Ankarê karmend e. Dil dixwast, va hevpeyvîna bi devokê Şêxbizeynkî be. Mixabin, ez şêxbizeynkî nizanime. Ji bo ku Smayl, kurmancî dizane me hevpeyvîn bi kurmancî pêkanî.



*Birêz Smayl şêxbizeynî, şêxbizeynî kê ne? ji kêderê hatine? tu dê, ji me re wanan bidî nasandin?*

– Kekê, Şêxbizeynî eşîreke kurda yê mezin e. Li her perçekî Kurdistanê hene. Cih û warê wana yî yekemîn, li rojhilata Kurdistanê herema Goran e. (Rewandûz, Kîrmanşah, Pîranşar, Îlam, Bijar. ...)

*Şêxbizeynîyên, niha li Anatolîyê û li Haymanê ji wê heremê hatine?*

– Erê. Şêxbizeynîyên huro li Anatolîy-

ayê, cara siftê ji Kurdistana Rojhilat hatine li Kurdistana Başûr li heremên Kerkûk, Silêmanî, Çamçemal, Bazîan û Taqtaqê jîyane. Dûv şerê, Şah Îsmail û Yavuz Selîm ve bi tirkmenên şîa ve hatine mubadele (Guherîn) kirin. Ji bo ku şêxbizeynî misilmanên sunnî – şafî ne, ji alîyê olî ve Osmanîyan ew nêzikî xwe dîtine. Osmanîyan, dema şêxbizeynî anîne Bakûra Kurdistanê, ew bi ferman û ûnvanan ve xelat (Ûd) kirine. (ji bo bacê nedin, ji bo nerin leşkerîyê...)

*Lê; şêxbizeynîyên li Haymaneyê?*

– Şêxbizeynîyên hatine Bakûra Kurdistan, li derdorên Ezorim, Palû, Swêreg,

Amed, Kahta, Wan, Ercîs, Baykan, Iğdır ... bi cih û war dikin. Demeke dirêj, li wan herêman jîyana xwe didomînin. Dûv ve, hinek ji wanan tên li Haymaneyê bi cih û war dibin û li heremê gundan ava dikin.

*Kurdên huro li bajar û bajarokên Anatolîyê (ji xeyrî Haymana ye) çawa hatine?*

– Kekê, Şêxbizeynîyên huro li heremên Anatolîyê belav bûyîn jî, Şêxbizeynîyên cara siftê hatine Haymanê ne. Ji bo ku, pezê xwe û hêwanên xwe biçêrînin û bi xwedî bikin, dem deman ji Haymanayê biderketine çûne wan zozanên Anatolîyê, li wan herêman maleser (konên mezin) danane. Li demsalên zivistanê vegeyriyane Haymanayê. Dûv ve, hinek ji wan Şêxbizeynîyên Haymanayê, ew bajar û bajarok û zozanan ji xwe re kirine cih û war. Li wan herêman, gund avakirine. Niha jî, li wan bajar û bajarokên Anatolîyê jîyana xwe didomînin. Huro jî, bi Şêxbizeynîyên Haymanayê ve têkiliyên wan hene.

*Birêz Şêxbizeynî, ew bajar û bajarokên Anatolîyê yên ku Şêxbizeynî lê bi cih û war, kîjan in?*

– Ez, ji te re yek bi yek bêjim.

ÇORUM: Laçın

AMASYA: Suluova, Merzifon

SAMSUN: Bafra, Havza, Dedeğaç

SİNOP: Durağan, Boyabat

KARABÜK: Cumayeri

SAKARYA: Akyazı

KASTAMONU: Araç

BOLU: Düzce

ÇANKIRI: Çerkeş

TOKAT: Turhal

YOZGAT

BAYBURT

*Navê Şêxbizeynî, wanan ji çi an jî ji ku girtine ?*

– Şêxbizeynîyan, kokê xwe kurdên Lekî ne. Navê Şêxbizeynî, li salên 1880î derdikeve holê. Ew nava, tê mana (wate) ya şêxên biaqil (zeyn-zên- zîhin). Ew peyva şêxbizeynî, herdihere di nav civakê de tê guherîn wek; şêxbizin (Haymana), Şihbizin (Bayburt) an jî Şaguzûnî (Ezorim).

*Tu yê, ji min re qala ziman an jî devoka wanan bikî?*

– Kekê tu zanî, çar zaravayên kurdî yên mezin hene. Yek ji wanan jî, goranî ye. Kurdên şêxbizeynî bi zaravayê goranî – Lekî, Lekwanî (devokekî goranî ye.) diaxifin. Pir kes dibêjin şêxbizeynkî, devokekî soranî ye. Na, ew ne rast e. Şêxbizeynîyên, li başûr dijîn li herema Kerkûk, Silêmanî, Taqtaq, Çamçamal.... Bi zaravayê soranî dipeyîvin. Şêxbizeynîyên li rojhilata Kurdistanê, yên li Anatolîya û Haymanayê bi go-



Komek jin û zarokên Şêxbizeynî

ranî/lekî dipeyîvin. Yên li Kurdistana bakûr bi cih û war bûyî û huro li wir dijîn, devoka şêxbizeynî neparastine. Ew jî, bi kurmancî dipeyîvin.

*Birêz Şêxbizeynî, ji min re tenakê jî qala baweriyên şêxbizeynan, baweriyên wana yên olî bike.*

– Piraniyên wanan sunnî-Şafi ne. Hinek jî, sunnî-hanefî ne. Li herêma Ankara û Konyayê 33 gundên şêxbizeynan hene. 29 gund girêdayî Haymanayê ne. 3 gund (Dipdede, canimana, Karakilis) girêdayî Kuluyê yek gund jî (Kayabaşı) girêdayî Polatliyê ye. Ji wanan 10 gund, sunnî-hanefî ne. Yên din, Sunnî-şafi ne. Hejmara (nufus) şêxbizeynan li Hay-

manê (bajarên Ankara û Konya jî tevlê) qasî 100.000 e.

*Li wan gundana, tenê şêxbizeynî dijîn, kurmanc jî hene ?*

– Na, tenê şêxbizeynî dijîn. Lê derûdorên me gundên kurmanc in. (gundên Reşî û Canbeg) Min hê jibîrnekiriye ez bêjim, vava yê girîng e. Ji wan gundên şêxbizeynî, yê herî mezin Gozgoz e (Sindirani-Yenice). Ew gunda, di dîroka Osmanîyan de wek Şêxbizeyn Nahiyesi hatiye bi navkirin. Li heremê, eşîrên şêxbizeynî yên *jîrkî*, *ler* û *xwêwend* hene.

*Jîyana şêxbizeynên Haymanayê, jîyana wana ya civakî çawa ye?*



– Dema ew hatine heremê, li vir jî jîyana xwe ya li welêt, berdevam kirine. Pez bi xwedî kirine, zîreet kirine û debara xwe bi wanan kirine. Bazirganîya pez firotinê kirine. Li salên dawîyê, li Ankarayê li hal û bazaran bazirganîya fêkî û masîyan dikin.

Jîyana wana yê li heremê jî, wek jîyana kurdên li heremê derbas bûyê û dibe. Li heremê, li ser wan jî pişavtin pêkanîne. Lê şêxbizeynan jî, qet dev ji kurdatiya xwe bernedane. Bi çand û zimanê xwe jîyan domandine. Li nasnameya xwe ya netevî, xwedî biderdikevin. Erf û edetên xwe, gelnasî (folklor) ya xwe ji bîrnekirine. Çand, ziman û gelnasîya xwe hetanî huro parastine. Huro jî, didin jîyandin.

*Kekê Smayl, Şêxbizeynên Haymanayê çikas nêzikî pîrsgîrêka kurd û Kurdistanê ne, an jî, ji heqê wê mijarê de çawa difikirin?*

– Wê pîrsa te, ez dixwazim hinekê berfireh û dûvdirêj bersîv bidim. Berê 1980î an jî berê 12ê Îlonê, welatperwerî û fikirên çep parastin, li ser milên ronakbîran wû. Bi berxwedana rewşenbîran dimeşî. Hetanî xwendevanên heremê, çûn bajarên mezin, çûn zanîngahan û hatin, gel hay je tu pîrsgîrêkên weng tune bû. Dema cara pêşîn, xwendevanên heremê ew pîrsgîrêka li heremê parastin û belav kirin jî gel ditirsîya. Mafdar wûn jî.

Ditirsîyan ku yên dest xwe de wenda bikin. Ji bo wê jî, welatperwerî û li nasnameya netevî xwedî derketin wê demê, li nav gel ne zêde wû. Lê xwendekar û rewşenbîrên wê demê, berxwedaneke demoqratik didan.

*Tu yê ji wan xwendevan û rewşenbîran bi nav mînanan bidî min?*

– Xwendevanê herema me yî yekemîn, **Hecî Kazim Şêxbizeynî** ye. Ji gundê, Bacihesarê ye. Li Stenbolê zanîngaha *Ticari İlimler Akademisi* xwandîye. Dûv ve, Bijêjk **Abdullah Duman**, ji gundê Gozgozê (Bavê rojnameger Seleheddin Duman e.) li zanîngaha Stenbolê beşa *Tıp Fakültesi*yê xilas kirîye. Rehmetî welatperwerekî hêja bû. Wanan, bi xort û xwendevanên kurd û kurdistanîyan ve têkilî çêkirine (wek Musa Anter) û bi pîrsgîrêka kurdan şîyar bûne.

Xalê Hecî Kazim, li salên 1938-39 çûyê Stanbolê. Zanîngah, hetanî pola 4an xwendîye û nexwaş ketîye. Ji ber nexwaşîya zirav (Tûberkuloz), xwendina xwe di nîvi de cihîştîye û vegeyîyaye Ankarayê. Çend salan, bi dermankirina nexwaşîyê re eleqedar bûye. Dûv ve, Li Ankarayê bi navê *Üçler Oteli* hotelek jihevkirîye û şuxilandîye. (Sal 1963). Ji wê rojên şûva, ew hotela bûyê cih û mekana xort û xwendevanên kurdan. *Hotel Üçler*, bûye lokala welatperwerên kurd.



Ji milê çepê da Ali Özkan, Heci Kazim Şexbizeynî, Smaylê Şexbizeynî, Mehmet Özkan.

Tê gotin ku welatperwerên wê demê wek, Edip Karahan, Adil Şerefhanoglu, Faik Bucak, Yusuf Azizoglu, Naci Kutlay, Kemal Badıllı, Tarık Ziya Ekinci, Esat Cemiloğlu... hwd. civinên xwe di wê hotelê de çêdikirine. Xalê Kazim, qatekî hotelê ji hevalên xwe re veqetandîye. Daxuyanîya damezirandina DDKO, belevok û afîşên Mitîngên Rojhilat (*Doğu Mitîngleri*) li wir hatine amadekirin.

*Gelek girîng û balkêş e. Smayl, wekî din ji şexbizeynên Haymanayê yên di nav sazî û rêxistinên kurdan de cih girtî, hene û kê ne?*

– Erê. **Hatice Yaşar** (Xecê – ji gundê Xorxor), di nav *Ala Rizgarî* de, parêzer **Vahit Başaran** (ji gundê Şawlû) di

nav *Rêya Azadî* de cih girtibûn. Dîsa, ji şexbizeynên Haymanayê **Şevkî Özkan**, (Bacihesar) demekê cihgîrê serokê Enstîtûya Kurd ya Parîsê wû.

*Birêz Şexbizeynî, ji min re qala pêvajoya dîv 12ê Îlonê jî bike.*

– Wê demê jî, paralelî hêza tekoşîna azadîya Kurdistanê, li heremê berxwedana gelê me jî, her çû bilind bû. Xort û ciwanên heremê, di bin bandora berxwedana wê demê de man. Di nav berxwedana kurda ya siyasî û demokratîk de cih girtin. Gelê me jî, bi wanan re piştevanî çêkir û piştgirîya wanan kir. Hinek ji wan xortên heremê, tev li şerê çekdarî jî bûn.

Wek her demê huro jî, li Kurdistana Bakûr zordarî û zordestîya dewletê, li

ser kurdan berdewam e. Vê yekê jî, her ku çû gelê me zêdetir nêzikî pirsgirêka netevî û demoqratîk kir. Ji bo mafên xwe yê netevî, kesatî û demoqratîk li heremê piştgirîya partiyên kurda dikin. Li hilibijartina dawî, di dûv AKP ve partiya kurdan bû partî ya duyemîn.

*Çanda wanan çawa ye? Erf û edetên şêxbizeynan cûda hene?*

– Na, tu erf û edetên wanan ji yê kurdên Kurdistanê an jî ji kurmacên heremê zêde cûdatir tunen. Dawet, şîn, mêvanperwerîya şêxbizeynan jî wek kurmacên heremê ye. Ji bo baweriyên olî ve ji kurdên hanefî, zêdetir muhefezekar in. Ji kurdên kurmac zêdetir girtî ne. Şêxbizeynî, zêde henekbaz in. Mezinên me, zêde şerût wûn. Lê civaka niha, dûre şer in. Xortên me, aşîxwaz in. (Dibe ku ji xwendinê ye). Li heremê, navbera kurmac û şêxbizeynan de zewac heye. Lê ne zêde ye. Ew jî, ji ber zimên e. Bi kurmanca ve, navbera xwe de bi tirkî diaxifin.

*Li Haymaneyê, hunermendên şêxbizeynî yê bi nav û deng ki ne?*

– Erê, stranbêjên me yê bi nav û deng hene. Ewnan, li heremê jî û li Kurdistanê jî têne naskirin. Ji wanan; Şevket Kağıtçı (Kusewdelî – Yurtbeyli), heft qaset çêkirine. Dihere dawetên bajarên Kurdistanê jî. Li wî alî, bi navê Kurd Şewko tê naskirin.



Smaylê Şêxbizeynî

Vahit Yüksel; ji Gozgozê ye (Sindirana). Ehmedê Quttê (ji Sazê ye). Vî jî çend qaset û albûm çêkirine. Beko (Ataköy), Yılmaz Koyuncu (Yurtbeyli). Wanan, li gundên derdora me bi Şêxbizeynkî gûranîyan (Stran) dibêjin û dawetên me şên dikin.

*Kekê li derdorên we, billûrvan, jin û mêrên şare hene?*

– Necip Okçu, li herema me bi billûrvanîya xwe namdar e. Ji gundê Bacihesarê ye. Kek Necip di TRTê de jî billûr lêxistiye. Billûrvanên me yê din: Riza Şahin (Alacix), Mille (yurtbeyli), Mewlûdê Hemzo (Yurtbeyli), Hızır Hakbilen (Şawlû) nin.

Heci Edûl (Bacihesar), Ferîda Mala Dono (Gozgoz), Mimmî Gulê (Şawlû), Bellê Mala Heci Memiş (Gozgoz), Qefê Mala Elî (Yurtbeyli), Zêwê Mala Darê (Yurtbeyli) Jî şareyên heremê ne.

*Smayl, li derdorên we kesên şêxbizeynî  
yên bi karê ku dikin an jî, ji alî yên  
din ve dengda ne û namdar hene û kî  
ne?*

– Ji te re, kê bêjim nizamim. Lê ji pêşiyê de bêjim, yên ku min ji bîrkirî bila min bibaxşînin. Dr. Derviş Tansu, Dr. Ömer Özkan, Seleheddin Duman (rojnameger), Burhan Sönmez (nîviskar), Mehmet Özkan (siyasetmedar). Yên niha têne bîra min, li heremê baş têne naskirin.

Yek jî kekê, berî 12ê îlonê sê kesên li heremê û li Tirkîye bi nasnameya xwe ya netevî, bi nasnameya kurdî tên naskirin hebûn. Dixwaze ez qala wan jî bikim. Yek ji wan, Kürt Remzi wû. Ji gundê Bazîka wû. Kurmanc bû. Rehmetî, stranbêjekî namdar wû. Li herema me pir dihat hezkirin. Li dawetên me, bi kurmancî û şêxbizeynkî stran digotin. Yek jî, Kürt Ahmet. Ji gundê Gozgozê ye. Bi mêrxasî (Keleşî – Kabadayı) ya xwe namdar wû.

Kürt Cemalî jî, ji şêxbizeynên Bayburtê (ji Eşîra Cel) wû. Li Ankarayê, li taxa Altındağ dijî û bi mêrxasîya (keleşî) xwe namdar wû. Tê gotin ku, şanonameya bi navê ”*Keşanlı Ali Destani*” jîyana vî ye. Nîviskarê wê şanonameyê, Haldun Taner goti ye; “min di wir de, jîyana Kürt Cemalî nîvisand. Min ew, ji parêzerê **Kürt**



Du jinên şêxbizeynî

**Cemalî** girt. Lê min mêzekir bi navê “Kürt” ez icazetê nagirim. Min navê wê, *Keşanlı Ali* lêna.”

*Birêz Şêxbizeynî, ez bi vê sohbetê gelek kêfxwaş bûm. Mala te ava. Pîr tiştî hetanî huro, me ji bo şêxbizeynan ne dizanî, te dîyarî me kir. Carek din spas dikim. Tiştêkî dinî tu zêde biki an jî, peyameke te ji xwendevanên Bîrnebûnê re heye?*

– Ez jî gelek spas dikim ku we, va derfeta da min. Ji kedkar û xwendevanên Bîrnebûnê re, serketinê dixwazim.

# Li Almanyanayê perwerdeya zimanê dayikê û rewşa dersên Kurdî <sup>1</sup>

Şefîq Pêşeng

KOMKAR (Federasyona Komeleyên Karkerên Kurdistanê) di komcivîna xwe ya sala 1980'î de mijara dersa Kurdî xiste rojeva xwe û piştî komcivînê bi van daxwazan dest bi kampanyayekê kir: Li xwendingehên fermî dersdayîna Kurdî, Di radyo û televizyonên dewletê de weşanên bi Kurdî, di sazîyên şêwirmendiyê de şêwirmendî û refaqeta bi Kurdî.

Her çî, hêj di dawîya salên 1800'yî û destpêka salên 1900'î biyanî hatibin Almanyanayê jî bi şêweyek girseyî di destpêka salên 1960'î de ji gelek welatan însan ji bo kar hatin Almanyanayê. Gelek bajarên Almanyanayê di Şerê Cîhanê yê Duyem de wêran bûbûn, bi milyonan mêrên Alman di şer de hatibûn kuştin, bi dehhezaran dîl ketibûn, ewqas kes jî ji ber şer Almanya terikandibûn. Li ser vê yekê bi milyonan karkeran berê xwe dan Almanyanayê.

## **Kurteçîroka xebatên di derbarê dersên zimanê dayikê de**

Piştî hatina hejmareke zêde ya koçberan pirs û arîşeyan jî dan der. Yek ji van jî pirsê perwerdeya zarokên van karkeran bû. Li ser daxwaza rêxistinên penaberan û piştgiriya GEW (Sendîqaya Mamosteyan) û DGB (Hevgirtina Sendîqayên Alman), hikumeta federal di 25.07.1977'an de biryarnameyeke ku rê li ber dersên zimanê dayikê vedikir derxist û bicîhanîna wê spart eyaletan. Di 1978'an de li xwendingehên Alman dersa Tirkî dest pê kir.

Di eniya Kurdan de jî KOMKAR (Federasyona Komeleyên Karkerên Kurdistanê) di komcivîna xwe ya sala 1980'î de mijara dersa Kurdî xiste rojeva xwe û piştî komcivînê bi van daxwazan dest bi kampanyayekê kir: Li xwendingehên fermî dersdayîna Kurdî, di radyo û televizyonên dewletê de weşanên bi Kurdî, di sazîyên şêwirmendiyê de şêwirmendî û refaqeta bi Kurdî.

Hêj di destpêkê de KKDK (Federasyona Komeleyên Karkerên Kurdistanê yên Demokratîk, niha Civata Kurd li Almanya) û UDK

<sup>1</sup> Ev nivîs ji Heftebameya Bas hatiye wergirtin: *Red.*



(Yekîtîya Demokratên Kurdistanê) bûn şîrikên vê kampanyayê û kampanya bi hev re hat meşandin. Piştî du salan yekta hev girtina sazîyên penaberan BAGIVê ku sazîyên Ermenan, Yûnaniyan, Asûriyan, Spaniyan, Yugoslaviyan, Tirkan û Kurdan endam û damezrênerên wê bûn, hat damezrandin. BAGIVê di komcivîna xwe ya duyemîn de daxwaza mafê dersa Kurdî xist bernameya xwe. Li ser vê yekê sazîyên Tirk ku nêzî Partiya Komunîst û CHPê bûn, ji BAGIVê veqetiyên.

Di vê demê de hemû xebat û serlêdanên di vê derbarê de rastî midaxale û rêgirîyên konsoloxane û sazîyên Tirk dihatin. Di destpêka salên 1990'î de YEK-KOM (Niha NAV-DEM- Navenda Civaka Demokratîk ya Kurdên li Almanyayê) jî bi aktîfî tevî vê xebatê bû. Bi beşdarîya NAV-DEMê xebatên bo

bidestxistina mafê dersa Kurdî bi-hêz û berfirehtir bûn û yekem car di derssala 1992/93 de li bajarê Bremenê li du xwendîgehên sere-tayî dest pê kir. Dersdarên pêşî jî Mamoste Emin Akbaş û Suleyman Gulpinar bûn.

### **Statûya dersa zimanê dayikê**

Qanûna mafê dersa zimanê dayikê teqez dike ku ji bo hemû zimanan e. Tenê li NRWê (Westfaliya Bakurê Renê) ji bilî Kurdî bi gelek zimanan ders tînin dayîn û ev ders ne mecbûrî ne û bi hin mercan ve hatine girêdan. Herwiha şertên her eyaletekê ji hev cihê ne. Ka em li ser NRWê rawestînin:

- Xwendekarên pola 1ê heta pola 10an mafdar in beşdarî dersan bibin.
- Ders li hemû formên xwendîgehên fermî tînin dayîn.
- Ji bo komikên xwendîgehên se-

retayî 15 xwendekar û bo xwendingehên dinê (polên 5-10) 18 xwendekar pêwîst in.

- Naveroka dersan ji aliyê wezaretê eyaletan ve tê amadekirin
- Li gorî şert û mercan di heftekî da herî kêma du û herî zêde pênc saet ders tê dayin.
- Kadroyên mamosteyan ji aliyê Wezaretê Perwerde ve tên diyarkirin û mamoste ji aliyê hikumeta herêmî an jî Daîreyên Perwerdeyê yê bajaran ve tên hilbijartin û tayînkirin.

### **Rewşa dersên kurdî**

Li gel hikumeta federal bi biryarnameyekê rê li ber dersên zimanê dayikê vekir jî hin eyaletan ji bo dersên zimanê dayikê çî amadekarî nekirin.

Ku em behsa perwerdeya Kurdî dikin, divê bê destnîşankirin ku di rastiyê de ders bi zaravayê Kurmancî têne dayin. Tenê li Kolnê mamos-teyek bi Soranî ders dide. Heta niha li Almanyayê li xwendingehên fermî dersa Dimilî/Zazakî nehatiye dayin. Li Almanyayê niha li van eyalet û bajaran dersên Kurdî têne dayin:

### **NRW:**

Bonn, Koln, leverkusen, Wuppertal, Essen, Duisburg, Oberhausen,

Bochum, Herne, Dortmund, Wesel (Voerde û Dinslaken jî di nav de), Munster û Bilefeld. Li van bajaran 11 mamoste ders didin.

Niedersachsen(Saxsina jêrîn) :

Kloppenbürg ,Wildeshausen, Oldenburg, Hannover, Celle, Peine, Osterholzschamberg û Achim.

Li vê eyaletê xwendekarên polên 1-4 dikarin beşdarî dersên Kurdî bibin, kom ji 11 xwendekaran pêk tên û heft mamoste ders didin.

### **Bremen:**

Li bajarê Bremenê ku bi serê xwe eyaletek e, xwendekarên polên 1-6 dikarin beşdarî dersên zimanê dayikê bibin û li vê derê du mamoste dersa Kurdî didin.

### **Hamburg:**

Li Hamburgê ku ew jî him bajar û him jî eyalet e, xwendekarên polên 1-6 dikarin beşdarî dersên zimanê dayikê bibin û li vê derê mamos-teyek dersa Kurdî dide.

Li van bajar û eyaletên navborî, dora 2 hezar û 100 xwendekar beşdarî dersên Kurdî dibin. Bêguman astengiyên teknîkî, plansazî û birêkûpêkkirinê hene. Lêbelê dema em hejmeta xwendekarên beşdarî dersa Kurdî dibin û gelheya Kurdên li Almanyayê didin ber hev, ev hejmar ne hejmareke ku



meriv pê serbilind bibe ye û sedema sereke jî xemsariya Kurdan bi xwe ye. Di derssala 2016/17an de li seranserê Almaniyayê 21 mamosteyên Kurdî ders didin, lê tenê li NRWê dora 800 mamosteyên Tirkî hene û derdora 90 hezar xwendekarên Tirk beşdarî dersên Tirkî dibin.

Pêşwendiyên darsa zimanê dayikê Ji bo xwendekar beşdarî darsa Kurdî dibin, ji dersên xwe yên dinê namînin. Dersên zimanê dayikê dema ku dersên din qediyar dest pê dikin. Dema ku ders qediyar divê xwendekarên Kurd beşdarî darsa Kurdî bibin.

Her xwendekar ji pola 3ê û pê ve ji bo Kurdî jî notekî distîne. Ev not tevî dokumenteke beşdarîyê li bawernameyan tê nivîsandin û beşdariya derseke bidil bo her xwendekarekî diyardeyeke qenc e. Xwendekarên kurd dikevin azmûna kurdî jî û eger Îngilîziya wan ne baş be, bi noteke baş ya Kurdî dikarin xwendina xwe biqedînin. Eger şert û mercên teknîkî û cih û peyda kirina mamosteyan, bêne bicîhanîn, dê xwendekarên kurd bikaribin di pola 7an de kurdî weke zimanê biyanî yê duyemîn an jî sêyemîn hilbijêrin. Hê jî ev maf nehatiye bikaranîn



# Magî Qomonîsto

## Ecevit Yildirim

Baranek xweş dibariya. Dilopên wê yên hûrik, xwe hêdî hêdî ji ewrên nizm berdidan xwarê. Hawirdor bi bîn û xişîniya baranê xemilî bû. Dar û daristan di bin barana payîzê de giran bûbûn.

Pelên daran ji giraniya şilûpela baranê stûyê xwe xwar kiribûn. Çûçikên ewra di bin pelên daran de li hev kom bûbûn. Xwe weng ji baranê diparastin. Bi gotineke din, payîzê bi hemû hêz û rengê xwe hukim li xwezayê dikir.

Nizanim çima. Lê di dilê min de hestek xof hebû. Ji kar derketibûm.

Lê dilê min nedixwast herim malê. Rêya malê min bi gavên hûrik li xwe dirêj dikir. Ji serîkî gund heta seriyê din yê gund bi bakirina dest-piyên xwe ber bi malê ve diçûm. Kincên li min, can û laşê min, ji serî heta binî bi ava baranê şil bûbûn.

Dilopên ku ji porê min diherikîn xwarê, heniya min diqalaştin û diketin nava çavên min. Mîna ku ji ava mezin filitîbim, şil- şirikî bûbûm.

Di wî halî de ez gihîştim malê. Min pêl li zilê malê kir. Etika min derî ji min re vekir.

– Wêê va çi ye ? Te çima xwe veng di bin baranê de hiştiye ?

– Baranê veng bi dest dikeve etê ? Min tam ji baranê derdixist.

– Tu kurik î bi baranê dilizî ? Te qet dil tune ye mezin bibî ? Te va çîn-çirtikên xwe bi cîh nehîştin. Eyb e fedî bike. Zû here va kincên şil ji xwe bêxê.

Rehmetiyê bavê min ji oda mezin ban kir:

– Were, were, Wahîd ji te re kîtabeke Kurmanciyê anî.

– Yox yaw çi kîtab e ?

– Wele Wahîd diçû kar. Ser deriyê xwe jî ûxramîşe mala me bû. Va kîtaba jî ji te re hişt. Tê de qala Kurmancên Qoynê- Moynê dike çir dike. Qala Celko- Melko jî kir de, min fazla anlamış nekir.

– Qala Kurmancên Qoynê dikir?

– Wer go de, kîtabên kurmanciyê ji xwe re mane ne. Kesin kîtaba qomînistlixiyê ye !

Malbata Wahîd û malbata me em cîran û hevalê hev bûn.

Wekî însanê malekê bûn.

Bavê Wahîd apê Hecî berî demekê teqawut bûbû û Almanya ber bi Enqerê terikandibû.

Wahîd jî mala xwe bar kiribû bajarê Wetzlar ê.

Ji ber wê me mîna berê zêde hevdû nedidît.

Mala Wahîd mîna pirtûkxaneyekê bû. Kîjan pirtûkê bixwazî li ba Wahîd

hebû. Min jî ji pirtûkên wî sûd werdigirt. Pirtûkên destpêkê yên di derheqê dîroka Kurdan de min ji Wahîd girtibûn. Normal min hemû pirtûkên wî nas dikirin.

Ku eger Wahîd bi taybetî ji bo pirtûkê hatibe mala me, wê çaxê gerek pirtûkeke girîng bûya!

Meraqeke mezin li min rabû. Min rahijte pirtûka li ser masê.

**Bîrnebûn**, *Kovara Kurdên Anatoliya Navîn* li ser hatibû nivîsandin.

Haya min ji Bîrnebûnê hebû. Wê çaxê nizanim Özgür Politika bû yan jî Özgür Gündem bû, daxuyaniya derketina kovareke Kurden Anatoliya Navîn kiribû.

Gelekî meraq li min peyda bûbû. Lê piştî wê min tiştek di derheqê kovarê de nebihîst. Min hema çav di nav rûpelên Bîrnebûnê de gerand. Bala min navên endamê redaksiyonê kişandin. Navên di redaksiyonê de wekî navên ji hêla mala me bûn. Xweşik bû. Wekî perçeyek ji me bû. Bi wî halî min rûpelên Bîrnebûnê tevdidan.

Etika min kuta min:

– Here sifte avekê li xwe bike, kinc mincên xwe biguhere, paşê li kîtabê mês ke.

Bavê min jî lê zêde kir:

– Sewa kurmanciyê ruhê xwe çûye. Çima heniya xwe nabî erdê, secde nakî, nimê nakî?

Ez ji odê derketim. Berî ku avekê li xwe bikim, rûpelên bîrnebûnê tevdan. Tê de nivîsa Mizefer ya bi navê „**Celikan Aşîretî**“ bala min kişand. Cilê wê deqê min nivîs bi carekê re xwend û teva kir.

Hesteke pir xweşik bû. Wekî ku min xezîneyek dîtibe. Cara siftê bû, ku min nivîsek di derheqê gund û eşîra me de dixwend. Pir tiştên ku min nizanibûn di nivîsê de derbas dibûn. Navên der, deşt, çiya, banî, kanî û malbatan tê de derbas dibûn. Heta bi navê kalê min be, tê de derbas dibû. Yanî bi gotineke din; Nivîsê qala me dikir.

Min cilê kincên xwe yên şil bi yên zûha ve guherîn. Bîrnebûn kir destê xwe û çûm cem dê û bavê xwe. Min dixwest nivîsê ji wan re jî bixwînim. De tu were wê, bavê min malbata xwe tim ji kurdewariyê dûr digirt. Her ku mijara pîrsa kurdî vedibû, pîrsa kurdî bi komûnizmê ve girê dida. Bi wî awayî ji xwe re mekanîzmeyeke parastinê ava kiribû.

Bi bawerîya bavê min, di mijara kurdewariyê de ez zêde di nav de diçûm. Tîrsa wî ew bû, kû ez ê teve gerîla bibim. Bi wê yekê, hewl dida ku him min û him jî birayên min yên ji min bicûktir ji xeterên bi pîrsa kurdî ve girêdayî biparêze.

Bavê min li Bîrnebûna di destê min de nêrî û go:

– Eee kîtabê xwe jî temel ji dest xwe bernadî?

– Baba, va dergîyeke pir rind e, dergîya axzê me ye. Yazarên xwe jî nas in. Wahît tê de heye, Mizoyê gundê me tê de heye. Nûh Ateş jî ji Xalko tê de heye. Yanî gî însanên hêla me ne.

Etikê min:

– Wîi, Mizoyê me yê Mala Bekir derxistiye va kîtaba?

– Erê. Mizo jî tê de heye etê. Yaziyek li ser Celko û gundê me jî yazmîş kiriye. Ez yaziyê ji we re bixwînim ?

Bavê min nedixwest ez nivîsê bixwînim. Berî ku diya min tişteki bê, bavê min ket navberê:

– Fatê, rê mede lawkî xwe. Vîqas bi dû kurmanciyê ketiye, çima roké heniyê xwe nabe erdê, çima nimê nake. Li dinya aliyê din, kurmancî ya wî xelas ke ?

Min go:

– Baba ew ayrî ye, va ayrî ye.

Bavê min:

– Na na ayrî diwe? Kurmancî ne lazim e. Quran û îman lazim e bi me. Ya ku me xelas bike îman e!

Etika min go:

– De ma bixwîne Nûrî, çir be. Ka Mizo çing qala gundê me kiriye. Min meraq kir ha!

– Fatê, Atqafasiyê çi yê xwe heye, ku qalê bike. Gundek e îşte. Bike bike yê qala qomistlixiyê bike. Mizo ez nas dikim. Kurikê gundê me ye. Hevalê

Hesikê me ye. Bi Hesikê xalê min Miç va bi dû qomînistlixiyê ketine.

Te hay jê heye, roké Hesikê bi min re gote çi?

– Na min hay jê çi ye ? Hesikê gotiye çi bi te re.

– Rokê em li gund rûniştibûn. Xalanê min jî gî hene. Cimatê qerbelix e. Î sikinî, di nav cimata de bi min re go: "*Halaoxlu, senin allahin kaç numara ayakkabi giyiyor?*"

Fatê min ji cimata hazir fedî kir, ez ketim binê erdê û derketim.

Ji bo ku ez nivîsê nexwînim bavê min çi ji destê wî dihat dikir.

Ji helwesta etika min, min jî cesaret wergirt û go:

– Baba, lawkê xalê te li te wer kiriyê, suncê Mizo çi ye, suncê dergiyê çi ye. Min yazi xwend. Tê de mîna ku tu dibê qomînistlix- momînistlix tune ye.

Ama tarîxa gundê me heye. Em ji ku hatin, kengî hatin. Navên çiya, banî û kaniyên gund tê kirin. Heta navê kalê min Hamo jî tê de heye. Eger ew qomistlixî ye, hîngê temam. Zaten wî jî roké ne nimê dikir ne jî rojî digirt.

– Navê kekê min yazmîş kiriyê Mizo?

– Erê!

– Xo, navê kekê min yazmîş kiriyê!

– Erê yazmîş kiriyê baba

– Hm, halla halla!

Argumentên bavê min bi dawî hatibûn. Ti gotineke ku lê zêde bike nemabû. Ketibû dubendiyê. Normal tim li dijî kurdewariyê bû. Lê niha tam ji deziya dil hatibû girtin. Ji dê û bavê xwe re pir hurmetkar bû. Dilê wana tu car li xwe nedihîşt.

Ji bo ku dilê dê û bavê xwe bikê, tu fedakarî ji xwe nedievşand. Demekê bê deng ma. Etika min dawî li bêdengiyê anî:

– Nûrî, de fazla gir meke lo. Lawikî dixwaze yaziyek li ser gundê me bixwîne. Di ber wî, gundê min û te ye. Mizo jî însanê gundê me ye, cîranê me ye. Em heta êvarê li ba hev bûn. Pariyê nanê me tevehev bû !

Di rastiyê de meraqa bavê min jî rabû bû. Lê ji xwe re kiribû edetekê. Ew misilman bû. Yên ku xwedî li kurd-bûna xwe derdiketin jî bi komunîzmê tewanbar dikir.

Bi tevî meraqa xwe go:

– Neyse, tamam. De ma bixwîne. Zaten qomînîstê mezin lawkê te ye.

Dû re jî berê xwe berve min kir:

– Magî qomonîsto, te dîsa bi ya xwe kir!

Ama şerteke min heye; di yaziyê de qala Marks û Mao bû, ez nahêlîm yazi were xwendinê. Ma we hay jê hebe. Ez navê Mao nakim mala xwe. Ona gore!

Bavê min, di ber xwe de bi dengêkî nizm, mize mize xwe dewam dikir.

Min jî zêde dirêj nekir û cîlê dest bi xwendina nivîsa Mizo ya bi navê „**Celikan Aşireti**“ kir.

Ew mize- miza bavê min ya di destpêkê de hêdî- hêdî hate birînê.

Min him nivîs dixwend û him jî yekcaran di bin çavan re li dê û bavê xwe mês dikir.

Diya min ji hêlekê û bavê min jî ji hêlekê ve, devê xwe vekiribûn û li nivîsê guhdar dikirin.

Her ku nivîs dirêj dibû, ifadeya serçavên bavê min dihat guherînê. Nermtir dibû.

Dîroka Celikan û ya gund, dîroka wî bû jî. Heta wê rokê çavkaniya zanebûna wî ya dîrokî tim xoceyên camiyê bûn.

Wana jî tu car mîna vê nivîsê qala eşîr, gund, navên malbat, çiya, deşt, zinar û her awayî ewqas nêzik qala wî û nasnama nedikirin. Bişîrîna ku lê peyda dibû nikanîbû veşêre. Di cihê ku navê bavê wî derbas dibû, min li bavê xwe mês kir. Kêf kêfa wî bû. Çav lê mezin bûbûn û dibiriqîn.

Gava min nivîs teva kir, bavê min deng jê derneket.

Etikê min:

– Yaziya ku tu jê ditirsî va bû Nûrî? Tê de tiştêkî neçê tunebû. Ew Muks bû Mo bû çî bû, ewê te jî tê de tunebûn. Te wiqas mezin kir. Min jî go qey çî ye.

Min jî li etika xwe zêde kir:

– Heta niha qet xocekî qala bavikê te nekir. Ama Bîrnebûnê qalê kir. Bavê min rahijte Bîrnebûna ku li ser masê bû. Xwe li ser xwar kir. Di nav rûpelên wê de hinekî geriya û got:

– Va kîtaba niha ya Wahît e, ne ya Mizo ye?

– Ne ya Wahît e, ne jî ya Mizo ye. Va dergiya li ser kurmancên axza me yayinê dike.

– Yaziya gundê me jî Mizoyî Bekir yazmîş kiriye?

– Erê wî yazmîş kiriye.

– Wala aferim ji Mizoyê Bekir ra! Îşekî mêra kiriye! Bi Wahît re bê ma vê kîtabê tim ji me re wûne !

Bi ser vê bûyerê re çend sal derbas bûn. Bavê min bi her hejmareke Bîrnebûnê şa dibû. Bi Bîrnebûnê re digo dergiya me! Bîrnebûn faktorek bingehîn bû, ku bavê min ber bi dawiya emrê xwe, li ser kurdbûna xwe vegere. Di berdewamiyê de bavê min bi nexweşiyê giran ket û ji vê dinê bar kir dinya ku jê re digo dinya heq. Ew kurmanciya herêmî jî bi xwe re bir dinya din. Me jî wek malbata wî û li gor dilê wî, gora wî li Celikan bi nivîsa kurdî **“Rehma Xudê her tim li ser bibare”** xemiland. Em hêvî dikin ku nivîsandina kevirên tirban bi kurdî, ji herêmê re bibe mînak û edetek !



# Mînîbûsa bavê min û şevêk li ser rêya Hesarê

Adem Özgür  
ozguradem25@gmail.com

Otobûseka bavê min hebû, pê gundî dibirin Kulu, Ankara û Konyayê. Otobûseka gir bû û pir kes heydina. Şirîkekî otobûsê jî hebû, ew şirîk jî Hesenê Mala Eloyê Mamê Simê bû. Ji bavê wî re digotin, Eloyê Tirk. Her wiha ew zavayê me ye, merê meta min e. Ji bavê min re jî dibêjin, Tefîqê Mestê Hesenko, pir kes jî jê re dibêjin, Tefîqê Rehmika Elî. Rehmik jî gundê Hesarê bû, loma car caran navê dayîkê jî dibêjin.

Rojekê motorê otobûsa bavê min şewitî, loma bavê min çend salan bi şûnda otobûsa xwe firot û li şûna otobûsê, mînîbûsek sand. Rengê mînîbûsê sor bû, li nav gund mezinên me, bi min qerfên xwe dikirin. Sewa rengê mînîbûsê sor bû, ji min re digotin hûn ne ji vî gundî ne. Ez ji ber wan qerfan pir hêrs dibûm.

Ji ber wan qerf û şoran bi şûnda ez çûm ba bavê xwe, min gotê: “Bavo, Bektaşê Mala Heskî Kinê, Kemalê Erebe Şîxê, Yaşarê Mala Miçê û Mehmedê Gulê ji min re dibêjin. “hûn ne ji vir in. Divê hûn ji gund derkevin.” Bi rastî ez jî meraq dikim, çima mînîbûsa te sor e? Ez

pir pê hêrs dibim. Bavê min keniya û got: “Ew ji te hez dikin loma wer dibêjin, dev jê berde, ma bêjin.”

Bavê min gund bi gund digeriya tiştên bi dîwaran dardixin; saetên dîwêr, lewha û tiştên veng difirtin. Ez jî piranî bi bavê xwe re digerîm, diçûm gundan. Kêfa min jê dihat. Ez di wan salên xwe yên piçûk de, li pir gundên kurdên me geriyam. Min nanê wan xwar, bûme mêvanê wan. Malên ku em diçûn ji min hez dikirin, diyarî didan min û ji me tişt distandin.

Tê bîra min ku mînîbûsa me tije dibû, ji mînîbûsa me bêtir li gund tu mînîbûs tune bûn û berê mîna niha li ber her malê wesayît jî tune bûn. Di mînîbûsê de carna panzdeh kes, carinan jî bîst kes dibûn. Kurik li ser hev rûdiniştin, pirî caran keç û xort li ser pêyan heta bajêr diçûn. Wan xwe bi xwe şor dikirin, digotin “ne bes e, ku te mînîbûs vi qes tije kir, em li ser hev rûniştin, bêhn li me teng bû.”

Ez pirî caran bi bavê xwe re diçûm Qulekê. Di mînîbûsê de her dem sohbetêke xweş geş dibû û min

ji wan sohbetan pir hezdikir. Sohbet tim bi kurdî bûn. Ew sohbet, êkser li ser lêdan, çîrok û aboriyê bûn. Piranî jî li ser lêdanê bûn, carinan jî qala keç û bûkên xelkê dikirin. Kî çing, ji ku derê zewiciye, kî dilgirtî ye û kî nexwaş e; me di mînbûsê de dibîst.

### Çûyîna Hesarê

Em xwarziyên Hesarê ne. Diya bavê min Rehmika Elî ji wî gundî bû. Keça mala Ewê, xwanga Cemêl û Mecît bû. Wexta ku pîrika min a Rehmik dane kalê min Mestê mala Hesenko, ew hê piçûk bûye, loma jî tim direvîye û diçûye gundê xwe, lê paşê disa çex dibûye, dihatiye mala xwe. Va çûyîn û hatinan heta ku kurikên wan bûn berdewam kiriye.

Li gundê Hesarê “*mala ocêx*” hebû. Mala Memed Elî. Li vir bûka mala xaltîya bavê min Moxik hebû. Di mala ocêx de nivîşt dihatin nivîsîn, dia dihatin kirin. Baweriya kurdên Anatoliyê ji wan hebû. Bi gotina wan, kî di nav mala ocêx re derbas be, wê êdî tişteke naye serê wan. Bi şimikê êş dihatin rindkirin. Ew xewnên bitirs nabînin û mejûyê wan xirab nabe.

Dê û bavê min tim qala Hesarê, serpêhatiyên xwe dikin. Di wexta ciwantiya xwe de tim diçûne wira, li wir dimane û di mala ocêx de limê dikirine û dia dixwandine. Kurikbû-

na bavê min, ap û metên min li wir derbas bûye. Wexta ku em gihêştin, em jî tim diçûne wê derê.

Rokê mala me, mala apê min, xaltîya min û Qîmet a dotmama pîrika min a bûka mala Xelî Bexdê (Qîmet jî bi bûk hatibû gundê me) em bi hev re çûn Hesarê. Em di mînbûsê de nêzî panzdeh kesan bûn, piranî kurik bûn.

Di mînbûsê de çend kesan xewnên bitirs didîtin, çend kurikan di xewê de bi bin xwe de mîz dikirin, çendan jî dixwest li wê derê şîfayê bibînin. Wexta ku em ji malê derketin ro hebû, eyam xweş û aram bû. Niv saetê şûnda em li Hesarê, li ber mala ocêx bûn. Em gîştik peya bûn, kurik çûn derva ku bilîzin, mezin çûne jor.

Wexta em li mala ocêx bûn, xalên bavê min Cemal û Mecît; lawkê Cemêl Şêx Osman û malbata xwe; xaltîya bavê min Mox û keçka xwe û çendên din ên ku ez wan nasnakim li wir bûn. Heta nivê şevê sohbetên berê hatin berzîmên, yên ku zûva hevdû nedîbûn hatin ba hev, dia hatin xwendin, limê hatin kirin, şîret ji bûkan re hatin kirin û wexta çûyîna nêzik bû. Li ezmên ewr gihîştin hev, pêçkê bi şûnda birûskê avêt û pismamê min ji derva hat û got: “Baraneke şên tê, de em rabin!”

Gotina pismamê min Emrah bi rast bû û pêçkê bi şûnda baranê lêkir,

heta ku me xatirê xwe ji xwedanmala-  
lan xwest û em li mînîbûsê siwar bûn  
baranê şên kir. Em derketin rê û me  
berê xwe da gund.

Nîvê şevê bû, baran pêde pêda  
şên dibû, li derva çav çava nedidî.  
Her çiqes mînîbûs bilez diçûbe jî,  
nedibû. Di kort û kendalan de, di  
nav gil û giyan de em heta nizike  
zeviyên gundê Doğutepeyê hatin.  
Doğutepe gundekî piçûk bû. Hemû  
gundî tirk bûn. Mînîbûs li wê derê  
ket nav zeviyê û jê derneket, di wir  
de ma. Kurik gîştik tirsîn, ji wan  
çendikan dest bi girî kir, çendikan jî  
qîre qîr bi ser ket. Ev tirsî, tenegê jî  
tirsî mala ocêx bû, bandor li ser me  
kiribû.

Mezin û çend zarok derketin der-  
va, qeweta xwe dan mînîbûsê, lê tu  
fêdeya xwe nebû. Kort hate firehki-  
rin, mînîbûs tenegê xûş kirin, paşde  
ajotin derneket; çamûra derdorê  
paqij kirin dîsa nebû. Çare tune bû,  
em wê şevê di nav zeviyê de, di mînî-  
busê de man.

Seda zû bû, ro nû hilhatibû,  
dengê keriyên pêz ji dûr ve dihat.  
Bavê min peya ket rê, çû gundê  
tirka, Doğutepeyê. Li wê derê çûye  
malekê, ji wê malê him alîkarî him jî

bo me tiştên xwarinê xwastiye. Sae-  
tek bi şûnda bavê min çex bû hat. Bi  
xwe re çend nan, pêhîr, tenegê zeytîn  
û mast anî. Li malekê, ji gund re te-  
lefon jî vekiriyê û alîkarî xwastiye.

Me dest bi xwarinê kiribû. Em  
gîştik him birçî, him jî bêxew bûn,  
me nanê xwe xwar, ava xwe vexwar  
û em li benda gundiyên xwe sekinîn.

Saetek bi şûnda du traktor ji gund  
hatin. Yek ji wan, traktora Avoyê  
mala Hec Ehmet bû, Avo mêrê meta  
min Gulê ye. Avo bi kelecânî ji trak-  
tora xwe peya bû, hat ba me û ji me  
re got, “Metirsîn, em ê niha we ji vê  
derê derxin.” Benek avêt mînîbûsê û  
serê ben yek jî bi traktora xwe girêda.  
Traktora din jî ya mala Mehmedê  
Ûsikê bû. Ûsikê lawkê Hesikê pê ra  
hatibû. Ew jî hat ba me û paşê alîka-  
riya Avo kir. Traktor bi paş de anîn,  
nêzikî mînîbûsê kirin. Piştî çend  
hewlan mînîbûs ji şûnê derket. Em  
gîştik şa bûn, kenekê bi kurikan girt.

Piştî demekê mînîbûs şixulî,  
em disa derketin rêya xwe, gihîştin  
gundê xwe.

Ne ev tirsî mala ocêx, ne jî kelecana  
mayîna di nav zeviyan de tu car  
ji bîra min neçû.



# GERA MIÇO A DANEKÎ

Nuh Ateş  
nuhates@web.de

Ez di xortanîya xwe da çûm Alemanyayê. Ji ber sebebên çêşîd, cara pêşî ez nêzika sih salî şûnda hatim gundê xwe û mahekê lê mam. Zemanê berê, gund bi navê Milan dihat naskirin. Milan li navika Deşta Anatolîya ye.

Peyîz bû, rengê boz xwe avêtibû derûdorên. Rojke heyamxwaş, ji niv-ro şûnda ez ji mala dêûbavê viderketim û min berê xwe da Meheleya Jêrî ya ku niha jê ra Meheleya Alemaniyan tê gotin. Bireke mezin ji kesên ku çûwûn Alemaniya û welatên din yê Awrupayê li wê derê xanî çêkirine û jê Meheleyeke mezin peyda bûye.

Xanîyên vê Meheleyê li ser girekî pan û derûdorên wî hatine çêkirin. Li gorê qalkirina mezinan, van derana berê mexelên kerîyên pêz yê çend malbatên mezin bûye. Li wan çaxana, dewara xelkê gundê Milan bi pêz dibûye. Ejdadên wan eşîreke koçer bûye. Bi sedan salan di ber vê, ev eşîra jî tevê, çend eşîrên koçer ji ber sebebên çêşîd ji Kurdistanê bi kon û kerîyên xwe yê pêz va berve Welatê Romê, Deşta Anatolîyayê kişîyane. Paşê, ew li wir bi fermanên sultanên osmanî hatine bicîhkirin. Niha mexelên wan

çend malbatan bûye şûnûwarê xanîyên newîyên wan yê ku bûne koçberên welatên Awrupayê.

Hen kesan li wir xanîyên bilind, duqat û li ser dirêjîyê çêkirine. Ku te mêyla xwe ji nêzik da dida wan, ew ji te va mîna dersxane û nexwaşxaneyan xway dikirin. Hen kesan jî qonaxên mezin yê bi çardaxên fereh û duper çêkirine. Xanîyên li vir gîşt bi hewşên bilind yê ji pirîket û beton hatine dorpêçkirin. Li ser dîwarên hewşan singên hesînî hatine kutan yê ku bi têlên binişik bi hev va hatine girêdan. Bi vê şekilê, ew mîna hewşên hepîsxane û eskerxaneyan xway dibûn. Sewa çi ev hewşên bilind û bi bed? Sewa ku kurik, kûçik, pisik û dizûmiz nekevin baxçe û malên wan. A rind ew e ku wan qet newe di hewşên xwe da dar danabûn.

Bi rû xanîyan da, ji wan cihê, Alemaniyan di nava hewşan da aşxane, gera jî abdestxane yê bi usula berê çêkirine. Aşxaneyên wan bi serî xwe mîna xanîyekî bûn. Li gorê qalkirinan, xwedîyên van xanîyan wexta xwe pirtir di aşxanan da derbas dikin. Li wir nêzîkê dixwin, şîvan dikelînin û dixwin.

Tenê sewa raketinê yan jî ku mêvan dihatin ew derbase xaniyên malê yên mezin dibin.

Çi çêşid in, ji xwedîyên van xaniyan hen li Alemanyayê bi malbata xwe va di xaniyên heftê-heystê metreqereyî û bi dusê gwoz û mawêynîyekê da rudinine. Lê li gund, wan xaniyên ji dused-sêsed metreqereyî bi pêncşes gwoz û mawêynîyekê çêkirine û bi rû da jî aşxaneyek. Lodek pere, li gor mezinî û qelîteya malzemeyan, kêmtir pênce-şêst hezar awro ji bo çêkirina xaniyên li Meheleya Alemanîyan dihên xerckirin. Vîqasî ku min ji vir û wê bihîstiyê, di çêkirin, rêxistin û xemilandina xanî û aşxaneyan da pirtir şora jinan derbas dibû.

„*Yê wî heye, ma yê min jî hewe!*“ Yan jî „*Ma yê min di ser yê wî ra be!*“ Te ê bigota, alemanîyên gundê Milan li gor van dirûşman ji qahre hevûdu ra xaniya çêdikine û ketine pêşbazîya xaniçêkirinê. Pir caran ew bi çêkirina xaniyan dihên pesandin û pê şa û xag dibin. Sewa vê ye ku hen ji wan ji bankeyan qiredî dikşînin û dikevin bin dêynên giran.

Deriyên pir xaniyên vê Meheleyê girtibûn, tu ê bibêjî xwedîyên wan barkiribûn. Tenê bahar û havînan xwedîyên wan bo sêûçar hefteyan dihên û tatîla xwe li gund derbas dikin. Çima ku ev Meheleya li yanzdeh

mahên salê xewle bû, diz û qirikên reş lê peyda dibûn. Xwedîyên xaniyan sewa parastina ji diz û qirikan nobedar ragirtine yên ku bi şev û ro li nav Meheleya Alemanîyan digerin. Bi sedan qirik, qefle bi qefle li ser banên van xaniyan dadinîşin û ji qijîniya wan meriv nedihewî û ditirsîya.

Li gund xanî êdî mîna berê bi malzameyên li ber nigan yên bê yan kêmbedel nayên çêkirin. Kevir, kerpîç, xwelî, çemûr, ka, qamûş, hasir, kirîş rabûne, tunin. Niha Malzameyên xaniçêkirinê beton, pîrîket, kiremît, kereste û hesin e.

Gavekê ez li nav vê Meheleya ecêb gerîyam. Paşê ez tozîkê berve hêla wê ya jêr daketim. Li wir, wexta ku ez di ber malekê ra derbas bûm, min mês kir ku jin û mêrek li çardaxa wê rûniştine. Me hevûdu dît û silav kir. Wexta ku ew li min venêrîn, min xwe bi wan da naskirin û got; „Ez Mistoyê Memo û Kewê me, lê li gund vi min ra dibên; „Miço.“ Wana jî xwe dan naskirin: Zêwîka Mestê bi mêtê xwe Heyderê Şêxo va bûn. Me hevdu berê da nas dikir, lê zûva ye ku me hevûdu nedîtibû. Wan bang kirin, gotin: „Miço ware çayeke me vexwe, Xwedêkê tu warî!“ Min nexwast wan bişkênim û çûm ba. Xaniyê wan li perê jêr yê Meheleya Alemanîyan bû. Heyder bi Zêwîkê va li Awisturyayê diman. Lê sewa ku ew tekewûd bûn pirtir li

gund diman, tenê zivistanê vedigerîyan Awisturyayê, ba zarok û newîyên xwe.

Ji halûxatir pirsînê şûnda, Zêwik rawû ser xwe û sewa çêkirina çayê çû aşxaneyê. Mala wan jî kêr û zêde mîna yên vê meheleyê bû. Heyder salmezin bû. Li gor qalkirina wî, ew î heftêpênc salî bû. Zewik jî şêstêpênc salî bû. Pêçekê şûnda, mîna ku hatina min û çûyîna Zêwikê ya aşxaneyê ji Heyder ra bûwû fersendekê, wî dest pê qalkirina jîyana xwe kir û veng pêda çû:

- Ez nîvsêwî mezin bûm. Bavê min zû mir, hîngê ezî şeşûheft salî bûm. Em sê xwang û bira nîvsêwî man. Dewara me ne rind bû. Dayika me, vîqasî ku ji dest wê dihat, li me mês dikir û xalê min destê xwe bi ser me ra digirt. Paşê, ew î li dunya heq e û rûhê wî şad be, xalê min ez birim ba xwe. Ez î hîngê herhal çardeh salî bûm. Wî li Ankarayê di êtfayê da kar dikir. Xwedê hezar carî jê razîbe, wî salê min piçûk dan qeyitkirin û ez şandim Mekteba Senaatê. Min pir xîret kir û xwand û mekteb teva kir. Xalê min merivekî pir dûrist û xêrxwaz bû. Merivên veng, tu î ku dest û nigan zêr bikî. Wî ez zewicandim jî, keçika xwe, Zêwik li min mahr kir. Lê çî gune ye, wî Zêwik neşandibû mektewe. Hîngê edet bû, keçik nedişandin mektewan. Li salên heftêyî yên sedsala rabirtî ez

berê çûm Alemanyayê û paşê derbase Awisturyayê bûm. Pir neçû, min Zêwik bire ba xwe.

Gava ku Heyder qala sêwîtiya xwe dikir, pê ra kelgirî dibû. Di wê navberê da, Zêwikê çay anî û da ser maseyê. Wê hema deng û şora mêrê xwe birrî, mîna ku wî azar bike û got; „Carekê daweste mêro, Miço hîn nû hatiye, tu çî hema dêst pê katkirina hekat û mekatên xwe dikî!“

Heyder bêdeng ma û serî kire ber xwe, lêbîlem di bin çavan ra jî neçê, bi mirûzekî tahlkirî û bi devûlêvên gûvaştî li jina xwe mês kir. Ku te bixwasta mêskirina wî ya neçê, mirûzê wî yê tahlkirî û devûlêvên wî yên gûvaştî wergerînî ser gotinan, te ê bigota, wî ê bixwasta ku ji Zêwikê ra wer bibêje: „Mi magê dinîkê, tu duayan li xalê min û rindiyên ku wî ji min ra kirî bike, ku ne xatirê wî bûya, na min tu zûva berdawû!“ Em her sê jî bîstekê bêdeng man. Tenê dengên ku ji tevdan û firkirina çayê derdiketin ji ser me heldihatin.

Ez bi xwe jî bûbûm şahîdê vê. Carcaran, wexta ku mêrên gund bi gotin û hereketên jinên xwe hêrs dibûn û pê hetanî dêv dihatin, gotina berdanê ji devên wan derdiket. Lê ev pir caran gotineke vala bû, wan pê hundirê xwe vedisand û pê jin azar û şîret dikirin. Ji xêyrî îstisna, tu kesî jina xwe sewa

bilévkirina gotina, „Ezê te berdim!“ yan „Min tu berdayî!“ bersedida.

Zewikê xwe ji wan deran nedikir, mîna ku bibêjî, wê hay jê hêrsbûna mêrê xwe nebû. Wê bêdengîya Heydar fersend zanî û ew li min pirsî, bi lez û li serhev got:

- Miço Miço ez qurban, te çi rind kirîye ku tu hatiye gundê xwe! Heyder carekî nehîşt ku em li halûxatirê te bipirsin! Êê, çir dikî tu rind î, ji te ra xwarinek çêkim, Xwedêkê!? Tu zevicî yî? Te dil neheye ku ji xwe ra xaniyekî li vê Meheleyê çêkî? Qet nebe erseka xwe bîstine û harimeke (hewşeke) xwe di dorê ra çerx bike!

Wexta ku wê deng dikir û pê ra jî sivik dikenîya, hîngê her du didanên wê yên zêrkirî yên pêşî û çengê jor xway dibûn û dibiriqîn. Wê kefiyeke bi çînuçirtik dabû seriyê xwe û gûçikên wê li paş serî bihev va giredayî bû. Stû, bisk û cênigên wê xway dikirin. Li gor edetên berê gûçikên kefiyê li bin çengê dihatin girêdan. Lê te ê bîra min, wexta ez xortekî nûgîhêştî bûm, jinên di nav karên malê da kefiyên xwe veng, mîna Zêwikê girêdidan. Çima ku karên jinan yên hîngê pirtir bixwarvahatî dihatin kirin. Hela jî wexta ku jinan di teştê da hevîr distran, kinc û qaw dişûştin û binê xermanan rêş dikirin yan jî sewa gihandina hev ya ardûyên malê, wekî çêkirina tepikan, berehevkirina kûşkûran, kix û xişikên

di hewş, gom û mexelên pêz da. Sewa ku gûçikên kefiyê, por û guliyên wan berjêr danekevin û ji wan ra nebin manî, wan gûçikên wê li paş serî, di bin por û guliyên ra bi hev va girêdidan. Di sayê vê da, stû û bingûhên wan, hela jî li germên havînê, hênik dibûn.

Gotina, „ez qurban“ ya ku Zêwikê bilévkirî ez birim çaxa zarokatîya xwe. Dayika min ya rehetî hat bîra min. Min çav tijî kirin. Li mirinîya wê, min nikanîbû ku bihatama ser meytê wê, hukumdarîya neyaran rê nedabû. Min gotina, „ez qurban“ pir caran ji dayika xwe dibihîst. Carina, sewa ku ew hezkirin û şabûna xwe ji bo zarokên xwe, pirtir ji bo lawikan, nîşan bide, va gotina ji devê wê derdiket. Carina jî, wexta ku wê dixwast karekî yan rindiyekê ji zarokekî xwe rica bike, wê bi gotina, „ez qurban“ yan „ez di dorê“ destpê dikir. Lê wexta ku zarok înad dikir, bi gorê wê nedikir û li bergerîn û sergerînên wê bê têsîr diman, hîngê wê dereceyê xwequrbanîkirinê bilind dikir, digot; „Ez kera te bim!“ yan jî “Ez kûçika te bim!” Li wan çaxana, kultura xwequrbanîkirin û xwepiçûkîkirinê pirtir li ba jinan li revacê bû.

Bi pirs û pêşniyarên ku Zêwikê li ser zewacê û çêkirina xanî û hewşê avêtibûn ber min, ez li gund herdem rûbirû dibûm û pê hêrsê min radibû. Min ji Zêwikê ra got:

- Na, tu sax bî, tu xwarinûmarina çêmeke, ez î têr im! Ez tu xanîyan li gund çênakim û tu hariman jî çerx nakim! Niha îhtiyaca min pê wan tune. Li mala dêûbavê, li ba birayê min î piçûk şûn ji min ra heye. Peryê min jî tunin ku pê erseyekê bîstinim û xanîyekî çêkim. Ku peryê min hewûna jî, min ê ji xwe ra tolikeke piçûk ji kerpîça çêkira. Besê min e, ez merivekî bi tenê serî xwe me!

„Çima peryên te tunin, zûva ye ku tu Almanyayê yî, dera ku peryên te hewûna!?“ Zêwikê got. Heyder jî bi serîhêjandinê ew tesdîq dikir û da ser, pirsî û got; „Ma tu li Almanyayê naşixûlî?“

Min jî pirs û sohbetên veng, yên li ser xanîçêkirin, zewac û peryan hez nedikir, lê dîsa jî min bersivek da wan û got: „Li Alemanyayê min li Xwendigeşa Bilind Turîzm û Ragihandinê xwand. Lê min ew di nivî da cihîşt, ez tê neçûm, serkevtî nebûm. Ez nezewicîm, lê dosteka min ya aleman hewû. Me ji hev hez dikir. Lê em nezewicîbûn. Tu zarokên me jî nebûn. Paşê wê dostekî xwe î din peyda kir û sewa wê em ji hev veqetîyan. Lê feydeya wê pir bi min bû. Di sayê wê da ez li pir der û welatan gerîyam. Wê ez kirim hezkirê gerê! Ez gerîn û dîtîne û guhdarkirina li serhatîyan merivan bi malî dunyayê naguhêrim. Li vir û wê, ez di qehwe û restoranda da dişixulîm

û peryên ku dikevin dest min li gerê xerc dikim! Bi van gotinên min, Zêwikê û Heyder matmayî û bel bel li min mês kirin.“

Pêçek neçû, em bûn guhdarê dengê zengilên kerîyek pez yê ku di jêr mala Heyder û Zêwikê ra derbas dibû. Ji mala wan wêda şikur xanî tune bûn, meydanake fereh hebû. Çima ku ev dera tozîkê avî bû, çêre lê rind rûstibû. Pezê van deran cînsê gewr yê karamanî bû. Kerîyê pêz ji me va xway dikir. Me dengên ku ji zengilên bi stûyê mî û bizinan da belav dibû, rind dibihîstin. Tê bigota, li wê jêrê meqamekî xas, xwaş û lihevhatî yê ku bi livîn, birêçûn û çêrina pêz va ji tonekî dikete tonekî din, dihate lêxistin! Te dixwast wî wekî, „Meqamê Çêrina Pezê Stûbizengil“ bi nav bikî.

Wexta beran berdanê bû. Mî û beran arengkiribûn û bi rengên sor, bi çînen çêşîd hatibûn xemilandin. Beran bi lez heldikiştin ser mîyan û xwe lê dikutan. Sewa ku bi mîyan va bibin yek, wan carcaran bi merasîmêke xerca sêyrê, xwe di hevûdu ra gij dikirin. Siftê ew giran giran ji hevûdu vedikiştîyan. Paşê ew li ser henîyê mîna brûskê diberiztin hev û bi strû û serîyên xwe yên hîşk pît li hev dixistin, pê girminîyeke weng bi ser wan diket, te ê bigota ewrê barê li hev dike-

vine. Şivan li kerê nîştîbû û kal kal di pêy pêz diçû. Du kûçikên şivana jî bi qeydeya gîranîyê di pêy wî va dihatin. Carcaran dengê fitefit û firîskîya şivên li meydanê belav dibû, mîna ku bibêjî wî dixwast ku pê pêz bi hebûna xwe bihêsîne û aşt bike. Zêwik, Heyder û ez li ser çardaxê gavekê bûn guhdar û sêyrdarên van deng û manzereyan.

Heyder bi derbasbûna kerîyê pêz di jêr mala wî ra şa bû. Wî navên zengilan heldida; „çang“, „çaqirdaq“, „gumurdaq“, „zîl“, „liqliq“ û dengên wan jî hev derdixistin. Sohbeta me êdî çerxe ser pêz, şivan û şivanîyê bû. Di xortanîya xwe da Heyder demekê şivanî kiriye. Weng xuya dikir ku wî dil hebû qala serhatîyên xwe bike. Zêwikê tê nêta mêrê xwe anîbû der, mîna ku xwast xwe bade, ew rabû û çû aşxaneyê. Çûyîna wê jî Heyder ra bû bahane, wî hema dest pê katkirina serhatîyeke xwe kir û veng pêda çû:

- Viqasî ku tê bîra min ez î dwanzdeh salî bûm. Wan çaxana li gund pez pir bû, deh-panzdeh kerîyên gund hebûn û xelkê dewara xwe pirtir bi pêz dikir. Lê niha, li gund tenê du kerî hene. Bahar bû, rengên kesk û heşin dagirtibûn ser derûdeştan. Hingê ez bi rehmêtî Hemê Hecî va diçûm pezê Malê Alê. Pezê nêr bû û viqasî ku di bîra min da maye dused pez hebû. Hemê Hecî serşivan bû, ez jî dûajo bûm. Paş êvarê, me pez jî çemê kwîrik

derbas kir û di paş Girê Morik ra hêlbûn. Gava ku bû tarî, me pez berda zevîya Mihê Reşo. Zevîya gênim bû û bihostekê rûstîbû lê hîn serî û simêl dernexistbû. Hîn ku em negihêştibûn zevîyê, Hemê Hecî li kerê sîwar bû û bange min kir, got; „Heyder, vî kavirî hanî piçûk bigre û wûne bide ber min. Tu jî destek gîya berev bike û wexta ku tu ketî nav zevîyê, pê şopa lingên xwe şelî bike, sewa ku paşê şopên nigên te neyên naskirin!“ Mîna kavir girt û anî da ber wî. Paşê min ji gîyayê ku min rûçikandî destek çêkir, sewa şêlikirina şopa nigên xwe. Pêz têr xwar û me ew ji zevîyê viderxist. Gava ku em ji zevîyê vidûrketin, Hemê Hecî kavirê li ber xwe deyna herdê û bi xwe jî ji kerê peya bû. Me pez berve deşta kerîyan kişand. Bi rê da pez hîn diçêrî. Mezinan digotin, pezî nêr têrbûna nîzane, heqeten jî weng bû. Li wan deşt û qerecan hewşan û cadirî jî tevê, çêre û gîyayên ku pez jê hezdkirî hebû.

Li vir Heyder navberek da gotina xwe, mîna ku westîyabû. Wî keserek kişand û firek ji çayê li ber xwe vexwar şûnda, devam kir û got:

- Bi nivê şevê me pez kişande fêzê. Pêz rind têr xwaribû. Ew perçifî bû, mîna ku diwên, zik vi ser piştê ketiwû û zû mexel hat. Em jî rind westîya bûn. Me yek qozîyên bi hêk û pîzav xwarin. Dûv ra, her yekî ji me kulavê xwe li xwe kir. Hemê li perê jorî pêz

xwe dirêj kir, min jî li nav pêz serî dêyna herdê. Şevê hênîk û ezman çikûsayî bû. Di orta pêz da, min xwe di kulavê şivana da li ser kêlekê nûre serhev kiribû, mîna ku bibêjî, ez î di fanosekê da bûm. Bîstek neçû, ez bi helmixa xwe germ bûm û çav li min nerm bûn. Tenê ji axzê nigan, ji derdawên kulêv da bi derva ra temas hebû. Min dengên ku pêz derdixistin ji nêzik da dibihîstin. Dengê kayîn, bawîşkranan, nirenir, urteurt û zîrgezîrqa keriyek pez, bi refeqeta dengên kêmtîn yên zengilên bi stûyê wî da, li nav bêdengîya şevê belav dibûn. Lê dengê xîrexîrê yê ku wexta kayînê ji didanên pêz yên êxiran derdiket di ser gîştikan ra bû. Xîrêxîra didanên dused pezî, mîna ku bibêjî keriyek merivî bi destaran zexîre dihêrand. Bîhnûbexa çêre û gîyayê hêrdî û ya rix û mîza pêz vî ser fêzê ketibû. Pir neçû, deng kêmbûn û ez ketim xeweke kûr.

Heyder gotina xwe bi dawî kir şûnda, min çend pirs avêtin ber wî û got:

-Heyder, wexta ku we pez berda zevîyê, Hemê Hecî çima li kerê sîwar bû û hetanî ku hun ji zevîyê vidûrketin, ew ji kerê peya nebû? Ya din, çima wî kavir, hetanî ku pez ji zevîyê vidûrket, dawû ber xwe û nehîşt ku bikeve zevîyê? Yek jî, di xortaniya xwe da min jî pir dibihîst ku şivanan pez berdidan zevîyan. Lê va hingê jî

nedikete serî min. Pezên ku şivan li ber yê xelkê bûn û zevîyên ku wan pez berdidan jî yên xelkê bûn. Sebeb çî bû ku şivanan pezên xelkê berdidan zevîyên xelkê?

„Ha, Miço te rind kir bi van pirsan!“ Heydar got û veng pêda çû:

- Siftê ez jî bi berda neçûm. Paşê, min jî hîngê, gava ku em ji zevîyê bidûrketin, va pîrsa avêtibû ber Hemê. Wî ji min ra wer got: “Dibe ku kesek bibîne ku me pez berdaye zevîya Mihê Reşo û me têva bide. Yan jî dibe ku xwedîyê zevîyê siweh û dusiwehê bihên bi ser zevîya xwe ra mès bikin. Hîngê ew ê, sewa ku bizanin kê pez berdaye zevîyê, bipirsin ka pezê kê berve zevîya wan hatiye yan jî li şopa nigên kesên ku pez berdane zevîyê bigerin! Eger ji min şuphe bikin, ew nikanin şopa nig û merasên min bibînin. Sewa vê ez ji kerê dênehatim. Kavir jî min sewa vê deyna ber xwe: Eger xwedanê zevîyê ji min pir şuphe bikin û nig bidin ser min, hîngê ez ê bibêm; bi sondên rû dunyayê we, bi şerda we min yeke tenê berneda zevîyê! Sewa vê min kavir deyna ber xwe û nehîşt ku ew bikeve zevîyê.”

„Şivanan çima pez berdidan zevîyên xelkê? Miço, pîrsa te yek jî ev bû, ne?!“ Heydar got û ev bersiva da:

- Şivanî hîngê karê merivên xizan û destteng bû. Malên qelaw (dewlemend) yên ku xwedîyê keriyên pêz

bûn, şivan radigirtin û heqê wan ji bo şeşmahekê dibirîn. Gava ku ew ji şivên razî nedibûn, şeş mahekê şûnda, wan ew ji kar vidûrdixistin. Şivanan pir caran ji neçarî, bi heqekî pir hendik, ku xwedîyê pêz çi daye, razî dibûn. Lê şivanên ku pez rind diçêrandin û pezî ku ew li ber çê dibû, dikanîn zêde heq bixwazin yan jî xwedîyên pêz heqê wan zêde didan. Ji ber vê, her şivanekî li ber xwe dida ku pezî ew li ber rind biçêrine, pezî wî çê û di ser yên şivanên din ra we. Şivanên bi pezî çê dihatin pesandin, nav û dengên wan belav dibûn. Sewa vê di navbera şivanan da pêşbazîya pezçêrandinê hewû û lowma wan pez berdidan zevîyên xelkê. Dirêj nekim, hîngê mîna niha heqûhiquq tune bûn. Ji xudanpezan pir kêr kes berheq bûn. Li her çar demsalan şivan bi şev û roj li ba pêz û li dîndarê xwedîyê wî bû û pir caran jî bi nanezikê.

Bi van zanîn û hurgilîyên Heyder yên li ser pêz, şivan û şivanîyê ez hekmet mam û şa jî bûm. Sewa vê min ew pesand û got: “Heyder, tu derda newînî û pir bijîn!”

Êvar nêzik bû. Min dil hebû kû rabim, xatirê xwe bixwazim û herim mal. Di wê navberê da Zêwik jî hatibû cem me, ser çardaxê. Wê pir xwast ku ez gaveke din bimêm, israr kir lê ez rûneniştim û rabûm ser nigan. Zêwik jî rabû ser nigan û got: „Miço, de qet

nebe carekê ware, mala me ji hundir da jî bibîne!” Min ew neşikêna. Em çûn hundirê malê. Heyder nehat.

Zêwik mîna rêbereke jêhatî li pêş min diçû. Wê bi şabûnî ez li nav malê, ode bi ode gerandim. Bi heyecan, bi qirika helkişandî wê tiştên nav malê; nîvin, perdeyên sipî û tûl yên bi dirêjîya dîwarên bi pencere, paldankên ku bi pertû-partal û bi balîfên piçûk yên çargoşeyî û bi çînûçirtikan hatibûn xemilandin, mawênîya mezin ya ku li gor ûsila berê bi xalîyên herdê û balîfên berdîwêr hatibû rêxistin, dezgehên aşxaneyê; dolaw, ocaxê bi cereyan, sarinc, makîneya kawşûştinê, dirêjnekim, wê tu hewês û kêmanî vi xwe ra nehîştin, gîşt bi min nimandin. Carna, hetanî ku bi merqe û bihayên wan gihê wê heldida, mîna ku bibêjî ew ê ku wan bifroşê min!

Min ji Zêwikê ra got; „Tu û Heyder tevhev bi xêr tê da rûnin û bextîyar bibin!” Paşê, min xatirê xwe ji wan xwast û ez derketim derva. Min berê xwe da rêya malê dêûbavê.

Devdeve êvarê, rojê li ber ava bû. Bi rê da, ez raste gilûgemar û bermayîyên dewrana modern dihatim. Çi tune wû; tûrik, kodik û şûşeyên naylonî yên cola, fanta, avê û paçên dergûşan li kevîya rê û li derûdoran belav bûbûn. Ne xema kesî bû. Çi heyf e, tûrikên berê yên çêrminî û cawinî û yên ristî û hunandî wekî; parzin, tûrê mêt, tûrê



xwê, heqîv, têr û hewan êdî nemabûn. Tûrik û kodikên naylonî yên bi bed û zîyankar ketibûn şûna wan. Bi van manzereyên gilgamarên naylonî û bi nexemîya xumalîyan, meriv vi ber xwe diket.

Milana berê nemaye, pir tişt hatiye guhêrin. Ez mat dibûm, di hundirê sih salan da, guhêrînên mezin li Milanê çêbûne. Xanîyên wê yên ji kevir û kerpîçan hemahema nemane û yên mayî jî bûne xerewe. Pez, şivan û şivanîya li gor usula berê nemaye, pir pir kêmbûye. Rênçberî êdî bitûn bi hacetên teknîkî dihê kirin. Ker û hesp jî, ji duûsêyekan bêtir, nemane. Kêncaran dengê zirînî û hîrînîya wan ya bi zaravekî zîz li nav gund belav dibû û te ê bigota wan dixwastin ku pê hawara tenêmayîna xwe bigihînin hemcinsên xwe. Heyfa hespên kumêt, şê, qir û yaxiz yên ku peyîzan li meydana pan û fereh ya li jêrî gund serberdayî çerx dibûn. Di xortanîya xwe da, ez bi hemsalîyên xwe va li wan siwar dibûn, bi kêf û şahî me ew dibezandin. Bezandin têrê nake, te ê bigota em

difirîyan û erd di bin pêkolîn û beza hespan da dilerizîya!

Xumalîyên Milanê û wesifên wan jî hatibûn guhêrin. Tu malbatên ku alemanîyên xwe tunin nemane. Alemanîyayî êdî bûye kana dewara xelkê Milanê. Ji Alemanîyên Milanê nivşên dûyemîn û sêyemîn peyda bûne û ew êdî ne tenê karkir in. Li Milanê, çî li nav xumalî û çî li nav alemanîyên wê, hêjmara kesên xwêdî firma, dukan, market û meslêgên din yên çêşîd çêşîd zêde bûye. Hen jî bi armanca bazirganîyê di gomên mezin da, bi awayekî girtî, kerîyên dewêr bi xwedî dikin. Yek jî tomefil (otomobil) pir bûne, hemahema li ber her malekî tomefilek heye. Hejmara tomefilan li bahar û havînan, wexta ku alemanîyên Milanê dihatin tatîlê, duqat û sêqat diwûye. Mêyla milanîyan ya sîyasî jî hatibû guhêrin. Di helbijartinên mixtarî û şaredarîyê da piranîya helbijêran raya xwe didin partîyên kurd. Lê çî heyf e, kurmancîya Milanê derbeyên giran xwarine.

Alemanîya, 01.12.2017

# REFERANDÛM

Seyfî Doğan

Piştî şerê duyemîn, filozofê alimên Theodor Adorno endemê êkolê Frankfûrtê nivîsandi bû;

*”Piştî Auschwitzê helbest nivîsandin barbarî ye!”*

*Piştî erîşa ser Kerkûkê, em dê bèn çî û çî binivîsîn!*

*Em ê çî xwulîyê bi serî xwe kin.*

*Dêstên xwe di ber xwe kin û an jî destên xwe berjor vekin?*

*Piştî erîşa Kerkûkê kilamên şîna teslimîyet e!*

*Piştî erîşa Kerkûkê tirşik xwarin heram e!*

*Em ê rîya xwe û caregerê xwe berdewam kin heta rojê azadîyê.*

Adorno dixwaze bê; helbest, simbolê aşîtiyê, aşqê, rindîyê û biratiyê, mest bûnê, hunerîyê terî bi qiymete û jîyanekê bi qelîte ye. Adorno qehrî ye!. Xeyîdî ye!. Ne bêheq e! Xwestîya ku dîwê li dijî hovîtiya nazîyan derkeve. Mina ku em kurd herdem hêvî dikin lê hercar destboş vedigerin.

Lê li Auschwitze çî bû? Bi mîlyona însan hatin kuştinê. Piranî ji wanan Yahûdî bûn.

*Referandum*

*şilfa zeytûnê ku kurdan dirêja xelkên dîwê kiri bû*

*heft îklîma*

*pênç qita*

*baskên wê gogercîyê xezal parçe parçe kirin*

*barbarên di cembereyên bê kitêb da*

*destên xwe bi xwînê hine kirin*

Dîya min, dema ku li ma dua dikir digot;

”Zarokên xwe ji berîka xwe têr bikin”

Em kurdên rojê zelal û delal bê piştgirtîyên dostên derewin ”Zarokên xwe ji berîka xwe têr bikin”

Referandum, ji bo avakirina welatekî azad gaveka gelek mezin bû. Ew gava bingehê dawîya eşîretan bû. Referandum temelê yekîtiya kurdan bû.

Hêviya me hîng wek berê ye.

## BÎRNEBÛN

### Seyfî Doğan

Heta rojê îro min bi rindi û xwerewî ji bo Bîrnebûnê pir gotin bîstin.

”Bîrnebûn hafiza me yê netewî ya bi nivîs e.”

”Bîrnebûn unîversîteya me ye.”

”Bîrnebûn kanîyeka ku avê xwe havînî sar û zivistanî germ û zelal û zelal diherikê.”

”Bîrnebûn karî kîtêbxana ye, muze ye û arşivê dike.”

”Bîrnebûn penç hîsin me ne.”

”Bîrnebûn sê prensîbên Ahura Mazda ye; *hamata, hakata û varšta*.”

”Bîrnebûn konê bavana ye.”

”Bîrnebûn cêrokeke xweş e”

”Em wek helbestvan, dîrokvan, nivîskar û lêkolînavan, di sayê Bîrnebûne da disîplînê bûnî.” “Me bi kurdî nivîsandin, fikirîn di sayê Bîrnebûnê da hîn kir û hîn jî hîn dibinî”

Tabî rexne jî hene, divê hebin!

”Bîrnebûn ceroka, kilaman, sênax û tevn û teşiya dinivîsinê!”

”Bîrnebûn sîyasetê neka” ”Bîrnebûnê mîsyonê xwe tijî kirîye”

”Bîrnebûn henekan dinivîsîne”

*Bi gavekê deşt pê kir*

*gav bûn saet*

*saet bûn roj*

*roj bûn meh*

*meh bûn sal*

*sal bûn bişt*

Erê bêkemasî Bîrnebûn bîstsal derbas bûna ku pêyda bûyê. Çend nefsbîçûk û xwediyê ar û namûs ji bo ku; kokên nasnamê xwe bikolin xwediyê natewîyê xwe derkevin û mîrasên nasnamê xwe biparêzên û ji nêslên pêşeroj re çîhbîlîn jîyane xwe yê îro fehmbikin û pêşta bibin hatin ba hevdu berî ku Bîrnebûn derkeve heqat, dîrok, cêrok, gotin, kilam, helbest û qatê bi devokî bûn hafize bi devokî

ji bîr dibe an jî tê guherandin. Şop ajotin durist nebe ji bo wê jî lekolînên bi zehmet in ji bo wê ji berdewamî û peşda birin cê nedibû ji bo kurdên Anatolîyê Navin, Bîrnebûn bû gavakê gelek mezin! Bîrnebûn diparêze, peşta dibe, hîn dike û berheman peyda dike.

Bîrnebûn bûyê bingehîya lekolinên ku cîwanên kurdên Anatolîyê Navîn û yên Kurdistanê ku li mekteban dixwînin ez û Nuhê Hecî Malê Herşid li Kulekê li qehvekê rûniştî bûn ku du cîvanên ji wan gundên me telefon kirin û gotin; emê dixazîn we bibînin hatin ku kec û xortek e. Wana gotin; em li unîversîtê dixwînin û ji bo lekolîna li ser erf û adetên me ji me re alikarîyê bikin û lê zêde kirin, emê Bîrnebûnê wek kanîstankekê bi kardinîni û jê îlham digirinî.



## REV

### *Seyfî Doğan*

gulên berberoj  
ê xwe wek keçikên delal û bermirad  
dayî bûn berroj  
min xwe da sîyê darekê  
û pişta xwe da erdê  
ne dema sîsyfos e  
ezman ji min re bû rîya teze  
bîhne jîyanê ji kûrê da dihat  
di bin perikên min da avên okyanusan  
lê geriyam wek dînekî  
sirên mirî min dîtî serî sibê  
jîyan hebû li dawîyê behran  
gulên berberoj di min re kanîn  
ezman ez dawet kirim  
hundirê min vekirî

çûm ba ewrên sipî  
mîna magîkî haoma vexwarî  
serxweş bûm  
ax kelîya  
ez jî kelîyam  
dikelî  
dikelî  
û xwîna min dikelî  
ferq nîne  
çi bihar çi havîn  
çi payîz çi zivistan  
rêvî derbas bûn ref bi ref  
li ber her refekê yek serkêşek  
min hertişt li paş xwe cî hişt  
û xwe da ser rêyeka bi serî xwe

# Kilamên me

## Mem Xelîkan

Her kilam û stranekê hekateke xwe heye. Hekat û naverokên wanan, ji êş û janan barkirî ne. Kevre Mezela jî, kila-meke li doralîyên me bi êş û dilşewatîya xwe bi nav û deng e. Kilameke, Xelikên Qerecdaxê, Xelikên Jor ( Konya - Kulu ) e. Ji alîyê Zêwa Çûç ( Zêwa bi Çûk ) ve hatiye gotin. Li ser mêr (hevjîn) ê xwe straye.

Mihemedê Hecê, malmezinê Mala Hecê ye. Li gundên me, mezinên gundan hene. Ewna, li her tiştekî li pêşîya gund in. Di nav heyeta gundan da ne. (*Ihtiyar heyetî*) Li şayîyekê, li xerawîyekê, li dol - dawetan jî li şînen gundan xwe didin pêşîya gund, mêvanan pêşwazî dikin û bi rê dikin. Mihemedê Hecê jî, yek ji wan mezinên gundê Xelîkan wû. Li gundên doralîya, baş dihat naskirin. Meriyekî zana, bi mêvanên pirr, bi heval û hev-rêyên pirr wû. Ji bo ku kurikên wî nebûne sê caran zewicîye. Zêwa Çûç, jina vî ya siftê û dotmama wî ye.

Mehmikê Malê Hecê, lavikê Mihemedî mezin e. Di lîsê de xwendekar e. Mihemed, ji bo daweta Mehmikê, ku dergîsta Mehmikê bike bûk, bûka xwe biderxe, ji gundên doralî çikas nasên xwe hene, cîran û hevalên xwe giştika dawet dike. Dem havîn e. Rojê germ, dûv nivro va biraqa xwe têhil-

didin. Ber mala Hecê, şên û şahî dest bê dike. Keç û xortên gund, bi çaralîya govendê digerinîne. Girme girma dolê û dengê zirnê bi dinê da ye. Mihemed, li dîwana mêvanan dawestîye û îkramê wanan dikê. Ew şên û şayîya çar- pênc saeta dajo. Pirr nare, ber êvarê, ji nişka ve, wek brûskêkê, datiya qirîza dil bi Mihemedê Hecê digire. Xu li enîyê dikeve, destê xwe dide sîngê xwe û ji pê de gêrdibe. Wê şahî û dîlanê, di nîvi de berdide û dihere rehmêtê. Dol, dawet û ew şênayîya di nîvi de dimê û vedimire. Şûna şênayî û dîlanê, mirina Mihemed wek ewrekî reş dadigire ser Mala Hecê. Bi ser wê mirina giran de, Mala Hecê dol û daweta xwe dadiwestînin, li şîna Mihemed rûdinin. Mêvanên hatinî dawetê, dibin azcîyê Mihemed.

Mala Hecê, du- sê mehan şîna xwe dikin û azcîyên xwe birêdikin şûva bûka xwe biderdixin. Zêwa Çûç, bi ser wê mirina giran û bi şewat de kilama *Kevre Mezela* distirê. Kilama xwe de, erf û edetên kurdan tîne bîra meriya û yên ew nedane berçavan rexne dike. Gilî û gazinên xwe jî tîne ziman.

Li ba kurdan edet e, li mirinek bi şewat meriyên mirî, kincên xwe vajo dikin û kinca bervajo li xwe dikin. Li wê mirinê, mêvanên hatine dawetê jî xemilên xwe ji xwe kirin û kincên xwe

bervajo li xwe kirin. Li dawet û şînan, kîjan jin xwarinên xwaş dikelînin, ewna yê werin nanî dolê an jî nanî şînê bikelînin. Hewa Mehmo û Zexa Sêdle, du jin ji wana ne.

Zêwa Mehmûd û Fata Hesê jî, wê demê du keçikên xort û xwarzîyên Mala Hecê ne.

Erf û edeteke kurdan jî, cîranek mir, cîranên vî yê dest ji kar û berê xwe berdîn. Dol û dawetên xwe di nîvi de bihelin. Dûv ve, çend rojan şûva misada xwe bistînin û karê xwe bikin. Ji bo wê Zêw gilî û gazinan ji Heckuş û Mala Ewê dikê.

## KEVRE MEZELA

Kevre mezela reş e gir in  
Ne bar tewin ne têwirin  
Gundo ji me ecavîya bigirin  
Nanê me ji dolê re kirî  
Me pê azcîyê xwe ve rêkirin

Dilê min deşta Heranê  
Xopan bive brûska li rû baranê  
Ji maleke bi danzde meriya  
Li horta dolê bavê Mehmikê da nîşanê  
Li wî banî li wî banî  
Min korocaxê pê nizanî  
Bi sê jina bûkek anî  
Heqsizî heqsizo te çima paşi nanî

Van çîyana çîya sêvandin  
Êmilkê bavî Mehmikê dûw gerandin  
Berebcîyê bûkê hatin  
Bi kincê vajo me bi şûva şandin

Qerecdax bişewite a bi dar e  
Min wenda kir bavê Mehmikê yî kibar e  
Ma bavî Mehmikê were  
Bêraqa bûkê yê hîne li dar e

Berfa romê ji me re mane ye  
Pêşîya goristanê Qerecdaxê  
Şûna danê bavê me ye  
Xeta Mehmikê di lîsê de ma ye  
Dosya Mehmikê di çênte de ye

Kanîya jêri bi tûn av e  
Min korocaxê di ser re rana gav e  
Kewşçîya şûna xanîya belavkirin  
Ez çûm bavê Mehmikê tune li nav e  
Ê gîştika girê de bi benekî xav e

Çingî sûr e çingî sûr e  
Alîmê camî ye jê dibarê gul û nûr e  
Gundo bûka ku min derxistî  
Rênêxist jê ra secdê xêzûr e

Germa havînê  
Didê qonce rêçberê Kanîya Osmên dihêlinê  
Mala Ewê li dolê xistîyê  
Heckuş li qûrnê xistîyê  
Berdane kezewa min çifte qurşunê

Dolcîya rawe li dolê xîne  
Mala bavê min hêlek dole hêlek şîn e  
Ma Zêwa Mêhmûd û Fata Hesê govendê bikişîne  
Zexa Sêdle û Hewa Mehmo nanî dolê bikelîne

Reşo rawe arebê qoşke  
Bûkê min biderxîne  
Bewe li tirbê vî heqszî bikelivîne  
Arî kezewê min vemirîne

ZÊWA ÇÛÇ  
(Xelikên Jor, Kulu- Qerecdax)

# PÊKENOK

## Hizir Akbîna

### KEÇİKA XİZAN

Keçikeka xizan li cem birayê xwe Hamo dima. Ji birayê xwe Hamo jî gelek hezdikirîye, heyî tunebûna xwe jî Mistafayê biraye xwe bûye.

Rojeka ji rojan biraye xwe Hamo nexwaş dibe û derde wî jî gelek giran e... Keçika xizan herroj nimej dike û ji bo birayê xwe dua dike û dibêje:

-Xwedêo! Xwedêo! tu derdê birayê min ji ser wî rakî, bidî ser min.

Demekê dua dika, tîr (jan) dikeve serê wê, ditirse û dibêje:

-We we we! Ew çi şor e! Xwedê tu weng qebl dikî. Jina wî heye, xwesîya wî heye, bide sere wan. Na na na! ez di wê de tune me, ez keçikeka xizan im...

### KET - MÎR

Di demên berê da (borîde) digotîne di navberê xwerinê da dengirin (axifin) bi guneh e. Lê mixabin dema xwerin destpê dikir şoren xweş jî destpê dikirine.

Carna kesen hişyar dixwestin bi hin kesan henekên xwe bikin û bi wan kesan xwarinê nadin xwarin. Ji wan kesen yek jî Haso bûye ji ber ku Haso xwarinê nexwe axaftin dest pê dike û dipirsin.

-Haso bavê te çawa mir?

Haso ji bavê xwe jî gelek hez dikirîye. Kesereka kuuur dikşîne û dest bi axaftine dike...

-Bavê min?

-Belê!

-Li ser xanî şorax belav dikir. Oda yekemîn xelas kir.

- Eeeee!

Derbasî maunîye bû ev der jî xelas kir.

Haso kevçik sewar dixwe xwarin di qirikê Haso de giran dibin,

- Derbasî sivîga bû.

-Eeeee!

Haso kevçik xoşav jî xwerîye, dibîne ku xwerin edi hindik hindik xelas dibe lê, Haso ji xwerinê tiştê fehm nake.

Hevalên Haso dibêjin;

-Neyse, em ê rojek din berdevam bikin.

Rojek din disa tên ser sifrê û dîsa ji Haso dipirsin.

-Eeeee!!! Paşê çi bû Haso?

Haso fikirî du roj in birçî ye zanî ku ji bo xwerinê dikin. Wûsa lê nêrî û tilîya xwe hekand. Bi hêrs got;

-Bavê min ket mir! Ket mir!



# Kalê min Cafarê Hine

## Memê Mala Hine

Kalê min tim wiha di bîra min de maye: Mirovekî kal, kumikekî duşerîtî û xwar, saqoyekî dirêj, şalekî fireh ku dêlingên wî di nav goreyan de ye û cotek qundireyên kevn... Dema ku kalê min wefat kir ez neh salî bûm, lê dîsa jî ew tu car jî bîra min neçûye. Bi taybetî jî dema ku ew bi min re şa dibû jî min re bi kurmanciya aliyê me digot "keko". Di çanda kurdî de jî bo rêzgirtinê "keko" tê gotin. Kalê min jî neviyên xwe re "keko" digot û jî wan re hurmetkar bû. Piştî jî min qet nebihîst ku kalek jî neviyê xwe re bibê "keko". Ew mirovê ku di zarotiya xwe de sêwî maye û gelek zehmetî kişandiye, resmê mirovekî dilovan di bîra neviyên xwe de hiştiye. Di vê nivîsê de ez ê behsa kalê xwe bikim. Jiyana wî çîrokek jî hezar çîrokên kurdên Anatolyayê ye û dibe ku hin aliyên kurdên Anatolyayê ronî bike.

Kalê min Cafarê Hine di sala 1910'an de li gundê Yuzukbaşiyê hatiye dinyayê. Tê gotin ku di destpêka sedsala 19an de bavê kalê min Hecî Mîla bi tevî birayê xwe û çend malên din ên eşîra Canbegan li vê derê bi cih bûne. Gundê ku di çîroka Qamişê Qul de derbas dibe ev gund e. Gundê me bi

qamişê xwe navdar e. Ji gelek gundên derûdorê jî bo ku qamiş bibirin û daynin ser xaniyên xwe dihatin gundê me. Gundê me heta nîveka sedsala 20'an girêdayî Akşehîra Konyayê bûye. Lêbelê piştî gund bi Polathîsara (Polatli) Enqerê ve hatiye girêdan. Gund 75 kîlometre li başûrê Polatliyê û 40 kîlometre jî li bakurê rojhilata Yunakê ye. Şênîyên gund jî eşîra Canbegan in. Pênc bira û xwişkeke kalê min hebûne: Hesko, Mamîk, Mewlud, Îbîş -ji ber ku yekî ziman peltek bûye jê re gotine Lal-, Silik û Elê. Ji birayan Mamîk û Mewlud hîn zarok bûne, ji ber nexoşiyê mirine. Kalê min zarokê herî biçûk ê malê bûye. Navê bavê kalê min Elî bûye. Lê ji ber ku porê wî sor bûye, jê re Hine hatiye gotin û her wisa jî ji bo malbata wî jî gotine Mala Hine.

Hine digel ku pênc zarên wî hebûne di şerê yekem ê cîhanê de li Çanakkaleyê di artêşa Osmanî de eskerî kiriye û di dema şer de bi nexweşiyê giran ketiye. Ji ber vê nexweşiyê ew şandine mala xwe. Hine di ser bajaroka Gunyuzu ya Eskîşehîrê ber bi gund hatiye. Beriya ku bigihîje gund, ber êvarê gihîştîye goma birayê xwe Husên. Goma birayê kalê min çend kîlometre ji

gund dūr bûye. Birayê wî nehiştiye ku ew wê êvarê here gund û xwestiye wê şevê Hine li mala wî bimîne û roja din here gund. Hine wê şevê li wir maye, lêbelê di derengiya şevê de bi gotina aliyê me dinya guherandiye, ango we-fat kiriye. Hine li wê derê defn kirine. Gora wî hîn jî li wê derê ye.

Piştî ku Hine dimire pênc zarên wî sêwî dimînin. Piştî şerê yekem ê cihanê artêşa Yewnan ji Eskîshehîrê derbas di-be û ber bi Polatî û Haymanayê tê. Artêşa Kemalîstan jî hêzên xwe li van deran kom dike û li wê navçeyê xortên Kurdan jî dike esker. Artêşa Kemalîst birayê mezin ê kalê min, Hesko jî dike esker. Ew, di şerê artêşa Yewnan û Kemalîstan de cih digire û tê kuştin. Li gor ku kal û pîrên gundê me gotine, eger Hesko sax bimaya, ew ê xweyî li xwişk û birayên xwe derketa û nehišta ew zor û zehmetî bikîşînin.

Artêşa Yewnan hatiye heta gundê Uzunbegê ku cîranê gundê me ye. Wê demê Uzunbeg ser bi Polatliyê bûye û gundê me jî ser bi Akşehira Konyayê bûye. Li gor peymanî dewletên serkeftî yên şerê yekem ê cihanê Konya ketibû para Îtalyayê. Li gor ku tê gotin, ji ber vê jî leşkerên Yewnan li gundê me bi cih nebûne, lê çend caran avêtine ser gundê me û bi zorê ji gund zexîre û pêwîstiyên din girtine û birine. Leşkerên Yewnan her wiha avêtine ser mala kalê min jî. Leşkerên Yewnan xwestiyê dest daynin

ser eyarê rûnê ku li ba me jê re avircan dibêjin. Lê kalê min xwe avêtiye ser eyarê rûnê. Leşkerê Yewnan qesetûreya xwe derxistiye û xwestiye li kalê min bixe. Lê diya kalê min xwe avêtiye ser kalê min û ew ji leşkeran dūr xistiye û ji kalê min pirsîye, tu çi dikî? Kalê min gotiye, ku penîrê me jî bibin ma em ê çi bixwin? Malbat jixwe feqîr bûye û tiştên wan ên xwarinê kêr bûne û bi ser de jî leşkerên Yewnan tiştên heyî ji wan stendine û rewşa wan yekcar xirab bûye.


Artêşa Yewnan li gund sê gundiyên me yên ku mezinên gund bûne girtine û birine. Yek ji wan kalê diya min Hecêsan bûye. Heta niha jî aqûbeta wan nayê zanîn. Wisa dixuyê ku leşkerên Yewnan ew kuştine. Li gor ku tê gotin gundiyên me alîkariya artêşa Kemalîstan kiriye û qemyoneke artêşa Yewnan şewitandine. Heta tê gotin ku ew pîreya li gundê me, li ser çemê gundê me hatiye danîn, bi şaseya wê qemyonê hatiye çekirin. Ji ber vê yekê jî artêşa Yewnan bi kuştina kalê diya min û du gundiyên me yên din tola xwe ji gundiyên me hilaniye.

Kalê min û xwişk û birayên wî di zarotiyê de gelek zehmetî kişandine. Apê wan alîkariye wan kiriye. Birayên mezin ê kalê min Lol û Silik herçiqas neçûbin medreseyê jî, karîne kalê min bişînin medreseyê. Ji ber vê jî kalê min bi tîpên erebî û latînî dizanî. Kalê min gelek giringî dida tiştên nivîskî. Tê bîra min, dema ku wî li nav kolanên gund

kaxezeke nivîskî bidîta hema hildigirt û li malê ew vedişart.

Kalê min li gor wê demê dereng di-zewice. Di dema wî de xortek dema ku bigihîje 17 an jî 18 salî, malbata wî ew dizewicand. Lêbelê kalê min di sîh saliya xwe de zewiciye. Li gor ku ez ji bavê xwe û metên xwe hîn bûm du sedemên dereng zewicîna kalê min hene. Sedema ewil hejariya malbatê ye û sedema du-duyan jî keça ku kalê min jê hez kiriye nedane wî. Kalê min hez ji keça pismamê xwe Eysîkê kiriye. Li gor ku tê gotin Eysîk jî ji kalê min hez kiriye û vê hezkirina xwe bi awayekî nîşan daye. Eysîk rojekê sibê zû ji ber kar û barên malê, hatiye mala apê bavê xwe, ango mala kalê min. Kalê min jî li mayne<sup>1</sup>yê li ser doşegê\* razabûye. Eysîkê bi zanebûne pêl lingê kalê min ê raketî kiriye. Kalê min vecinî-qîye, ji xew rabûye û ji Eysîkê re gotiyê, keçê te pêl nigê<sup>2</sup> min kir! Eysê jî bi ken wiha gotiyê: "Ez ê hîn piîiir pêl nigê te bikim."

Belê, Eysîkê bi wê "piîiir" a dirêj daxwaza dilê xwe nîşan daye û gelek maneyên hezkirinê lê bar kiriye. Kalê min jî ji diya xwe û birayên xwe xwestiye ku herin Eysîkê jê re bixwazin. Wê demê bavê Eysîkê, ango pismamê kalê min wefat kiriye. Jina pismamê kalê min keça xwe nedaye wî û gotiyê ku ez keça xwe nadim yekî sêwî û feqîr. Kalê min li



ser Eysîkê kilam gotiye. Hin kesan jî ew kilam ji ber kiriye. Lêbelê ji tirs a pîrika min ku kalê min di sîh saliya xwe de pê re zewicîye kes newêriye wê kilamê bibêje. Niha ew kilam hatiye ji bîrkirin.

Bavê min ê rehmêtî tim behsa wê yekê dikir ku bavê xwe gelek ji Eysîkê hez kiriye, lê çi mixabin nekariye bi mirazê xwe şa be. Divê ez li vir behsa wê yekê bikim ku bavê min qet ji zar û neviyên Eysîkê hez nedikir û bi awayekî jî vê hêrsbûna xwe nîşan dida. Tu yê bêjî qey kurên Eysîkê sûcdar in. Bavê min tim digot, bavê min heta mirina xwe vê evîna xwe di dilê xwe de parastiye.

Kalê min di sala 1930'an de di dema serhildana Agirî de li Sêrtê eskerî kiriye. Ji ber vê jî ew bi kurmanciya ku li devera Sêrtê dihat qisekirin dizanî. Wî

<sup>1</sup> Mayne li aliyê me ji bo wê odeya mezin a di navbera odeyan de ye tê gotin. Ango salon e û dibe ku ji lêkera

<sup>2</sup> Ling

demekê li Kurdistanê, li ber girtîgehekê leşkerî kiriye û wê demê hin serhilderên Kurd jî di girtîgehê de bûne.

Mîna ku min berê got, kalê min di sîh saliya xwe de dizewice. Ji gundekî cînar Deloyê ji kalê min re dixwazin. Kalê min çiqas yekî sernerm be, pîrika min Delo jî ewqas serhişk û wêrek bû. Ne tenê jin, mêr jî ji pîrika min ditirsyan. Bi min wisa tê ku kalê min jî ji pîrika min ditirsiya. Piştî ku diya min bûye bûk, kalê min, pîrika min, diya min û meta min a mezin bi ereba hespan çûne hirî ji bo daweta meta min bişon. Cihê şûstina hirî çend kîlometre dûrî gundê me ye. Dema ku di rê de diçin, ji hêla din re erebeyeke din a hespan li rastî wan hatiye. Divê yek ji erebeyan ji derkeve û rê bide erebeya din. Lêbelê derketina ji rê hinek zehmet e. Lewre rê ji ber çûn û hatine di kortê de maye. Yê ku erebeya din diajo, yekî biyanî bûye. Kalê min li benda wî maye ku ji rê derkeve da ku ew herin. Lêbelê zilam jî xwestiye ku kalê min ji rê derkeve û rê bide wî. Kalê min dema ku erebê ji rê derxe pîrika min jê re gotiye bila ewê din ji rê derkeve. Mêrik gotinên pîrika min bihistiye û ji pîrika min re wiha gotiye: "Jinik! Jinik! Ji min re dibêjin şeş Qelem. De ji rê derkevin!" Lêbelê pîrika min bi hêrs ji mêrik re wiha bersiv daye: "Ca lê! Tu şeş Qelem bî, ez jî Heft Qelem im. De ji rê derkeve here!" Piştî vê gotina

pîrika min, şeş Qelem ji rê derketiye û rê daye wan.

Jiyana malbata kalê min gelek zehmet bûye. Ji derfetên serdemê gelek dûr bûne. Bavê min ê rehmetî gelek behsa wê hejarî û paşdemayîne dikir. Ji bo ku vê rewşê nîşan bide wiha qala serpêhatiyeke xwe dikir. Di dawiya salên 1940'î de dema ku bavê min hîn zarok bûye mirovekî me çûye Akşehîrê û dema ku vedigere gund ji kalê min re ocaxa gazê, çay û şekir anîne. Wê demê li gundê me çay tenê li mala dewlemendan dihat çêkirin. Bêguman ji bo çêkirina çayê çaydana wan jî tune. Ji bo ku çayê çê kin, pîrika min beroşekê tîne. Mirovê me yê ku ji bajêr tişt anîne û kalê min ocaxa gazê vêxistine, pîrika min jî bi tevî avê çay û şekir xistiye nav beroşê û daniye ser êgir. Piştî ku çay keliyaye, çay xistine tasan û bi vî awayî çay vexwarine. Kalê min dema ku qul-teke çayê vexwariye gotiye: "Ox, çi xweş e!" Belê, ew çay bi kalê min gelek xweş hatiye û tu car dev ji çayê bernade. Lewre tê bîra min, li mala kalê min çay tu car kêr nedibû. Lêbelê ne di nav beroşê de, di çaydanê de...

Kalê min di destpêka salên 1940'î de zewiciye û sê kur û çar keçên wî bûne. Zarokê wî yê mezin bavê min e û kalê min navê kalê xwe û birayê xwe li bavê min kiriye: Mamik. Zarokê wî yê herî biçûk jî meta min Şadiye ye ku dema ku kalê min 53 salî bûye meta

min Şadiye hatiye dinyayê. Tê bîra min pîrik, met û apên min bi dengêkî bilind bi kalê min re xeber dida. Bi min wisa dihat qey ew qet jê re hurmet nîşan nadin û loma bi dengêkî bilind bi wî re deng dikin. Lê paşê ez hîn bûm ku di salên xwe yên dawî de guhê kalê min giran bûye, loma pîrik, met û apên min bi dengêkî bilind pê re deng kiriye.

Çend sal berê ez û du metên min li mala diya min rûniştibûn û di nav axaftina min de navê Keremê Seyad derbas bû. Çawa ku ji devê min navê Keremê Seyad derket, herdu metên min bi yek deng wiha got û paşê bû hîqe hîqe wan: Yêrewan xeber dide guhdarêd ezîz... Ez Keremê Seyad." Ez gelek şaş mabûm. Ma ew herdu metên min ên ku li gundekî kurdên Anatolyayê mezin bûbûn wê çawa ji Radyoya Yêrewanê û Keremê Seyad haydar bûna? Lêbelê wê rojê ez hîn bûm ku kalê min tim Radyoya Yêrewanê guhdarî kiriye û ji ber vê jî zarokên malê gotinên her carê yên Keremê Seyad hîn bûne. Wê rojê ez hîn bûm ku dengê Radyoya Yêrewanê ku ghiştibû gelek deverên Kurdistanê, her wiha ghiştiye Anatolyayê û mala kalê min, li mala kalê min dengê Aslıka Qadir, Zafîna Şakir, Şeroyê Biro, Şebabê Egîd û yên din deng vedaye.

Kalê min di sala 1983an de bi nexweşiyê şerpençeyê ket, çend mehan li nexweşxaneyê û piştê jî li mala me

ma. Çend caran emeliyat bû. Lê wî tu car nedixwest emeliyat be û tim ji bavê min re digot, min bibe gund û li gund, li warê bav û kalên xwe bimrim. Bavê min jî nedihîşt. Kalê min tim digot, min bêriya gund û mala xwe kiriye, min bibin ez ê li wir nefesa xwe ya dawîn bidim. Di meha sibatê ya sala 1984an de em bi tevî kalê min çûn gund. Pîrik û meta min a biçûk ji kalê min pirsîn ka dilê wî diçe çi da ku jê re çê kin. Kalê min xwarina toqlî<sup>3</sup> xwest. Em zarok çûn di nav zeviyan de me toqlî berhev kir. Wê êvarê li mala kalê min şîva toqlî jî hatibû çêkirin û kalê min bi tevî malbatê şîv xar. Kalê min kêfxweş bû, li gundê xwe bû, bi tevî jina xwe, keç û kur û nêviyên xwe toqlî xwaribû. Piştî xwarinê zû raza. Em zarok jî pir westiyabûn û em jî zû razan. Nîvê şevê ez bi girîna meta xwe ji xew şiyar bûm. Kalê min miribû...

Belê wê şevê ew mirovê ku di zarotiya xwe de bi mirina bavê xwe sêwî mabû û di xortaniya xwe de negihîştibû evîndara xwe ghiştibû dawîya jiyana xwe. Mirina wî ji bo malbatê gelek giran bû. Lê dibe ku ji bo kalê min mirin, tişteki ewqas giran nebûbe. Lewre gora kalê min li kêleka gora evîndara xwe Eysîkê hate danîn. Mîna ku bavê min ê rehmetî digot, herçiqas di vê dinyayê de ew negihîştibe evîndara xwe jî ew ê piştî mirina xwe bigihîje wê û bi miraza xwa şa be.

<sup>3</sup> Giyayek e ku di meha sibatê de derdikeve. Mîna îspînaxê xwarina wê çê dibe.

# BÊDENGÎ

bêdengî  
jankesereke bêhempa ye  
lêdaneke kujer e  
hêrsa demsalên têkçûyî ye  
hêviyên li ber pêlan berbabûyî ne

\*\*

bêdengî  
birîna xençereke tûj e  
qêrîna zarokên bêxwedî ne  
raperîna hestên kor in  
kutekuta tirsê dilê lertzok e  
helbesta ji qudûm de ketî ye

\*\*

bêdengî  
jiyaneke li nav mij û dûmanê ye  
xatirxwestina ji rengbiharê ye  
rêwîtiya ber bi rêyeke bêveger e  
li nav kolanên qelebalix tenêtî ye

\*\*

bêdengî  
wîçewîça beytikek sêwîmayî ye  
rondikên keç û xortên çavbelek e  
ziwabûna lêvên qelîştî ye  
poşmaniya hatina dinyaya virek e

\*\*

bêdengî  
kaniya xeyalên miçiqî ye  
agirpêta dilê evîndarên bêderman e  
ronahiya çira odeyeke vemirî ye  
awaza straneke kezêberitî ye

\*\*

bêdengî  
lorîna bilûra şivanekî evîndar e  
axîn û nalîna welatekî bindest e  
payîna mirineke bêwext e  
dengvedena goristaneke bênav e

\*\*

bêdengî  
şadiyên bi rîsê xeman hatî hûnandin e  
serî rakirina dijberiya hîlebaza ye  
êşkenceya zîndanên reştarî ye  
xweşbîniya di xwe de fetîsî ye

\*\*

bêdengî  
hesreta rûkeneke bedew e  
qedera bi kirasê xerîbiyê hatî pêçan e  
westîbûna şev û rojên bêhteng e  
por spîkirina temenê ciwan e

\*\*

bêdengî  
darbesta cendekê bêkefen e  
îskeîska stêrkek xeyidî ye  
bedena li havîngehan cemidî ye  
bersiva xaçepirseke nependî ye

\*\*

bêdengî  
silava dostên ne ji dil e  
feryad û fixana bilbile lal e  
hezkirin û bêrîkirina dil hatî girtin e  
stûxwariya dara serkeftinê ye

\*\*

bêdengî  
bêbextiya xiyaneta navxweyî ye  
bêçaretîya hawara dayîkek Şengalê ye  
şeqama li rûyê zimandirêja ye  
kamilbûna mirovên têgihîştî ye

Xizan Şîlan  
Stockholm, 2017-11-27

# Biwêjên ji kurmancîya Anatolyayê

## Mistoyê Heco

### KURTE

Yek ji behrên ku zimên dixemilîne û bi gencîneya xwe gewdeya zimên şên dike, biwêj in. Biwêj hêmayên dewlemendîya kelepûrê ne. Zimanê kurdî ji aliyê biwêjan ve zimanekî dewlemend e. Her çî qes erdnîgarî û parçebûna di navbera çar dewletan de kurd ji hev bi dûr xistibin jî, wek gelek tiştên din ên kurdewarî, zimanê kurdî û di bin gewdeya zimanê kurdî de jî şaxa biwêjan, bi saya kelepûra dewlemend xwe heta îro parastîye û li ser pîyan maye. Di vê xebatê de sê berhemên sêwî, yên ji xaka Kurdistanê dûr, li deşta Anatolyayê şînbûyî wek nimûne hatin hilbijartin. Di çarçoveya van berheman de hewl hatiye dayîn ji bo ku bê nimandin ka piştî mişexta bi sedan salan, li xerîbîyê nimûneyên biwêjan di van berheman de çawa derbas dibin.

**Peyvên sereke:** Zimanê kurdî, biwêjên herêmî, Anatoliya, Kurdistan.

### Destpêk

Kurdên Anatolyayê ji ber sedemên cûrbicûr ev sedan sal in ji Kurdistanê dûr, di deşta Anatolyayê de, bi pîranî li derdora Tûz Golî (Gola Xwê) hatine bicihkirin. Her çî qes ji welêt dûr, di nav dorpêçkirina gund û bajarên tirkî de bin jî karîne heta îro çanda xwe, zimanê xwe biparêzin. Li herêmê zaravayên kurmancî, kirmanckî û kelhurî (şêxbizîni) tên axaftin. Lêbilem ev yek heta van salên dawîn bi devkî maye. Ji aliyê nivîskî ve tu berhem derneketine. Yekem car di sala 1965an de Mille Rehîmê Yunaxî hen qesîdeyên xwe wek rîsale di berhema xwe ya Yusuf û Zeliyayê de berhev kiriye û ev berhem bi tîpên erebî hatiye çapkirin. Hen qesîdeyên Mille Rehîm jî di qeydên bandan de hatine berhevkirin.<sup>1</sup> Ji zivistana sala 1997an bi vir de Kovara Bîrnebûnê<sup>2</sup> li Ewropayê bêyî navber derdikeve. Di van salên dawîn de çend nimûneyên pexşan û helbestan jî hatine dayîn.

<sup>1</sup> Eli Çiftçi: "Mille Rehîmê rehmetî ji gundê Sorika ya giredahiya navçeya Yunaxê ye. Ji ber ku wî li medreseyên kurdî ders dîtîye, ew bi tîpên latînî baş fêr nebûye. Beyîten xwe yê sîfte hemû bi kurmancî û bi tîpên erebî nivîsiye."

<https://www.youtube.com/watch?v=BFfPaeAX5pw>  
<https://www.youtube.com/watch?v=TmvnH9pDrS8>  
[https://www.youtube.com/watch?v=sf\\_Nm30MwgE](https://www.youtube.com/watch?v=sf_Nm30MwgE)  
<https://www.youtube.com/watch?v=Rfg9roqUrz4>  
<https://www.youtube.com/watch?v=dk0py1RtWTO>

<sup>2</sup> Kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên Anatolyayê. Hejmara yekem li Elmanyayê (Zivistan 1997) derket, hejmarên din li Swêdê dertên.

## Armanc û rêbaz

Vê xebatê armanc ew e ku destnîşan bike ka berhemên ku hatine hilbijartin di wan de biwêjên herêmî bi çi awayî cih girtine. Armanceke vê xebatê jî ew e ku ji bo berhevkirina biwêjên herêma Anatolyayê bibe çavîyek. Ji ber ku li herêmê nimûneyên nivîskî, çi pexşan çi nezm zêde tune ne û heta niha xebateke wiya, jêderka xwe ji wêjeya nivîskî digre nehatiye weşandin. Ji bo van armancan; romana Şoreş Reşî, romana Muzaffer Ozgur û pirtûka kurteçîrokên a Nuh Ateş wek nimûne hatine hilbijartin û her yek ji wan bi baldarî hatiye xwendin. Di dema xwendinê de tiştên ji bo vê xebatê pêwîst not hatine girtin. Di xebatê de bi tenê biwêjên herêmî û yên li herêmê pir tîn bikaranîn, wateya biwêjê û hevoka ku biwêjê tê de derbas dibe, di bin sernavên pirtûkan de yek bi yek hatine nivîsîn. Rêbazeke alfabetîk nehatiye bikaranîn.

## JI ROMANA “HECO”

**Serî hatiye porkirin:** Meseleyeke hatiye bincilkirin.

“Di dîroka me de, bûyera qehremanê vê romanê *Hecî Bixurcî (Heco)*, bûyereke ku serî hatiye porkirin, kesî nexwastîye veke û binivîsîne.”

**Sing li xwe tûj kirin:** Xwe qure kirin.

“*Lord dîsa lingên xwe avêtin ser hev, singê xwe tûj kir, di bin simbêlan re dîkenî û li çavên Rauf beg dinêrî.*”

**Bi şijûyeke mezin (tişteke kirin):**

(gava tişteke bike) Xwe qure kirin.

“*Lord Calthorpe’ a qehwa hatî ber, bi serê tilîyên xwe fîncan heyna, hêdî bir ser levên xwe û bi şijûyeke mezin jê qûltike biçûk jê vexwar.*”

**Heta heştîyên xwe hatin mîtin:** Di

deşt de tişt neman; bêwizeyî; hemû renca xwe hatiye xwarin.

“*Li gundên kurdan yê li navenda Anadolê ji gundî di bin zordariya van axayên ku piştî xwe dabûn dewletê de heta heştîyên xwe dihatin mîtin û di bin deştîlatdariya wan de dinalîn.*”

**Di nava çav girtin û vekirinekê de:** Ji

nişka ve, di demeke kin de.

“*Di nava çav girtin û girtinekê de kesek li nava kolanên gund nemabû*”

**Zikdirî dan kesekî:** Yek dexisandin, pelikandin.

“*Yekî ji der de lê mêze bikira, ê bigota ew î zikdiriyê dide malbatê û mirovên li wir.*”

**Ji sed mitroyî de li derziyê xistin:**

Nîşangirî, segvanî.

“*(...) û tê gotin ku ew ji sed mitroyî de li derziyê dixê!*”

**Tengil guhertin:** Awir tirs kirin.

“*Rehetiya wî ya deştîpêkê nemabû, zû bi zû tengilên xwe digûhartin û bi lez got:*”



**Pûrt tijî ba kirin:** Xwe qure kirin.

*“Femandar mîna cûliqê ku pirtikên xwe tijî ba bikî hat li cihê xwe rûnişt( ... )”*

**Berzeqîya li ber şeqa:** Qebraxî, gewadi.

*“Madem dewlet heye, van berzeqên li berşeqa çima narine gawiran dermaxînin?”*

**Ji qawa tijî tala ya vala, ji ya vala tala ya tijî kirin:** Nexş bi nexş fikirî, xal bi xal dan berçavan.

*“Lewra ji qawa tijî talê ya vala, ji ya vala talê ya tijî kiribû û hatibû wê genatê ku êdî ji wî re jiyan li gund nemaye.”*

**Çilhêstirk barandin:** (bi tişteki) pir êşin.

*“Bi wê gotinê re bereber ji herdû çavan çilhêstirk barand û li ser rûyê wê çend şopên hêstirkan mîna ava baranê li ser camê man.”*

**Guh lê rihet bûn:** Rewşa aramiyê.

*“Here eskeriya xwe bike, bila gûhên te jî û yên me jî rihet bibin...”*

**Li kirtika poz xistin:** Rawestandî, sekinandî.

**Bi kincan ve xwarin:** Bê kêf kirin, aciz kirin.

*“Heta yek li kirtikî pozî van nexê, van ê me gîştikan bi kincan ve bixwin.”*

**Ji nava çelgîrekê (de) derneketin:** Di nav meseleyê de derneketin, neçar man, bêgav man.

*“Dihizirî ku bersîveke wî qanî bikî bibîne lê ji nava çelgîrekê dernediket.”*

**Biliv avêtin (bêvil avêtin):**

Helkehelka ji ber westînê.

*“Mihînê biliv davêtin û di nava bilîvan de goştê wê yî sor xûyadikir.”*

**Pişt lê qewî bûn:** Xwe ewle hîs kirin.

*“Berî hertiştî, gerek hinek mirovên ez pê bawer bikim bidîm dora xwe ku îxanetê li min nekin û piştta min qewî be.”*

**Lêv ji hev kişin:** Bişirîn.

*“Bi gotina Bixurcî re rûyê Hemîd geş bû, lêvên wî ji hev kişin, di devê wî de diranên mîna mircanan xûya bûn,”*

**Bi darê zorê çewisandin:** Zordestî lê kirin.

*“Bi wi awayî gelên li Anadol û Kurdiştanê dijîn çavtirsîyayî dikirin û dixwestin daxwazên wan bi darê zorê biçewsînin.”*

**Kêrê dev venedikir:** Devê (yekî) tevde ketin hev.

*“Cîranan hewldan ku hinek av bidinê û bi wê re pipeyivîn lê kêrê jî devê wê venedikir û dîlopek av jî venexar...”*

**Çavên xwe şin kirin:** Bi ziqbûnî nihertin.

*“Çavên xwe şin kirin kokî çavên Eysê û kopala di dest xwe de li erdê xist û pirsî:”*

**Boç kire nava şeqa xwe:** Tirsîn

*“Eskerên ku dest û çok lê dicirifîn boç kiribûn nava şeqa xwe û xwe di çeperan de dikemişandin.”*

**Pêsir li ber poz:** (kesa) gihayî, berbext.

*“Dema bi hespan hatin ber malê keçikeke kin, navpîpan, pêsir li ber poz ji*

dengê wan derxisti tirsi û xwest bireve hundirê malê lê Cema! got:”

**Hundir(ê yekî) qetandin:** Tirsandin.  
“Wee birango te hundirê min qetand!  
Sîwarî din kî ye?”

**Di (e)yarê xwe de tiji:** Laşê ponponî; qelew bûn.  
“Keçika nav zirav a dî yarê xwe de tiji,  
kofiyek bilind dabû serê xwe.”

**Hemerî kirin:** Meşt kirin.  
“Hinar kê nê wê mîna sêvên payizê sor mirov li hember xwe hemerî dikirin...”  
**Sor û pindirkî bûn:** Ji ber hêrsan an jî ji fedîyan sor bûn.  
“Keçika sor û pindirkî bûyî deng nekir. Ji fedîyan rûyên wê mîna soba kix tê de vêdikeve sor bûn û bûn xwîn.”

**Mirûz kire xwe û tengilên xwe guhertin:** Awir tirş bûn/kirin; ji bo tiştên ku naçin xoşa kesekî.  
“Dema qala Yozgatê kir Heco mirûz kire xwe û tengilên xwe guhartin.”

**Boça xwe rizgar kirin:** Ji tişteki xilas bûn.  
“Mixabin, dema boça xwe rizgar kirin ew hemî înkâr kirin û niha jî dixwazin min wek xayinê welat nişan bidin.”

**Bi dilê xweş neçî, bi dilê reş diçî!:** An bi xweşkayî yan jî bi darê zorê.  
“Binêr! Tu bi dilê xweş bi me re neyî, ez ê bi dilê reş te bibim!”

**Di (e)yarê xwe de xiş bûn:** Westîn, betilîn.

“Li nava gund tenê zarok dilîştin, yê din hemî di yarê xwe de xişbibûn...”

**Bi serî lêvan kenîn:** Bişîrin.  
“Bi silavê re tirs a wî kê mî bû û bi serî lêvan kenî.”

**Tijî devê xwe kenîn:** Pirqînî jê çûn, hirehir jê çûn.  
“Heco bi gotinê şivên gelek kêfxweş bû,  
tijî devê xwe kenî û got:”

**Di ser û bin hev re çûn:** Rewşa lezgînbûnê.  
“Xelkê li nava sûkê bi telaşa êvarê mîna mêriyan dî ser û bin hev re diçûn.”

**Dil (ê yekî) qetandin:** Tirsandin.  
“Di nava şeva reş û dulmat de birûskê carna bihêrs lê dixist, dilê mirovan diqetand û şewqa belav dikirî hemî herê m ronî dikir.”

**Xof dan ser:** Tirs lê peyda kirin.  
**Pirça cên (canê kesekî) tikan tikanî bûn/kirin:** Li hemberî tişteki tirsîn, kelecana bûn, qeliqîn, qeflîn.  
“Tenê segên gund dirêj dirêz dizûrîn. Ew awazê ji nava cigerên van derdiketî ji aliyekî de mirov xemgîn dikir, ji aliyekî de jî xof dîda ser. Pirça canê mirovan tikan tikanî dikirin...”

**Ecerên biharê:** Gîhayê nû şî nû bûyî.  
**Poşt biriqandin:** Kok bûn, qelew bûn, ji lawaziyê xilas bûn.

**Xwîna biharê girtin:** Bi ser xwe de hatin. Ji lawaziyê xilas bûn.

*“Hesþên ku ecerên biharê xwarinî,  
postêxwe biriqandîbûn, xwîna biharê yê  
teze girtîbûn...”*

**Dema cihanê libasê tarî li xwe kir:**

Hingorî, roj ava bûn, şeva reş bûn.

*“Dema cihanê libasê tarî li xwe kir, her  
çar heval dîsa hatin ser girê gundî Sari  
Qadî.”*

**Da bin çengê xwe:** Hêza xwe bi tişteki  
yan bi kesekî kanîn.

*“Keçikê kire qerîn û hawar lê Heco yê  
wek pehlewaneke ew mîna bebekê dabû  
bin çengê xwe û bi alîkariya hevalê xwe li  
hesþ sîwar bû.”*

**Di nava malî-hûlan de bûn:**

Tiştên (xeyalên) ecêb ku gava tèn bîra  
mirovên, mirov pê dikenin.

*“Di dû re navê wê hate bîrê, dîsa bi navê  
wê kenî, ji xwe re got: “Makîne? Hîi çî  
navekî ecêbe!” Di nava van malî-hûlên  
ku kenê wî tanî de bû ku teqîna gulleyekê  
aramiya berbangê û xeyala wî xirav kir.”*

**Kirin ardan:** Weran kirin, qulquli  
kirin; kuştin.

*“Eger em di vir de dirêj bimînin ew ê  
topan binin û me di bin van xirban de  
bikin ardan.”*

**Qeşaya di navberê de helîya:** Li hev  
hatin.

*“Heco zanî ku wê êdî ew pejirandiye û  
qêşa di navberê wan de heliyaye...”*

**Li ser yekî/tiştêkî bûn senc:** Li ser  
kesekî/tiştêkî kom bûn. Li hev gihiştin.

*“Dema Heco hat li ser wî bûn senc,  
hemûyan bi çavên tiji meraq li wan û li  
hesþê birîndar mêzedîkirin.”*

**Simbêlên xwe kel vekişin li rûyan**

**ketin:** Pirçînî pê ketin.

*“Heco kenî, simbêlên xwe kel vekişin li  
rûyan ketin û: Na dakê na, ew  
Kurmanci nizane! Got.”*

**Bi qar ketin:** Xeyidîn.

*“Ez ê ji Orê re çî bêjim niha? Gelo ew a  
li min çiqes biqar bikeve?”*

**Awênî dan (kesekî):** Xemrevînî, Semax  
kirin, tav dan, haw dan.

*“Hevalên wê awênî didanê lê dilê wê zîz  
bibû û wiha dizanî ku ew êdî keçikeke  
dergîstiyê xwe miriyezan ji hewî hatiye  
ser.”*

**Ji ser pozê xwe re bûn:** Pir xurt û  
mêrxas bûn.

*“Xortekî diserpozî xwe re, çavpît,  
cîgerpola, bêtirs, dirêj, esmer û çavşîn bû.”*

**Xwe avêtina ser gunê kesekî:** Li ser  
kevçika dilê yekî xistin; kesek zêft  
girtin, dil girtin, ji bo zêftgirtinê di bin  
xwe de hiştin.

*“Mehmedê malê Omşerê ketibû pêşiya  
eskeran û çibû li Qadan bi awayekî  
bêbext, xwe avêtibû gunê Sîyarê, ew  
girtibû û teslîmî eskerên xwe veşartî  
kiribûn?”*

**Qûn hilavêtin:** Ji şabûnan reqişin.

*“Yên ku şabûna xwe aşkere dikirî jî  
zabit, axa, beg û xulamên wan bûn. Ji*

wan dawetek kê m bû ku derkevin nava  
gel qûna xwe helavin...”

**Hewesa xwe ji hev neşikandin:** Bi  
hesreta demeke dirêj bi hev û din re  
hesret derneanîn. Ji hev têt nebûn.  
“*Me hîn hewesa xwe jihev neşikandiyê, ew  
diçe carekê dîn were an ne, nediyar e...*”

**Di qederê de were!:** Le’net lê be!

Weda lê bikeve!

“*Di qedera min a bedbext de were,  
kesekî min nasnedikiri derkeve were,  
evîndarê min bibe û birevîne.*”

**Di xwîna sor de reng dan:** Mirin.

“*Qerê Mîstefayê mîna beranê Qose Daxê  
di xwîna sor da reng da...*”

**Li bajarê (gundê) te çi heye? Çi**

**tune?:** Li şûna pirsên wek “Çawa yî?”  
“Çi dikî?” digire. Pirsîna rewşa kesekî  
diyar dike.

“*Me tu jî pir merq kirî û pir tişt di  
derheqê we de bihîstin... Ka hinekî qal  
bike, li bajarê te çi heye?*”

**Da terkîya xwe:** Avêtina pişt a xwe, li  
xwe bar kirin.

“*Hela sebîr bike., ez di dû xwe dihêlim?  
Min da terkîya xwe û anî mal û li xwe  
mar kir.*”

**Li ser balgiyekê pîr bûn:** Bi hev re pîr  
û kal bûn.

“*Ma bi xêr be! Xwedê we li ser balgiyekî  
pîr bike.*”

**Lê hewes kirin:** Xwestin.

**Dan ser hewiyê:** Dan mêrekî zewicî û  
jina xwe hêj sax e.

“*Keçîka wan kesî lê hewes nekir û di  
dawiyê de dan ser hewiyê.*”

**Cil dan bin kesekî:** Qedir û qîmeta  
kesekî zanîn.

“*Ew yeka li rewşa me herême neguncê.  
Xelk paşê cila nade bin me...*”

**Destên xwe kirin xirnaqa kesekî:**

Daxwaza fetisandinê, piranî bo kabûs û  
tirsê.

“*Ûê tirsê, destên xwe kirin xirnaqa wî,  
ew wekî bîfetise bû, xwedan lêket...*”

**Dîkê ber mala xwe bûn:** Ji xeynî cih û  
warên xwe li tu cihan nikarin debera  
xwe bikin.

“*Îsanên me wiha ne, dikên ber mala  
xwe ne; yanî naxwazin ji dora gundên  
xwe bi dûrkevin.*”

**(e)Yar dan qulkirinê:** Hiz qul kirin, bi  
guleyê hatin hingaftin.

“*Sala 1929 an li Qirşehîrê dîsa ji şerekî  
giran bi saxî filitibûn û yar nedabûn qul  
kirin.*”

**Pê aşne bûn:** Hay jê hebûn.

“*Apê Êl, dibe ku tu jî pê aşneyî, min di  
van 17 salana de eskereki dewletê jî bi  
zanyarî nekuşt.*”

**Boç danan:** Wêrekî

**Boç jê kirin:** Deng jê birîn.

“*Hîi tu hîna jî boça xwe dadîni? Ez ê  
nîşanî te bidim ku mirov çawa boça yên  
mîna te jê dikin!*”

**Bêvil lê sor bûn:** Kesirîn, bi ber ketin, (ji xemgînîyê) jana ku bi bêvila meriv dizeliqe.

*“Dora çavên wî û bilîvên wî sor bûn.*

*Hevalê xwe yê nerazîbûn nîşandayî pirsî:  
Tu bi çi digrî?”*

**Xema dilê xwe sivik kirin:** Behna xwe vekirin, rehet bûn..

*“Heco niv saetê bêrawestan bilûr lêxişt û xema dilê xwe sivik kir.”*

## JI ROMANA “SIYARÊN DEŞTA ANATOLIYÊ”

**(Li ser tişteki) Bi kesekî re dan û standin:** Şêwirîn.

*“Dema Hecî agahdariya digire, çend rojan bi hevalên xwe re dide û distîne, li dawiyê biryara xwe dide.”*

**Li doralîyê xwe çav kirin:** Raçavkirin, lênerîn û şîrovekirin.

*“Peya terin nezîkî zozanê dibin û li dor aliyê xwe çav dikin. Ji nişkava şivanê malê xûya dibe.”*

**Guhê xwe li ser malê bû:** Hişê xwe li ser malê bû. Bala xwe li ser malê bû.

*“Xelo her dem li mal bû. Kar û barên cîrana dikirin, lê guhê xwe tim li ser mal bû.”*

**Li ser xwe be ha!:** Hay ji xwe hebe!

*“– Gopo, heyran li ser xwe be ha! Gopo di bin simbêlan re kenîya û bi serê xwe, bi işmar gotina hevalê xwe erê kir. Heşpê xwe qamçî kir û bi lingên xwe hêşp zengû kir.”*

**Gêr kirin:** Ser jê kirin.

*“Mêvana roja xwe li mala Qaso derbas dikirin. Malbatê jî beranek ji bo mêvanan gêr kiribûn.”*

**Xwezî di qirikê de man:** Armanc û mirazê xwe bi cih neanîn.

*“Zave jî bi tirs dixwast ku jina xwe biparêze. Destêki xwe avetibû paş xwe. Xaziya wan di qirika wan da mabû. Neqanîbûn bange kesekî jî bikirina.”*

**Barê li ser milê xwe vala kirin:** Karê xwe qedandin, rehet bûn.

*“Tevûhev berva hevalên xwe çûn. Heyecanekê bi Osê girtibû. Omer jî barê li ser milê xwe wela kiribû, heval bi kefbûn.”*

**Av rijandin:** Miştin.

*“Dema heşpên wan av vedixwarin Omer jî li firîske dixişt ku ma têr vexwin. Os jî ji bo avekê birijîne çûbû paş zinaran.”*

**Kesekî li ser xwe bû:** Hal û wext li şûnê bûn.

*“Malbata Gabelek jî li gundê Şerefliyê malbatek bû. Cemalê malê Gabelek kesekî li ser xwe bû. Meriveki bejn dirêj, rû şî û simbel keytan bû.”*

**Wek rojê vêketin:** Delalî, şpehîti.

*“Hora Malê Gabelek jî wek ronahiya êla nasiriya bû. Dihat gotin ew wek rojê vêdiket. Rindîka deşta Anatoliya Navîn bû.”*

**Çav şil kirin:** Girîn.

*“Piraniya wan; bi stranên dengbêj çav şil dikirin.”*

**Di kortika çavan de av miçiqîn:**

Gelekî girîn.

*“Dilber çel roj bûbûn ji mal derneketibû.*

*Ji girî, di kortika çavan da av miçikî bû.*

*Çav li serî sor bûbûn.”*

**JI PIRTÛKA KURTEÇÎROKAN  
A “TAYEK POR”**

**Li siyê ketin:** Ji ber germê li siyê mexel hatin.

*“Li pêş miyan kuçikê şivana û mirişkek bi çêlên xwe va jî li siyê xênî ketibûn.”*

**Derîya kesekî/tiştêkî çav kirin:** Li hêviyê man, li bendê sekinîn.

*“Ez a derîya te çav bikim, ku hetanî miriniyê we jî.”*

**Li ber sekinîn:** Lêdan.

**Xiş û xal kirin:** Bêhal hiştin. Ji halde xistin.

*“Li neqewa tirî em peya kirin, bi pîn û kuta li berme sekinîn, em xiş û xal kirin. Lê bi şîya nekirin ku tiştêkî ji me bi derxin!”*

**Tu tûk bikî, tûka te wê li hewa**

**bicemide:** Ji bo minandina sermayê.

*“Ji serma, dev û rûyên meriya dîqerisîn. Mîna ku gotî, te tûk kira, tûkê te ya li hewa bicemdiya.”*

**Dupîya Hesênê Mamê:** Firtûneya

berfê ku her sal di heman wextê de dibe.

*“Gundîya digotin, dupîya Hesênê Mamê ye. Hesênê Mamê şivanê axlera wûye.*

*Ew li çolê, li hewşo bi keriyek pez va, çî ber dupîyê ketiye; di bin berfê de maye û*

*miriye. Keriyê pêz jî telef bûye. Kesî nedizani, ku va afeta kingê bûye.”*

**Ji ya xwe neman:** Bi gotina xwe kirin.

**Nig dan ser:** Di ber dan, israr kirin.

*“Wî yekcara xwe li nexwaşî dîna yan jî li mane û muneyan dîgeriya ku nere mektewê. Lê Edul ji ya xwe nedîma, nig dida ser. Hemo neçar dima radiwû.”*

**Deştbiço:** Zordar.

*“Mexlîm yekî deşt bi ço bû. Ew di dersê de bê ço nedibû. Ew tenekî nêzîke Hemo bû, bi hêrs û bi tirkî bang kir.”*

**Xwe nura ser hev kirin:** Qutifin.

*“Xwe nure serhev kiribû û di quncikê odeyê da rûniştibû.”*

**Bi cina ketin:** Hiş avêtin, dîn bûn.

*“Heciyê Alê mêz kir ku mîya stewr ji ambara ceh derdikeve. Ew pê mîna ku bi cina ketibe. Wî da dû wê û li pêş malê gihêştê.”*

Çav di serî de gewr kirin û listin: Hiş avêtin, dîn bûn.

**Ji qawa xwe derketin:** Ji hêrsan çav lê mezin bûn.

*“Çav di serê Heci de gewr dikirin û dilîştin, tê bigota ew ê ku ji qawa xwe derdikevine.”*

**Sor û pindirkî bûn:** Ji ber hêrsan an jî ji fedîyan sor bûn.

*“Dev û rûyên wî ji hêrsa ra sor û pindori bûwûn.”*

**Eşohret bûn:** Xwe (bi tiştêkî) rezil kirin, hetikandin.

*"Xwedêkê çir bûye, te xwe veng kiriyê eşohret, lê ku xelk biwîne, wê bi te bikene dîniko!"*

**Çavên xwe belkîrin û berdana ser yekî:** Bi hêrs li yekî nêrin.

*"Hecî çavên xwe belkîrin û berdane wê."*

**Mageyê ji kera:** Kerkurê keran! Dolê keran!

*"-De deng meke, mageyê ji kera ye!"*

*"-De here magayî ji kerawo! Ûsiv di pey wî got"*

**Didan di dev de feliqî bûn:** Ji bo kesên/ajalên zeîf.

*"Hîn ku ew berxêke virnî wû, pît nexwaş ketiwû. Pir jar wû. Didan di dev da feliqî wûn, tim bi zarêşe diket û nedikani ku baş biçêre."*

**Çav lê nerm bûn:** Xew (yekî) hatin.

*"Pêçekê şûn da, çav li şivên nerm bûn, ew kete xewê."*

**Ji kena gurçîk êşîn:** Pir kenîn.

*"Xortên li dora şivên bi van serhevdeyên qebileyan hik û hik kenîyan. Ji kena gurçiyên wan êşîyan."*

**Canê min kirçkirçî bû:** Xof lê ketin, tirsîn.

**Por li serî tela bi tela bûn:** Xof lê ketin, tirsîn.

*"Tirs kete dilê min. Canê min kirçkirçî bû, por li serê min tela bi tela bû."*

**Benz û bed lê qetin:** Xof lê ketin, tirsîn.

*"Benz û bed li xortan qetiya bû. Wan, mîna ku heta dawîya hekatê nefesa xwe girtiwûn, kûr nefes berdidan."*

**Doxîna xwe li ber heramiyê vekirin:**

Çav berdana heramiyê.

*"-Hunê dîziyê, derewa, nerindî û neheqîyan nekin. Duxîna xwe li ber heramiyê vemekin."*

**Alê xwe avêtîye ser:** Ji bo nexweşîyeke piçûktiyê.

*"Digotin, wexta ku ew hîn î derguş û di kundaxê da wûye, alê xwe avêtîye ser, nig ji wê de pûç maye."*

**Mîna qeda bûn:** Ji bo kesên zîrek û jêhatî, ji bo kesên ji heqa karê xwe derdikeve.

*"Şarê mîna qeda pez didot, nan lêdixist û kinc dişûştin."*

**Pêsir belbûn:** Kesa dikeve kemala xwe.

*"Pêsirê wê hîn nû belbûbûn, wexta ku ew dîkeniya geh heldîhatin geh dêdîhatin."*

**Ji hesûdîyan bi dizan re bûye heval û mala bavê xwe derva kiriyê:** Ji bo kesên çavnebar.

*Cino ji Şemo hesudtir wû. Digotin, ew ji hesudiyê bi dizan ra bûye heval û mala bavê derva kiriyê."*

*"Sê malbat û mermaliyên wan li hev sîva hatin. Navê Şarê neçê bû, bi ser da wê kut ji xwarin."*

**Nav neçê bûn:** Bi kirin an jî xuyên nebaş nam girtin.

*"Sê malbat û mermaliyên wan li hev sîva hatin. Navê Şarê neçê bû, bi ser da wê kut ji xwarin."*

**Bi çaveki neçê lê mêz kirin:**

Nebaşdîtin, biçûkdîtin, bi çavên xerab  
lê nihêrtin.

“Ji derva û ji yada zewicîn bi eyb digirtin.  
Li zewaca bi gewendan û cînganan va bi  
çaveki pir neçê mêz dikirin.”

Çav lê dan: Nezerî kirin, çavîni kirin.  
“- Ez ê dîwême, çavên Bilo bi teva dan!”

**Nemûs hatiye pênc peran:** Ji bo  
mîrandina bînemûsîyê.

“Henan digot: ‘Nemûs hatiye pênc  
peran. Mêrik jinikê revandîye, yê din  
qet tiştêki nakê.”

**Nerm bûn:** Qebûl kirin, razî bûn, li  
hev hatin.

“Paşê nerm bûn û li dawîyê razibûna  
xwe nîşan dan.”

**Devjê û şorsîst bûn:** Bi zimanê xwe  
nikarîn.

“Yên ku qîmet didane edeban derheqê  
merê wê, Hesenê Şaşê da digotin, ew î  
devjê û şorsîst e.”

**Di hêlê re derbas nebûn:** Neşibîn.

**Bi tira kesekî/tiştêki negihîştin:**

Nikare mîna wî tiştî/kesî be.  
“Wî digot: ‘Qalaxên jinên gundî me  
şaheser in, piramidên Fîrawûnên Misirê  
dî hêla wan ra derbas nawin, ew dî tira  
wan nagihên.”

**Guh danan:** Guhê xwe bel kirin, bala  
xwe dan ser (tiştêki).

**Li ser perdeya guh qeyd kirin:** Bi  
baldarî guhdarî kirin.

“Ûsiv gûh danan, mîna ku biwêjî, ew î  
dengê avrijandina jinikê li ser perdeya  
guhê xwe qeyd bikê.”

Şor li herdê ketin: Erzanbûna gotinê;  
gotina ku li hewa mayî.

“Dê û bavê wî ji hay jê hewûn, lê newêrin  
ku Nazê bixwazin. Digotin: ‘Em  
mihecîr in, Nazê nadin me, şorê me ya li  
herdê keve!’ ”

**Ba ketiye ber bêvilê:** Ji bo kesên pir  
hêrsbûyî.

“Mîna ku dîwên, ba ketiwû ber bivilan,  
wî hehelê û kekelê wû. Ûsivê kehîl û  
bêdeng, bi carekê ra hatiwû gûherîn.  
Mîna bergîreki bejî, wî serî berjor û  
berjêr dihejand...”

**Ziman ketiye dev:** Beçaretî.

**Devê turê derd û kulan vekirin:**

Bêçaretî, tengezarî.  
“Ziman ketiwû dev. Wî, mîna ku biwêjî,  
devê turê derd û kulan vekiriwû û ew li  
nav şevêşê û berve ezmên belav dikirin.”

**Xûzî lê miçiqîn:** Bêhn lê çikîn; xulqê  
(yekî) teng bûn.

“Ji ber van pirsan xûzî lê miçiqîbû û ne  
xew ne ji hewênîya wî dihat.”

**Çirtê xwe pê kirin:** Gumana xwe pê  
neanîn; bi şik û şibhe nêzik bûn.

“Bi hemilîyan be, bi navê Xwedê û  
pêxemberan be, bi serî herdu birayên  
min yê mîrxas be, min ji tu kesî ra qala  
şûna zêran nekiriye. Ha, vê ji bizane,  
eger tu çirtê xwe pê min bikî, wele ez a  
sûva bêm, herim bavana û nayê.”



**Mîna agirê pûş belav bûn:** Zûzûka belav bûn, bi lez û bez belav bûn.  
*Xewera dêrvakirina mala Elî Axaxa zû, mîna arê pûş, li nav gund belav bû.*"

**Ji doxinê berjêrtir bûn:** Ji bo gotinên argo.  
*"Yareniyê Çeko tim ji doxinê berjêr bûn."*

**Tam jê derxistin:** Kêf jê standin.  
Çîn jê koz kirin: Kêf ji eziyetlêkirinê standin.  
*"Axaxa gotiye, yê mîna Hûso be, ew î ji heqe axatiyê tê derê, tamê jê der dixe û çîna jê koz dike."*  
*"Wî ez gêr kirim, nigên min ber bi jor helnan û bi şiva ter li ser hev li binî nigên min xist. Nig li min pûç bûbûn, min got, ruhê min î ku bikişê. Paşê ez birim dereke ku striyê keran li pir bûn û pêxas ez li ser strî birim û anîm... Hasilî mîna ku dibên, wî çîn ji min koz kirin."*

**Ê gonê (gihanê):** Gava ku kesek behsa kesekî ya jî tişteki bike û naxwaze navê wî tiştî yan jî kesî bine ser zimên, dibêje:  
"ê gonê (gihanê)"  
*"Wexta ku nexwaş diwû û xemên tenêbûnê xwe lê dipêçandin, ew bi ber xwe diket, kelgiri diwû, seriyê xwe û destê xwe yê rastê berjor heldina, bange Xwedê dikir digot 'de bes e êdî, î gihanê bişîne!' Qesta wî ji î gihanê ezrayîl bû."*

**Xûya sar li pişte ket:** Di wê tirsê de mayîn ku dibe tişteki nebaş û nexibêr bê serê mirov, qilqilin.  
*"Wî şor helna, lêbîlem xuyêke sar li piştê ketiwû, got, 'gotina te rast e, min kesên*

*parsek yên ku ne seqet bûn diqewitandin, tu yarmetî nedîda wan."*

**Mîna pisika li benda mişk sekinin:**  
Di kemînê de man; li hêviya keysê bûn.  
*"Li ser lodê ya ku bi nivî bûbû rûniştibû. Wî mîna pisika li benda mişk sekinibû, xwe dawû benda tavek ba."*

**Hefsar bi dest xistin:** Kirin bin kontrolê.  
*"Heger ew hîn nezewicîye yan jî mêrebî ye, em jinebîyeke gund lê mahr bikin, hîngê hefsarê wî yê bi dest me keve."*

**Dev bigrî qûna denk ke:** Ji bo kesên devsişt.  
*"Mageyî ji keran, dev bigrî qûna deng ke, ax ax!"*

**Çîn derxistin:** Pirsgirêk derxistin; av li ber (yekî) şolî kirin.  
*"Kewê siftê got, 'wêyê, dibe! Ne Gêlho bibihîze ew ê çîna derxe!"*

**Şeytan pê kenin:** Kesên ku xewnên neçê dibinin ji wan re tê gotin. Ji tiştên bêbereket re tê gotin.  
*"Da çi xewneke neçê bû, lo...! Şeytan bi min kenîye, lenet lê be!"*

**Şîpê şeytên:** Ji bo tiştên ku bi xoşa mirovan diçin.  
*"Towe, towe... heram ne ye, bi meriva xweş tê, şîpê şeytên e. Ma tu jî yê bizanî, wexta em xort û cahîl bûn, me zerdelên darên xelkê didizîn, ew bi me çiqas xwaş dihatin."*

**Şeytan ketiye bin çeng û xêrê pê**

**nake:** Ji bo kesên ji rê derketî.

Çavên neçê pê ve dan: Çavîni bûn, nezerî bûn.

*“Ji hecî û xoceyên wê cîwarê, hênan digotin, şeytan î ketiyê bin çengê Heyder û xêrê pê nakê. Hêna jî digotin, Xwedê yî wî di imtîhanê re derbas dikê û zati jiyîn bitûn imtîhanê mezîna e. Hênan jî digotin, çavên neçê pê va dan.”*

**Magî binaro:** Ji bo kesên ku ji xeynî

xwarinê bi kêrî tu tiştî nayên tê gotin.

*“‘Himm, naheî, magî binaro, qet tu li min neçûyî!’ Hec Hemîd bi tonekî sivik di ber xwe de lêvegerand.”*

**Çilka li ser ser bûn:** Ji bo tiştên

biqîmet.

*“Dîya wî qîreta wî dikşand û nedihîşt ku ew destê xwe şil bike. Ew li ba wê delal bû, çilka ser sêr bû.”*

**Kar ji ber revîn:** Ji bo kesên jîr.

*“Xortekî jîr bû, kar ji ber direvî.”*

**Serî li ewran gerandin:** Ji şûmîyan sêr

lê bûn.

*“Bi motirajotînê Meço serî li ewran digerland û xag dibû.”*

**Jê cûnî bûn:** Tirsîn.

*“Xaltî li Meço sîvhatî bû. Ew ji motir pir dîtirsî, jê cûnî dibû.”*

**Hevdeyên serî sist bûn:** Aqilê xwe

çeliqandî.

*“Digotin di piçîktîya xwe da ew bi nexwaşîya menecîtê ketiyevû bi ser vê da, wekî ku tê gotinê, hevdeyên serî sist bûne.”*

**Mîna lukisê vêketin:** Pir rindik bûn.

Pir delal bûn.

*“Keçîkeke malê hewû navê xwe Medê bû û mîna lukisê vêdîket, wekî horîyê bû.”*

**ÇAVKANÎ:**

Reşî, Ş. (2015). *Heco*. Stenbol: Weşanên Ar.

Ozgur, M. (2017). *Siyarên Deşta Anatolîyê*. Swêd: Weşanên APEC.

Ateş, N. (2012). *Tayek Por*. Swêd: Weşanên APEC

# Bermekiyên Kurd di kûraniya dîrokê da

-4-



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



Wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

## Xeleka Gotaran: **Kurd û Îslama Siyasî**

### **Herdu Wezîr: El Fedil û Ce'hfer kurên Yehya Bermekî**

#### **YEKEM - Wezîr El Fedil kurê Yehya Bermekî**

*El Fedil kurê Yehya* sala 148-ê goçî (765-ê z.) bi çend rojan berî *Harûn El Reşîd* ji dayîk bûye; ew û *Harûn* bi şîrmêjandinê birayên hevîn. Dayîka *El Fedil* Emazîxî (Berber) bû û herwisa dayîka *Harûn* ya bi navê *El Xeyzuran* jî Emazîxî bû. *El Fedil* hên di ciwaniya xwe da dilêr bû, xwedî rewîştên bilind bû, aqilmend bû, bi kar û barên mezin xerîk bû. Ji hêla dîn va jî xwedî rewîşt û tîtalên comerdî, paqijî û hêjayiyê bû. Ew ji ber bavê xwe va pir caran bi kar û barên girîng radibû û ji ber wê nav lêkiribûn „wezîrê biçûk“. Xelîfe *Harûn El Reşîd* *El Fedil* kiribû perwerdekarê kurê xwe *Muhemmed El Emîn*<sup>1</sup>.

Di sala 178-ê goçî da, bi fermana *Harûn El Reşîd*, *El Fedil* bû waliyê baskê rojhilat yê *Dewleta Ebbasî*; ji Kurdistanê da bigire heya bi tixûbên Turkmanistanê û Xurasan jî di nav da. Ji ber girîngiya Xurasanê, *El Fedil* ew herêm ji xwe ra kire nawend, ji ber ku Xurasan li ser sînorên gelên Turk yê dijmin bû. *El Fedil* karê walîtiyê baş bi rêvebir, zordarî ji ser gel rakir, mizgeft avakirin, hevzoyên avê duristkirin, warên ji perestina oldaran ra damezrandin, xûk û bacên berê yê giran ji ser gel rakirin, mehaneya leşkeran bilind kir û xizmetên baş ji bo mêhvanan, rêveberan û nivîskaran pêşkêş kirin û wisa serdariya *Ebbasî* li wir hate çespendin<sup>2</sup>. Yek ji karên here balkêş ew bû ku gava *El Fedil* gihîşte bajarê *Belxê*, xwast perestgeha *Nûbihar* (Perestgeha Zerdeştî), ku bapîrên wî di xizmeta wî da bûn, biroxiîne. Lê

<sup>1</sup> Ibin Tebateba: *El Fexri fi El Adab El Sultaniye*, çapa 1997, rûpel 203. Ibin El-Esîr: *El-Kamel fi Tarîx*, 5/273. Selah Eddin El Sefedi: *El Wafi Bil-Wefiyat*, 24/50.

<sup>2</sup> Selah Eddin El Sefedi: *El Wafi Bil-Wefiyat*, 24 /40 - 51. Ibin Xellikan: *Wefeyat El E'yan*, 4/29.

belê, ji ber ku avahî pir gewre bû, nikarîbû hilweşîne. Rabû tenha aliyekî perestgehê roxand û li wî alî mizgeftek avakir<sup>3</sup>.

Di sala 186ê goçî da mirovekî bi navê *Yehya Bin Ebdullah El Elewî / El Şî'î* (yek ji neviyên *El Hesên kurê Elî Bin Ebi Talîb*) serhildanek li dijî dewletê li welatê *Deylem* (li başûrê *Derya Xezêr*) pêkanî. *Harûn El Reşîd* ji vê serhilanê gelek bi xem bû, ji ber ku serhildaneka pir tirsnaq bû ku dikarîbû *Dewleta Ebbasî* bi giştî li ber têkbiçe. Rabû *El Fedil* kir waliyê herêma *El Cibal* (Çiyên) ku Kurdistan beşekî mezin ji wê herêmê bû, tevî Teberistan, Curcan û El Rey (Rexe) û berpîrsiyariya vemirandina serhildanê sparte wî. Xelîfe *Harûn* ji *El Fedil* ra 50 hezar şervan û rêberên dilêr hinartin û piştgiriya diravî jî da wî.

*El Fedil* pîlaneka berfireh ji bo têkbirina vê serhildanê pêkanî, berpîrsiyarî li ser rêveberên leşkerî belav kir. Herêma ku serhildan lê pêkhatibû herêmeka çiyayî û pir asê bû, serma û berfa wir pir bû. *El Fedil* dizanîbû ku girtina *Yehya Bin Ebdullah* bi rêya şer pir zor û girane. Rabû bi şêwazê nerm nêzî wî bû. Name jêra şandin ku ew xwe bispêre. *Yehya* razî bû, bi mercê ku xelîfe *Harûn* bi nivîskî hêminî û ewlehiyê bide wî. *Harûn* ev merc pejirand û wisa kir. *El Fedil* hate Bexdadê û *Yehya*

li gel xwe anî. *Harûn* bi vê yekê gelek şabû. *Yehya* li mala *El Fedil* bû mêhvan. *Harûn* li ser vê serketina mezin hên bêhtir spasdarî da wî û qedra *El Fedil* bilind kir<sup>4</sup>.

*El Fedil* di qada zanistî, wêje û torevaniyê da, di asteka gelek bilind da bû, gelek helbestên Ereban ji ber kiribûn û di vî warî da pispor bû. Hin afirandinên wî jî di meydana helbestvaniyê da hene. Jêderên erebî gelek belge ji afirandên wî û helwestên wî li gel helbestvan û wêjevanan tomar kirine. *El Teberî* dibêje: “*Harûn El Reşîd carekê lome ji El Fedil kurê Yehya kiribûn ku cihê xwe li ber maseya mey û şerabê li gel wî vala hiştiye. El Fedil jî gotiye: Heger min bizaniya vexwarina avê jî mirovatiya min kêr dike, minê ew jî venexwariba*”<sup>5</sup>.

*El Fedil* sala 192-ê goçî (808-ê z.) li bajarê Reqayê di zîndanê da wexer dike.

## **DUWEM - Wezîr Ce'hfer kurê Yehya Bermekî**

*Ce'hfer* kurê duweme ji lawên *Yehya Bermekî*. Ew di sala 151-ê goçî (187-ê z.) ji dayîk bûye. Bavê wî ew danîbû ber destê *El Qadî Ebo Yûsif* (yek ji suxte û şagirtên *Ebo Henîfe*) daku wî perwerde û hîn bike. *Ce'fer* xwedî vîneka tund bû, xwedî dîtînen tûj bû, payedar û astbilind bû. *Harûn El Reşîd* bi hevaltiya wî pir keyfxweş bû. *Yehya*

<sup>3</sup> Selah Eddin El Sefedi: *El Wafî Bil-Wefiyat*, 24 /40 - 51. Ibin Xellikan: *Wefeyat El E'yan*, 4/29.

<sup>4</sup> Ibin Tebateba: *El Fexri fi El Adab El Sultaniye*, rûpel, 203. Ibin El-Esîr: *El-Kamel fi Tarîx*, 5/273.

<sup>5</sup> *El-Teberî*, *Tarîx El-Teberî*, çapa 1387 goçî, 8/293.

*Bermekî*, bavê *Ce'hfer* li ser vê hevaltîya pir germ hinekê bi tirs û fikar bû ku di encamê da, bi ser malbata Bermekî da bi neyînî vegere. Rabû ji *El Reşîd* ra ev tiştê dilê xwe got, lê *El Reşîd* guh neda vê pirsê û herku çû hên bêhtir hevaltîya xwe germtir kir. Wezaretî ji *El Fedil* stand û da *Ce'hfer*, kar û barê welatê Misirê jî, di sala 176-ê goçî da, da dest wî û ew kir wezîrê yekem<sup>6</sup>.

*Harûn El Reşîd* di pirsên here tirs-nak da baweriya xwe bi *Ce'hfer* dikir, ji ber ku dizanîbû ew tiştan baş têdigihîne û aqilê wî baş diçe ser pirs û mijaran. Wek nimûne, di sala 180-ê goçî da agirê şerekî êlîtî li welatê Şamê di navbera *Erebên Başûr* (Erebên Yemenê) û *Erebên Bakur* da pêket û herku çû ev şer gur bû. *El Reşîd* ji ber vî şerî ket xem û fikaran û ji *Ce'hfer* ra got: “*Yan tuyê derkevî vî şerî yan jî ez. Ce'hfer jêra got: Ezê te bi laşê xwe biparêzim*”. *El Reşîd* vemirandina vî şerî sparte *Ce'hfer*.

*Ce'hfer* li gel rêber, leşker û çek-daran berê xwe da welatê Şamê, karmendên mezin li wir danîn ser kar, di navbera wan da aştî û lihevhatin pêkanî.

Yên diz û talanker ku bûbûn sedemên şer û nakokîyan kuştin, çek ji dest wan girtin û wisa ev agir vemirand, hêminî û ewlehî vegerande welatê Şamê<sup>7</sup>.

*Ce'hfer* di warê siyasî da gelek aqil-mend bû, wêjevanekî resen û petî bû, zû mijar fêhmdikirn, comerd û dest-fireh bû. *Tûmameh Bin Eşref* derbarê wî da dibêje: “*Ce'hfer kurê Yehya ji her kesî baştir diaxivî. Bi awayekî bêdî û xweşik, bi peyvên avêne û şêrîn diaxivî ku her kesekî baş jê fêhmdikir û ne pêwîst bû ku peyvên xwe dubare bike. Ew li ber peyv û gotinan nedisekinî, ne jî zimanê wî ber bi hev diket, ne jî li ber gotinan dima. Ji her kesî bêhtir bi nûçeya balkêş, helbesta nirxdar û pendên pêşîyan dizanî û bi awayekî avêne û zelal û zimanekî sade diaxivî*”.

Di sala 187ê goçî (803-ê z.) da *El Reşîd* fermana kuştina *Ce'hfer* da û ferman da ku cendekê (laşê) wî bê sohtandin (şewitandin), piştî ku cendekê wî kirin du beş û demeka dirêj xaçkirî hiştin<sup>8</sup>.

<sup>6</sup> El Itlidi: *Newadir El Xulefa*, çapa 2004, rûpel 167. Ibin Tebateba: *El Fexri fi El Adab El Sultaniye*, 1/203.

<sup>7</sup> El-Teberî, *Tarix El-Teberî*, 8/262. Ibin Xeldûn, *Tarix Ibin Xeldûn*, 3/280.

<sup>8</sup> Ibin El-Esîr: *El-Kamel fi Tarix*, 3/367. Ibin El Cewzi: *El Muntezem fi Tarix El Muluk wel Umem*, 9/127.

# Cînavka vegerok: XWE

*Hesen Huseyin Denîz*

Di zimanê kurdî - kurmancî de cihekî grîng a cînavka vegerok: xwe heye. XWE cînavkeke wiha ye ku wekî rojê her tiştî dide guhertin, lê belê xwe qet nade guhertin e. Ev cînavk ji bo hemû kesan –çi kit, çi kom- wekî xwe dimîne. Grîngiya wê jî ji vê derê tê û ev yek taybetmendiyeke zimanê kurdî-kurmancî ye.

Ji bo ku di hevokê de mirov karibe cînavka XWE bi kar bîne, divê ew tişta di wê hevokê de tevî cînavk û lêkerê girêdayî heman kesî be. Ger ne girêdayî heman kesî be wê demê cînavkên din ên wekî MIN, TE, WÎ, WÊ, ME, WE, WAN tên bikaranîn.

Ji bo têgihiştina bikaranîna cînavka vegerok em dikarin mînakê bidin:

## **Ez pirtûka xwe dixwazim.**

Di vê hevokê de kirde, bireser û lêker girêdayî heman kesî ne. Yanî yê dixwaze EZ im û PIRTÛK jî ya min e. Di rewşeke wiha de ku him KIRDE, him LÊKER him BIRESER girêdayî heman kesî ne de,

cînavka XWE ya ku li xwediyê xwe vedigere tê bikaranîn. Yanî mirov nabêje, Ez pirtûka MIN dixwazim. Bê guman di gelek zimanê din de bi awayê, Ez pirtûka min dixwazim tê bikaranîn û ji ber vê yekê kesên pişt re hînî zimanê kurdî dibin, ji ber ku wekî rêzikên zimanê xwe difikirin, destpêkê wiha bi kar tînin.

Em niha li mînaka li jêrê binêrin û cudahiya MIN û EZ çêtir bibînin.

## **Tu pirtûka min dixwazî.**

Di vê hevokê de kirde kesê duyem e, lê bireser ne girêdayî wî, girêdayî kesê yekem e û lêker dîsa girêdayî kesê duyem e. Yanî kesê duyem+kesê yekem+kesê duyem

Di vê rewşê de, mirov nikare cînavka vegerok bi kar bîne, ji ber kî xwediyê wê ne kirde ye. Yanî biresera PIRTÛKA MIN, ne girêdayî kirdeya TU ye û ji ber vê yekê wekî Tu pirtûka xwe dixwazî nehatiye nivîsandin. Li wê derê kesê TU pirtûka XWE naxwaze, ew pirtûka MIN dixwaze.

Cînavka vegerok XWE ji bo kesên kom jî wekî xwe dimîne.

Em li mînakên jêrê binêrin, em ê têbigihêjin awayê bikaranîna wê:

XWENDEKAR pirtûkên XWE dixwazin.

EM pirtûkên XWE dixwazin.

HÛN pirtûkên XWE dixwazin.

Di van hevokan de jî tê dîtîn ku Kirde kit an kom be ferq nake XWE her wekî xwe dimîne. Li vir

cînavkên xwedîtîyê yên wekî MIN, TE, WÎ, WÊ, ME, WE, WAN ... nayên bikaranîn li şûna van tevan cînavka li xwediyê xwe vedigere XWE tê bikaranîn. Yanî em nikarin bêjin, HÛN pirtûka We dixwazin. Dîsa em nikarin bêjin EM pirtûka ME dixwazin. Kesên ne ji dayika xwe, lê li xwendegehê hînî zimanê kurdî kurmancî dibe, divê baldarê vê xalê bin ku kurdiyêke rast karibin bi kar bînin.



## Peyv

Berhevkar: Seyfi Doğan

**Bapsîg;** bablîsok.

**Çîksayî;** şeva ku ezman bê ewr e.

**Derav;** li derî avê, pireka biçûk a li ser xendekan.

**Hinav;** organên hundir.

**Halpugî;** nexwaşîya pişikê heywanan.

**Mizêz;** mimizokî, ne razî.

**Movik;** xelq.

**Miltezîr;** dema osmanîyan de yê ku bac berhev dikir.

**Opse;** hêrg, şûv.

**Pezî pergande;** pezê çend malan.

**Qusîs;** yê ku mûye pêz dibire, pezbir.

**Qinev;** çûreyêke bend, ta.

**Teşîr;** yê ku pîvanê digrê, pîvangîr, pîve.

**Ticilijî;** yê ku li xwarinê digere, çavbirçî.

**Xanedar;** misafirperver.

**Xayis;** serxew.

**Zewar;** kepeka kûçikan, yal.

# Romaneke polêsi Şopa Xeterê

*Rohat Alakom*

Berhemên kurdî ku qala Swêdê dikin, mijara wan Swêd e yan jî bûyerên van berheman li Swêdê derbas dibin, hertim bala min kişandiye/ dikişîne. Bi saya van çavkaniyên edebî ez dixwazim fêr bibim ka gelo ev welatê ku kurdan ji xwe re wek welatê duwem hilbijartine di van berheman de çawa xuya dike. Piraniya bûyerên romana nivîskar Mehmed Dehsiwar ku berî çend hefteyan bi navê Şopa Xeterê hat weşandin li Stockholmê derbas dibin (APEC, 2017, 378 rûpel). Rast e ev romana Mehmed Dehsiwar romaneke polêsi ye, lê belê xwendevan gelek caran rastî dersên vicdanî jî tê û dide pey wan lehengên ku di rêya rast de ne. Mirov ji çend agahî û bûyerên dîrokî fêr dibe û dibîne ku salên 1980-1987an zêdetir di romanê de derdikevin pêş. Dema ewrên reş û tarî dagirtine ser Tirkiyê kurdên reben mêze kirine ku ti star êdî ji wan re nemaya, dev ji welatê xwe berdidin wek koçber, penaber dikevîne rêyan û di dawiyê


de beşek ji wan tên derdikevine vî welatê Bakûrê. Çawa tê zanîn bi hezaran kurd ji ber cuntaya leşkerî (1980) berê xwe dane Swêdê.

Yek ji van kurdên ku berê xwe daye Swêdê jî lehengê romanê Merdan Jîyan e ku di romanê de wek Merdan derbas dibe. Merdan di tevgereke çepên tirkan de kar kiriye û hatiye girtin. Dema ji girtîgeha Amedê derdikeve pêşiyê tê Stembolê, demekê li wir dimîne. Hevalê wî Behrî ku berî wî hatiye Stembolê gelek alîkariya Merdan dike, bi karên wî yên derketina derve mijûl dibe. Tê gotin ku bavê Behrî bi bazirganiya malê qaçaxtiyê mijûl bûye, paşê îmkânên mezin ketine destê malbatê. Behrî li Stembolê gelek têkilî pêk anîne û karê wî her çûye mezin bûye. Dema Merdan li Stembolê ye hevalê wî Behrî wî dişîne taxeke Stembolê, Bakirkoyê bona li wir li bal fîzyoterapistekî ji êşên xwe re çareseriyekê bibîne.

Piştî vê hevdudîtîne dema Merdan dixwaze vegere here aliyê cîhê



hevalê xwe Behrî nişkêve dibe şahidê gullebaran û teqînan. Merdan xwe davêje erdê. Dema bêdengî peyda dibe, radibe ser pêyan û dibîne ku pîrejîn û keçek di hembêza hev de li erdê dirêj bûne û birîndar in. Merdan gelek hewl dide alîkariya wan bike. Paşê bi vê pîrejîn û keçikê re têkiliyan datîne û wan bi nêz ve nas dike. Ew jî vê alîkariya Merdan ji bîr nakin. Derdikeve holê ku ev pîrejîna bi navê Nezîre bi koka xwe ermen e, di zarokatiya xwe de bûye ewledê malbateke kurd û li bal wan mezin bûye. Navê bavê wê Elî û navê dayîka wê Xezal bûye. Merdan dibîne ku çend çîrokên vê pîrejîne hene ku hêjayî guhdarkirinê ne. Ev pîrejîn di cîhekî de dibêje ku dema ordiyên tirk di sala 1915an de ermen ji cî û meskenên xwe leqandin, ew nefî kirine û koka wan anîne, hin zabitên tirk gelek caran sîmsar şandine nav gel bona dîtina mêran ku bixwazin bi jinên ermen re bi berdêla pereyan bizewicin. Gelek zabitan bi saya vê sîmsariyê pereyekî mezin ji xwe re berhev kirine. Dema Nezîre mezin dibe, kesekî bi navê Xalid re mêtir dike. Lê belê zarokên Nezîre û Xalid çênabin. Di sala 1966an de dema erdhejîn (zelzele) li bajarê Gimgimê (Varto) dibe, gelek kes dimrin û bi



hezaran zarok bêdê û bêbav sêwî dimînin. Carekê dema rêya Xalid li Gimgimê dikeve ew li wir rastî keçeke piçûk tê ku navê wê Şanaz e. Xalid vê keçikê tîne ji xwe re dike ewled. Xalid zû dimire. Şanaz bi salan heta salên 1980yî li bal Nezîrê dimîne. Şanaz, keça malê ya xama ku li Stembolê parêzgeriyê dixwîne bi bedewî û xweşikbûna xwe bala Merdan jî dikişîne.

Merdan bi baldarî vê xanima ermen guhdar dike. Wek detektîfan dixwaze serboriya wan fêr bibe. Eger neheqiyek li wan bûye vê carê li pey şopa suçdaran dikeve. Merdan dema

kuştina Behrî û birîndarbûna Lasse de jî bi "merdane" diçe ser kujer û zaliman. Belkî jî nivîskar ev nav bi zanetî li lehengê xwe kiriye. Bi zanetî nîn be jî divê em li vir nîşan bidin ku kirinên wî û navê wî gelek li hev hatiye. Bi saya vê naskirin û hevduhatinê mijara komkujîya ermenan, zordestî û zilma ku hatiye serê wan di romanê de derdikeve pêş. Nezîre dema qala serboriya xwe dike, gotinê tîne ser dostayetiya di navbera kurd û ermenan jî. Di cihekî de dîyar dike wek mînak Muhtila Begê Muksî bi hezaran ermen ji vê zilmê xelas kirine, derbasî aliyê din ê sînor kiriye.

Merdan êdî tivdarekê xwe dike bona sefera xwe ya Swêdê. Ew qasî 5 salan li wir dimîne. Bi saya têkilî û zîrektiya xwe rewşa xwe ya aborî baştir dike. Di nav demeke kurt dibe xweyê mal û milk. Ber re diçe unîversîteyê û li wir beşa dîrokê dixwîne. Pêşîya wî hertim vekiriye. Ew dixwaze destê tengezaran bigre, ji kesên di nav tengasiyê de bibe alîkar. Demekê şunda hevalemî Merdan bi navê Serdar ji welêt tê Swêdê. Bi serê xwe wek penaber diji. Jin û zarokên wî li welêt mane. Bina wî gelek teng dibe. Hin tengasiyan li xerîbistanê dikişîne. Ew û Merdan gelek ji hev hez dikin, rûmeta hev digrin. Der-

ketina destûra mayîn û kar li Swêdê bona wî dereng dikeve. Ew wek qaçax li Swêdê diji. Carekê dema rêya wî di nav daristanê re derbas dibe dengê teqînekê tê guhê wî. Paşê Serdar du kesên çekdar dibîne ku li pey kesekî din ketine. Serdar berdewam dike ji xwe re digere. Vê carê nalîna kesekî tê guhê wî, nêzî wî dibe û dibîne ku mirovek birîndar bûye, dinale. Serdar naxwaze wî tenê bihêle dixwaze alîkariya wî bike. Paşê wî dibe mala xwe, hewl dide birîna wî qenc bike. Ji vê yekê ew Merdan agahdar dike. Ev kirina Serdar hêjayî besinandîne ye, di nav van mercên xwe yê gelek xirab de mirovahiya xwe ji bîr nake, wê demê dilê wî tenê bona vî swêdiyê birîndar, nenas lêdide! Paşê wê derkeve holê ku di esasê xwe de ev polês ji mirovekî qenc û pak e. Piştî demekê Anîta xwişka vî polêsî ku bi xwe rojnamevan e destê xwe yê alîkariyê dirêjî Serdar bike. Di derbarê rewşa Serdar de nivîsekê di rojnameyan de belav dike. Piştî vê nivîsê destûra mayîn û kar ji Serdar re derdikeve. Kêfa Serdar tê cîh. Wisa xuya dibe ku qencî tu car nayê jibîrkirin. Paşê derdikeve holê ku ev kesê birîndar berê komîserê polês bûye û navê wî bi kurtî Lasse ye (Lars-Åke Stevenson). Lasse di derbarê kuştina Olof Pal-

me de li pey hin rastiyan ketiye û xwestiye van rastiyan wek rapor eşkere bike. Vê carê ew dibe neyarê hevkarên xwe (polêsên ku naxwazîn rastî eşkere bibin). Ji vir şunda di romanê de gelek bûyer li pey hev bi lez diqewimin. Malbata Lasse dibe dostê kurdan, di navbera wan de nêzikayî û hevkarîyek peyda dibe. Lasse û xwişkê wî ya rojnamevan Anîta, Merdan, Serdar û Fermanê kurd bi teyayî li hemberî wan hêzên tarî ku di nav polêsê swêdî de hene disekin. Carekê Hans Holmer (Serekê emniyeta Stockholmê) ku di bûyera kuştina Olof Palme de kurd suçdar derxistibûn dibe hedefê operasyonê Merdan û hevalên wî.

Di beşa dawî ya romanê de Merdan piştî pênc salan vedigere Tirkîyê, diçe Stembolê. Merdan û Şanaz bêsebir hêviya hev in, dixwazin hev bibînin. Piştî demekê Merdan fêr dibe ku dayîka Şanazê miriye û Şanazê ligel doxtorekî hevaltî daniye. Her çiqas ev çend sal in Şanaz û Merdan hev nabînin jî ji dûrve dibin heyranê hev. Lê belê dema mirov bi çavan ji hev dûr dikevin, bi dilan jî ji hev dûr dimînin. Herdu jî dixwazin hev bibînin, herdu jî di navbera du avan de dimînin. Di serê her yekî/yekê re ev pirs derbas dibe: *Gelo mirov di-*

*kare du kesan di carekê de hez bike?* Şanaz gelek ditirse bona Merdan vê carê jî here Swêdê êdî qet venegere. Ji ber vê yekê jî hîs û aqilê Şanazê daîm her şerê hev dikin. Carina peyvên gelek şîrîn ji devên wan derdikevin. Dema carekê Şanaz telefonê vedike, Merdan wiha deng dike: *"Di vê xirecirê de dengê te wek melhema ser birînê hat"*. Keça swêdî Anîta jî hertim di hişê Merdan de ye. Wisa xuya dibe ku evîn wek derdê dilan hişê Merdan jî tevlihev dike. Dema Merdan li Stembolê ye carekê dixwaze bi tîlefonê hal û hewalê Şanazê bipirse: *"Berî ku li Şanazê bigere, biryar da ku ji Anîtayê re tîlefon vekê"* (rûp. 345).

Wext derbas dibe carekê dema Merdan û Şanaz diçin aliyê Behrî ew dinêrin ku karker û personelê Behrî li hev civiyane, panîkeke mezin li cihê karê wî heye. Hin kesan li Behrî xistiye, ew kuştîye. Ev yeka Merdan gelek bêhizûr dike. Ne li pey hev be jî di paragrafekê de êdî em peyvên şop û *xeter* di eynî cihê de dibînin ku navê romanê pêk tînin (rûp.329). Di gelek cihên din de jî xwendevan rastî peyva *xeterê tê*, romanê dibe romana *xeterê*. Merdan vê carê bi pirs û pirsîyar li pey şopa kujer yan jî kujeran dikeve, kes nizane kê

Behrî kuştîye. Lê belê dîsa jî ew dixwaze bûyer ronî bibe. Gelek kesan dibîne, wan guhdar dike. Yek ji wan jî Sêrdî Beg e, kurdekî ji aliyê Qersê ye ku li Stembolê dimîne. Ew dostekî Behrî ye, gelek jê hez kiriye. Ew wek “Sêrdiyê kurd” tê nasîn, hevalê hûnermend Yılmaz Guney û heyranekekî mûzîka kurdî bûye. Merdan dema jî Stembolê tê Swêdê birayekî xwe û birayekî Behrî dide ser karê Behriyê ku berî demekê jî aliyê kujerên nedîyar de hatibû kuştin.

Di dawiyê de Merdan tê Swêdê. Anîta, birayê wê Lasse, Serdar tîn pêşiya Merdan. Jin û zarokê Serdar jî ligel Merdan di eynî rojê jî Stembolê tîn Swêdê. Ew dibin gelek kes, di texsiyekê de cîh nabin. Bi du texsiyan siyar dibin berê xwe didin Stockholmê. Lasse, Serdar û zarokên wî li texsiyekê siyar dibin, Anîta û Merdan jî dikevin hundurê texsiyêke din bi marka volvo ku Anîta dajo. Anîta raste-rast Merdan dibe mala xwe. Dema dikevine hundirê malê Anîta tavilê bi lezo-bezo wî berbi oda razanê dibe.

Nivîskar Mehmed Dewsiwar di vê romana xwe de wek mînak xwestiye bi saya mînaka Nezîrê li Stembolê û bi saya mînaka Hasse li Stockholmê hin mekanîzmayên

mirovî bide bikaranînê, aktîf bike bona çend mijarên nemirovî rûreş û sosret bike. Lehengê yekem Merdan wek “lehengê xelaskar” heyranîyeke mezin di romanê de peyda dike. Nivîskar Mehmed Dehsîwar ne tenê xwestiye bi kuştin, teqîn û dilopên xwînê kelecana xwendevanan bilind bike. Ew zane ew çî dike. Wî herwiha xwestiye çend mijarên ku mirovahî gelek hewcedarî wan e derxe pêş yan jî xwendevanên xwe di vê rê de seferber bike. Nivîskara swêdî Åsa Schwarz jî di romaneke polêsî de wek Mehmed Dehsîwar xwestiye çend pirsgrîkên mirovahiyê mîna hawirdor, jîngeh niqaş bike. Piraniya bûyerên vê romana bi navê *Firişteyek Mirî* (En död ängel) li Serhedê li hêla Agirî, Îdir, Qers û Aniyê derbas dibin (Binêre: Rohat Alakom, Åsa Schwarz li Welatê Serhedê, *Basnews*, 24-30 Tîrmeh 2017).


Bi kurtî dikarim bêjim ku ev berhema Mehmed Dehsîwar gelek balkêş e. Dema min dest pê kir ez vê ev romanê bixwînim min gelek caran nedixwast ji dest berdim. Min di nav du-sê rojan de bi hewaskarî ew xwend. Ne tenê ev hewaskariya min, romanê bi xwe jî bi zîmanekî edebî û bi mijarên kelecana xwe dida xwendinê

# Siyarên deşta Anatoliyê - Heci Buxurcî, Gopo, Os, Omer û yê din

Ihsan Türkmen

Nivîskar birêz **Muzaffer Özgür**, bi kurteromana xwe, ronahî dayiye beşek ji dîroka Kurdên Anatoliya Navîn. Roman bi devoka Kurdên Anatoliya Navîn, bi zaravayê Reşiyani hatî nivîsandin. Di saya romanê de meriv dibîne ku, ka zimanê li herêmê tê deng kirin, çiqas dewlemend e. Gava ew qala deşt û newala, hefş û kendala, çiya û baniya dike, pirtuk bi destên meriva da dinusike, meriv naxwaze ji destên xwe berde. Herwiha qala wî a mirovan, ajalên, keçikên dest bi hene, jinên bî, belengaziya şivanan, êş, xizani û mêraniyê ji kêfxweşiyekê dide mirovan.

Di romanê de Hec Mistefa qala dîroka gundê Celîka ya sedsalan, dîroka eşîra Celîkan, ku welatê bavûkala ji Semsûrê bi der bûne û ji Reqayê bigre, heta Efrînê, ji wir bigre heta Enteb û Sêwazê, deşta Konyayê dike. Eşîra di nava pêncî salan de li her welatekî perçeyek li duv xwe hiştiye, tê li Celîka niha, deşta Konyayê ku ji Kurda re bûye war, bi şûn dibe. Koçberiya kam-



bax, mal ji mala, bira ji birayan dur xistiye.

Hê amûrên çandinîyê tunin. Debara eşîrê pirani bi xwedîkirina pez dibe. Bi sedan keriyên pez ku herroj li seranserê deşta Konyayê belav dibin. Hinek şivan in, hinek dajo ne, kî pezbir e, kî bêriwan e, kî şîr lê dike, kî ji xwarina şivanan hazir dike û îşê malê dike.

Bi mesela Osê Birê ku li Bîra Dirêj ku ji mala Alî Begê re wek şivan e hatiye ragirtin ve qal tê ser

yek ji kaçaxên herî navdar yê deştê,  
Heciyê Bixurcî.

Roman bi naveroka xwe ya dew-  
lemend, bi teswîrkirina xwezayê,  
anîna ziman a vebêjan, dilketiya  
Osê, Dîlberê, destgirtiya Hecî,  
Horê û dervakirina ereba postê ya  
hukimetê, bi zimanekî pirr zelal  
hatiye nivîsandin.

Ev kilama li jêr xanga Hecî li ser wî gotiye  
ji kit

*Here Heco tuyî ne nas î*

*Tuyî serqot î bi ningê xas î*

*Ji qeza Konyê bi derê*

*Welle tu ji giyê xelas î*

*Riz e riz e Heco riz e*

*Berfek li kekî min barî qerarsiz e*

*Î ku keki min nasneke*

*Didan zêrinî, xwedanê hespê yaxiz e*

*Çima çima keko çima*

*Eza li ber kekê xwe daynîm mest û şima*

*Kekê min li ber mirinê ye*

*Arekî xwe dayne bi qayma*

*Cahîl cahîl Heco cahîl*

*Terebluskê bi nava xwe de reş û daîl*

*Elegcîkî bi çar pera*

*Ji kekî min re bû ezraîlç*

## YEKBÛN

Nebû

Nebû dayê

Çima li vî warî

Jîyan dimeşe tene bi dijarî

Nebû

Nebû dadê

Çima para min tim

Hawar û nalîn e

Dibêjin

Li Başûra min

Dîsa têkçûyîn e

Nebû

Nebû yadê

Gula min çaralîyan de

Strîyan dorpêç kirin e

Gul xwîn dibe

Dil xwîn dibe

Derman yekbûn e

Yekbûn e

Ax...

Yekbûn e.

Mem Xelîkan

2017


# Du kitêbên nû ji weşanxaneyê APECê

## **Siyarên deşta Anatoliyê**

Serpêhatiya Heciyê Buxurcî, Osê Bire û Omerê Hesenko ye ku li deşta Anatoliyê derbasbuye.

Di vê hekatê de li gel serpêhatiya van sê kesan erf, edet, jîyana salên 1930î û tevgirêdana kurdên Anatoliyê wek koçberî, eşîrtî, kevneşopî û evîndariyê ve hatiye hunandin.

**Muzaffer Özgür** di sala 1964an de li gundê Celika ya Kuluya Konyayê hatiye dinyayê. Di nava xebatên kovara Vatan Güneşiyê de cih girtiye û di sala 1995an de ji ber rewşa xwe ya siyasî mecbûr maye ji welêt derkeve. Ji wê demê û vir ve li Almanyayê dijî. Ji destpêkê de di nav karûbarê kovara Bîrnebûnê de ye. Ew yek ji nivîskar û berpîrsên kovara Bîrnebûnê ye.



## **Na bavo hê li rawestgehê me**

... na bavo hê li rawestgehê me. Li vir otobês heta qira şevê dixebitin û jixwe ev bajar bîst û çar saeta... Ji ku bizanim bavo? (!) Va ye hûn jî bi qasî min li televizyonê tema... ..emam dereng namînim (Alla alla!). Bila otobês were di cî de diçim ma... Xwe bi çî egle bikim bavo! Ji malê diçim zanîngehê û ji zanîngehê jî tê... ..avo tu qet nahêlî ez deng bi... Na bavo ez hê Xeca te ya berê me! Bavooo... Bavvv...aavooo!.. Waxx çî eyba reş û giran e. Xelk gişt li min dinêr... Ên li rawestgehê bavo.

**Mistoyê Heco** di sala 1986an de li gundekî Qırşehîrê ji dê bû. Kedkar e. Li Stenbolê dijî.





Du jinên şêxbizeynî ji arşîva Smaylî Şêxbizeynî